**Mele Nûriyê Hesarî**

# Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî

**Mafê çapkirin û belavkirinê parastî ne**

**Nivîskar**
**Mele Nûriyê Hesarî**

**Navê pirtûkê**
**Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî**

**Çapa duyem**
**Dîrok 2024**

**Rojavayê Kurdistanê/Qamişlo**

Çapa yekem – PENCÎNAR
Pêşgotin
Zeynelabidin Zinar

Weşanxaneya Çanda Kurdî
Stockholm 1996
Utgivare: PENCÎNAR-Tryck & Förlag
Grundtvigsgatan 25, Blackeberg.
Box 3088, 161 03 Bromma, Stockholm-Sverige.
Tel: 08-37 26 01.
Första tryck: 5/1996.
ISBN 91 972779 2 4

## Spasî

**Ji dil û can spasiya Fûad bavê Dilo serokê yekîtiya Hesariyan dikim, li ser alîkariya wî ji bo çapkirina vê pirtûkê.**

**Ebdulwehab Mele Nûriyê Hesarî**
Qamişlo 2024

# PÊŞGOTIN

Ev pirtûka bi navê *Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî* di rewşa îro de ji bo Rêzimana Kurdî dewlemendiyeke bê biha ye û hêjayê nirxdariyeke mezin e. Herweha ji aliyê bêjeyan ve jî gencîneyeke wisan dewlemend e ku hempayên wê pir hindik têne dîtin. Bêjeya “hostanîbêj“ bi mana axaftina bi hostatî, bi zanîn e ku tê de şaşî û çewtî çênabin. Bêjeya “zarhawe“ jî, bi mana aweyên zar (axaftin) e ku berê bav û bapîrên Kurdan çewa diaxivîn û bi çi tewrî bijeyan li pey hevûdu rêz dikirin.

Pirtûk li ser axaftina devoka kurmancî hatiye nivîsandin. Herweha awayên rêzimanî, bikaranîna bêjeyan di hevokan de û çewabûna bikaranîna demê diyar dike.

Lê belê nivîskar di vê berhema xwe de li hin deveran ji dîtina xwe averê bûye û dîsa giranî daye ser devoka xwe ya herêmî. Hin caran jî tişt beyan kirine û mînak dane, li hin deveran jî mînak jibîr kirine û babetê wan zelal nekiriye. Ew yek jî, ez bawer dikim ku ji be sergêjiyan gelşan rûdaye.

Lê ev berhem çi dibe bila bibe, gelekî hêja û giranbiha ye. Di pêş de eger ew ji aliyê komikeke zanistî ve bête werbêjkirin, babet e ku di dibistan û xwendegehên kurdî de bibe materyaleke dersê.

Di hin deverên pirtûkê de kêmasiyên wê yên zayendeyî û bêsaziya hevokan xuyadibe. Ew tiştên wisan jî yan ji ber devoka nivîskarê wê rûdane, yan jî ji ber bêtecrûbetiya wî derketine

holê. Herweha daçeka milkane ya pirane jî ji bo nêran, di piraniya deveran de bi yekane bi kar aniye.

Nivîskar xwe di gelek ciyan de jibîr jî kiriye û ber bi hawayê Rêzimana Erebî ya ku berê di medreseyên Kurdistanê de dihate xwendin ve çûye. Herweha nivîskar alfabeya kurdî ya latênî jî ku ji vê pirtûka xwe re bi kar aniye, jimara tîpan gihandiye 34`an û ev hersê tîp li alfabeya ku niha Kurd bi kar tînin zêde kirine: H` ( ح ), ‘e ( ع ) û ‘x ( خ ).

Orîjinala pirtûkê ya destnivîs, di 396 rûpelên deftereke mezin de hatibû nivîsandin. Ez di nivîsandina bi Compyuterê (data) de, pêrgî zehmetîne pir mezin dibûm û sergêjîne mezin derdiketin pêş. Ji ber ku di nivîsa bi qelemê de, tîpa destpêka bêjeyên taybetî ne bi tîpên gir bûn , li pir cihan niqut û bihnok jî nebûn. Jixwe kaxezê fotokopî, zêdetirîn zehmetî ji min re derdixistin.

Min, bi destûra nivîskarê hêja pirtûkê li gor alfabeya ku niha tê bikaranîn nivîsî. Herweha min hin bêsaziyên di rêzkirina bêjeyên di hevokan de jî, sererast kirin. Wekî din, ez têkilê devoka nivîskarî û dîtinên wî nebûme.

Belam em Kurd hin caran ji xwe gazin dikin û di biwara hevûdu de dipeyivin ku ango em li zimanê xwe, li vêje û folklora xwe xwedî dernakevin. Erê di vê yekê de para rastiyê heye, lê em pirê caran jibîr dikin ku em bê destgîr, xizan û belengaz in; em di binê zordestî û kotekiyan de dijîn, yan jî em ji hevûdu re nabin alîkar û rûmetê nadine hev, xasma jî di warê ziman û çanda xwe de.

Nimûneyên vê yekê pir in û li diyarî çavên me gişan in. Fermo, em binerin ka nivîskarê vê berhemê Mele Nûriyê Hesarî ku ji aliyê Kurdan ve bi nasnavê Seydayê Pirêşan hatiye binavkirin, heta niha çend pirtûk nivîsîne û çend ji pirtûkên wî hatine çapkirin!

Mixabin ev pirtûka wî, ya pêşî ye ku ji aliyê weşanxaneya me ve hate çapkirin. Neh pirtûkên wî yên ku mane jî, niha bi mirinê

re pêdar dikin. Gelo kengê ew pirtûkên din wê bêne çapkirin? Lê min di 24`ê Hezîrana 1996`an de bi telefonê bohîzt ku dîwaneke Mele Nûrî jî hatiye çapkirin.

Rewşenbîrekî mîna Mele Nûrî ku di jiyê xwe yê bîstî de (1954) dest bi nivîsandina bi zimanê kurdî kiriye û berhemên xwe hemû ku bi alfabeya latênî jî nivîsandine, digel wê perîşanî, dilêşanî û xizantiya xwe heta niha ku deh pirtûk kirine malê Pirtûkxaneya Kurdistanê heta niha ne rêxistinekê, ne jî sazgehekê destên alîkariyê dirêjê wî zatê pak kirine, ne jî bizav li kesê ketiye û ji bo wî pîrozê di şûfê kîlereke vêjeyî de alîkarî kiriye.

Îcar, gelo niha li Kurdistanê çend kesên mîna Mele Nûrî hene ku her yekê wan deh pirtûk an zêdetir nivîsîne? Eger sed kesên wisa hebin, dike hezar pirtûk. Eger dused kes hebin, dike du hezar pirtûk. Yanî mirov bi hêsanî dikare bibêje ku niha di destên meleyên Kurd de li dora du hezarî pirtûkên bi zimanê kurdî hene ku yek tenê jî ji wan pirtûkan nehatiye çapkirin.

Ez dixwazin bala xwendevanan bikişînime ser vê mesela girîng jî: şexsekî mîna nivîskarê vê pirtûkê, dibe ku ne endamê rêxistinekê be, lê emekekî pir zêde ji bo zimanê kurdî daye. Îro tiştê ku Kurdan tevek dike şirîkê hevûdu jî, ziman e. Nexwe çi kesê ku ji vî zimanî re bûbe, dibe û bibe alîkar divê pê re alîkarî bête kirin.

Heçîka rêxistin in û serokatiya wan in, hebûnine ne sermedî ne; îro ew hene û sibehê dibe ku tune bin. Lê ev ziman û ev çand, wê heta bi hetayê hebin û ev bi xwe ne jî ku hebûna Neteweyê Kurd li dinyayê dipeyitînin.

Ez, çend roj berî sersala 1995`an li Qamîşloyê bûm. Hin biraderan behsa Mele Nûrî ji min re kirin û nexweşîna wî, şerpezetiya wî anîn zimên. Îcar min xwest ku ez herim serdana wî. Ez û birayê hêja Konê Reş (Selman) di 25 12 1994`an de, saet 1100 ****çûn mala wî, ku li taxeke Qamîşloyê dima.

Mele Nûrî ev e heft-heşt sal in ku şel bûye û nexweşê nava ciyan e. Çaxê me rojbaşî dayê, çendî ku nikaribû zêde xwe bilivandina jî, lê ruyê wî yê geş rûqaliyeke wisan xweş ji me re kir ku di toreya kurdî ya mêvandariyê de kêmasî nedihişt. Ji aliyekî ve milên wî yên şel, ji aliyekî ve çîpên wî yên bêlibat ji bo me hin bi hin ketin livakê û rabû li ser doşeka xwe rûnişt û xêrhatin da me, lê zêde nikaribû bipeyviya, dengê wî jî pir hindik derdiket. Çendî ku hin textorên Kurd li Qamîşloyê ew tedawî kiribûn û nihekî bi xwe ve hatibû jî, lê dîsanê leşsaxiya wî neçê bû û bi zehmetiyeke giran dijiya. Mele Nûrî hin bi hin ruyê xwe yê bişirî ber bi me ve kir û herwekî ne nexweş be, şadiya xwe da diyarkirin.

Çaxê me axaftina xwe anî ser pirtûkên kurdî, kurekî wî du torbe hanîn ba me. Konê Reş jî ew torbe vekirin û deh pirtûkên ku hinek bi deqtîlo hinek jî ku bi qelemê hatibûne nivîsandin, derxitin û danîne ber me. Min jî teyîba xwe danî ber Mele Nûrî û min xwest ku ez li ser pirtûkan hin pirs jê bikim. Lê wî di dana bersivan de pir zehmetî dikişand û dengekî pir nizm jê derdiket. Îcar di wê navê de Mele Nûrî çend rûpel nivîs, ji nava pirtûkên xwe derxisitn û dirêjê min kirin. Gava min lê nerî, jînenîgariya wî bû ku wî bi destên xwe di 1985`an de nivîsiye. Piştre jî bi dengê xwe yê melûl weha got: "Pelokên meleyên Kurd pir in. Lê ew pelok ji ber desttengiya aborî û zordestiya dijminan nehatine çapkirin. Îcar piştî mirina wan, pelokên wan bêxwedî dimînin û ha wisan jî wenda dibin." Min ew çend rûpelên jînenîgariyê dane Konê Reş ku bixwîne û min di şerîdê de qeyd kirin. Bi kurtî jînenîgariya Mele Nûriyê Hesarî ev e li jêrê:

- Mele Nûriyê Hesarî di 1934`n de li Hesara gundê Cegerxwîn çêbûye. Di nava Kurdan de bi nasnavê Seydayê Pirêşan tê naskirin. Navê diya wî Xanim e, navê bavê wî Mele Yûsifê kurê Emer e. Emer ji gundê Hêştirekê ji malbata Etmanka, ji şaxê Elikan, ji rema (eşîr) Hevêrkan bûye.

Bavê wî Yûsif li Hêştirekê çêbûye û xwedina medresê xwendiye. Piştre gava ku bûye mele, li çend gundan meletî kiriye û bi sê jinan re jî zewiciye.

Mele Nûrî ji malbateke xweneda, zana û bîrewer hatiye. Bavê wî çewa ku mele bû, diya wî jî keça melan û jineke xweneda bûye. Herweha çend birayên wî mele bûne.

Mele Nûrî di 1939`an de pêşî li cem diya xwe dev bi xwendina Quranê kiriye û li cem wê Mewlûd, Nehculenam, Nûbihar û Rewdneîm xwendine. Di 1940`î de, çaxê ku diya wî li Hesarê giyana xwe spariye Xwedê, îcar wî li ba kekê xwe Mele Hiseyn xwendiye. Lê çaxê ku kekê wî çûye leşkeriyê, îcar bavê wî ew xistiye dibistana bi zimanê tirkî ya ku li Hesarê bû.

Mele Nûrî di 1945`an de çaxê di nofa (sinif) çaran de dibistana tirkî dixwend, bavê wî jiyana xwe spartiye Xwedê. Îcar kekê wî Mele Hemîd ew ji dibistanê derxistiye û daniye ber xwendina medresê. Piştî demekê ew û kekê xwe Mele Nezir çûne gundê Bilêderê û li cem birayê xwe yê ji dê mane. Piştre çûye mala xalê xwe Mele Mihemed li gundê Êlihê (niha bûye wîlayet û jê re Batman dibêjin) maye. Ji wir jî çûye gundê Kurrika li Bişêriyê, li medreseya Mele Hesenê Tilmizî xwendiye û ders ji kurê Mele Hesen Mele Faîq girtiye. Piştî demekê nivîskar ji wir şûnde vegeriyaye Hesarê, ew û kekê xwe Mele Hemîd ji bo xwendinê daketin Binxetê û çûne cem mala şêx Ehmedê Xiznayê. Li wirê dîsa li cem kekê xwe Mele Hemîd xwendiye heta ku “Sadulaha Gewra“ xilas kiriye.

1949, birayê wî Mele Hemîd çaxê xwendina xwe ya medresê kuta kiriye, di Kanûna Paşî de vegeriyaye Hesarê, lê Mele Nûrî li Xiznayê maye, îcar li cem Mele Beşîrê Batêrgizî xwendiye. Lê di 1950`î/ dehê meha Heyvdarê de şêx Ehmed çaxê jîna xwe spartiye Xwedê, ji wir çûye Tilmarûfê û li ba şêx Eladînê kurê şêx Ehmed xwendiye. Mele Nûrî li wirê bûye pêbawerê şêx Masûmê kurê şêx Ehmedê Xiznayî. Di 1953`an de mala şêx

şêxaya keça rêncberê xwe Seyîd Mihemedê kurê Seyîd Brahîm ê ji gundê Sehrê/ Omerî lê mar kirine.

Mele Nûrî heta ku zewiciye, gelekî oldar bû û sofîtî kiriye, herweha gelek jî ji şêxan hez kiriye û baweriyeke wî ya zêde bi wan hebûye. Lê piştî ku bi qîza xulamê mala şêx re zewiciye, êdî firq kiriye ku mala şêx bi çavekî piçûk lê nerîne û siyanet nedanê. Ji ber hindê ew ji şêxan dilsar bûye û hin bi hin ji wan dûr ketiye, gihaye wê baweriyê ku şêx jî mirovine dilbijok in û tenê ji bo xwe dilivin, ne ji bo jar û belengazan.

Çaxê ku min çav li her deh pirtûkên Mele Nûrî gerandin, min dît ku sê-çar heb bi makîneya deqtîlo û yên din bi qelemê hatibûne nivîsandin. Ew tev yan di defteran de yan jî li ser kaxezê A4 hatibûne nivîsandin. Kaxezên hinek ji pirtûkan jî pir gemarî, zerkokî û qermiçokê bûbûn. Ji wê yekê diyar dibû ku ew saline dirêj di binê erdê de û di deverine bêkeys de veşartî mane. Piraniya pirtûkan helbest bûn û çend lib jî li ser babetên cuda bi pexşan hatibûne nivîsandin. Piraniya pirtûkan bi rûpelên xwe gelekî zêde bûn, çend hebên wan jî li dora sed rûpelî hebûn. Çaxê ku min pirsî ka hin pirtûkên wî hatine çapkirin anena, bi hejandina serê xwe bersiva “na“bûnê da min. Dilê min ji Mele Nûrî re, zêdetir jî bi wan pirtûkên nîvmirî şewitî. Lê mixabin aboriya min dest nedida ku min xwe dabûna ber barê wan pirtûkan, tenê min vê pirtûkê hilda û bi xwe re anî Swêdê.


Ez bi çapkirina vê pirtûka Mele Nûrê gelekî şad û kifxweş dibin, herweha jê re jî leşxasiyeke xweş, jiyekî dirêj ji Yezdanê dilovan dixwazim. Bi umîda ku wê ev pirtûk ji ziman û vêjeya kurdî re bibe alîkar...

1996 03 21
**Zeynelabidin Zinar**

## 02-SERNIVÎS

Ez ê vê demetxêzê ji bo gelê Kurd li ser *Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî* ji hemî aliyan ve binivîsim.

*Hostanîbêj* ew e ku mirov bipeyivî li gor ku bav û kalên me yên pir kevnare çi hawe ziman û şêwe peyde kirine û ji çi çêkirine û çi ayînê rist û weqûf jê ra danîne. Rast e mirovê Kurd di peyva xwe de xwîlwaz nabî, lê belê haya wî pê re derdikevî vêcar ku bê nivîsandin û bê gotin ev weha ye û ew weha ye bi qor û rêz hatiye danîn û nemaze ziman winda dibî, nemaze xwîlwazî tê de çêdibî. Vêca ez ê niha dest pê bikim, bê ziman bi çi çêdibî û çilo çêdibî. Berya vî pêncî salên niha, me tu demetxîzê, ji bilî çendekê ne berfireh di vî warê hostanîbêjê de nedîtine. Lê heger Xwedê kêf bikî, ez ê ji zanîna xwe tenê yeke berfireh binivîsim û ez ê ji cem xwe her nifşê bi nav bikim û li hev bênim.



SERNIVÎS

Ezê vê demetxîzê bi nivîsim
Li ser hostanîbêja zarhawe yê kurdî
ji hemî alîyan, ve ji bo gelê kurd =
bêjim
Hostanîbêj ewe kû mirov bi pexivî
Li gor kû bav û kalê me yên pir
kevnare çi hawe, ziman û şêwe / =
peydekirine û ji çi çêkirine û bi
çi ayînê rist û weqûf jêre danîne
Raste mirovê kurd di peyva xwe
de xwîlwaz nabî lê bê haya =
wî pêre derdikevî vêcar kû bê
nivîsandin û bê gotin ev wehaye
û ew wehaye wê zanibî kû hîmek
jêre heye bi qor û bi rêz hatîye
danîn û nema ziman winda =
dibî û nema xwîlwazî têde =
çêdibî vêca ezê niha dest pê =
~~dikin~~ bikim bê ziman biçi çêdibî =
û çilo çêdibî û berya vî pêncî
salê niha me ti demetxîzê di vî
warê ~~niha~~ hostanî bêyêde ne =

Rûpelek ji destnivîsa Mele Nûriyê Hesarî

# 03-HOXA YEKÊ

## Çend Lateke

**Lata Yekê:**

**DENG**

Hîmê peyvê, *deng* e. *Deng* çi ye?

Li gorî ez dizanim, deng hemî ji bereyan çêdibî û ji lihevketina du tiştan an du cihan ji tiştekî derdibî. Vêca çiqasî bi hiner li hev kevin, bi wî rengî deng mezin û bilind dibî. Vêca ku dilopek *av* li avê bikevî, dengekî didî. Av li axê bikevî yekî dî (dengekî din e-nm) ye, ew li çi bikevî deng tê guhartin. Weha reng e *ba* li çi bikevî , dengekî başqe didî. *Kevir, dar, giya, goşt* li hev kevin, li tiştekî bikevin, dengekî başqe didin. Naxwe zingîna hasin, reqîna kevir, repîna dar, xurîna avê, guvîna bayê, her tişt wilo...

Heçî dengê mirovan, ew e ku çêdibî çaxê mirov hilmê dikşênî hinavê xwe, wê hilmê li borikê nava kezeba xwe didî, hinera wê lêdanê derdikevî û tê guhên mirov, ew *deng* e. Vêca tu wê hilmê di qirika xwe de biguvêşî û dûvre tu berdî nava xwe, dengekî dî ye û tu çiqas bi jor de bênî bi vî hawî dengekî başqe ye. Tu jêra zimanê biçûk biguvêşî, yekî dî ye. Tu dervê ber zimanê biçûk biguvêşî, yekî dî ye. Tu qurmê zenguwê û ziman bi hev ve biguvêşî, yekî dî ye. Tu ziman û diranan bi hev ve biguvêşî, yekî dî ye. Tu ziman û diranan bi hev ve biguvêşî û diranan bi hev ve biguvêşî û hilmê di jora bêvilê de bihêlî, yekî dî ye. Tu diran û lêvan bi hev ve biguvêşî, yekî dî ye. Tu lêvan bi

lêvan ve biguvêşî, yekî dî ye. Vêca her cihek ji van, tu çiqas hino hino bi derve de bênî dengek e.

Di zimanê kurdî de hinek (dengan-nm) dikin 32 deng û hinek wan dikin 33 deng. Lê min ew kirin 34 deng. Vêca ji her dengekî wan tenê re *kitwaz*ê bêpişt tê gotin. Yanî wazeke tenê ye, hiseke tenê ye. Ez ê niha ji we re her 34 kitwazan bêjim. Li lata dî binêre.

**Lata Diduwan**

## KITWAZ

### Kitwazên Bêvîn:

Kitwaz, deh nifş in. Ji jêra hinavan ta ku digihê pêşiya serê lêvan.

Min berê gotiye ku her kitwazek, dengekî tenê ye. Ez ê niha ji hinavê dest pê bikim.

Kitwazên hinavê neh (9) in: **h, û, î, ê, u, i, e, o, a.**

Ya pêşî (h), ji tevan kurtir e. Ya dî (û) di ser re û her wilo di ser hev re ne, ta bighê ya paşî(ya "a"yê).

Ev her neh tîpên nerm bê *hestî* ne û çênabî ku di serê bêjeyan de bên. Heger tu bixwazî ku wan di serê bêjeyan de bênî, divê tu **hestî** berî wan bênî. Vêca çaxê ev her neh têne lêxistin, du cih ji nava qirikê li hev nakevin.

### Kitwazên Vereşînê:

Ev kitwan, didu ne: *é* ya bi hestî û **h`**.

Ev herdu ji cihê ku mirov jê divereşî derdikevin. Sebebê ku ya pêşî (*é*) bi hestî tê navdan, ev e: Lewra her neh tîpên hinavî yên nerm gava di serê bêjeyan de bên, bêyî vê kitwazê (*é*) nayêne

gotin. Belê ew nehatiye xîzkirin. Ez jî wê bi tu kitwazan re nanivîsim. Gerçî min ev xîz (*é*), ji bo bê naskirin jê re daniye.

**Kitwazên Jêrzimanî:**

Ev kitwaz, pênc in: **´x, x, q, k, g.**

Çaxê ku mirov qurma zimanê xwe bigihênî zimanê xwe yê biçûk, ev her pênc kitwaz, yek li du yekê derdikevî. Ji ber vî hawî, ez ji wan re *Kitwazên Jêrzimanî* dibêjim.

**Kitwaza Zengoyî:**

Ev kitwaz, yek e: **y.**

Çaxê ku tu zimanê xwe bikî mîna şirik; herdu aliyên zimanê xwe bigihînî binê diranên xwe yên jorê, ev (y) derdikevî. Vêca ew hilma ku tê girtin bi sisitî di navbera ziman û zenguwê de tê guvaştin. Ji ber ku cihê wê fireh e, ne weke yên berî û piştî xwe ye ku cihê wan di ber hev de ye.

**Kitwazên Pêşzimanî:**

Ev kitwaz, çar in: **j, ş, s, z.**

Çewa ku tu (y) çêdikî, belê hin bi hin zimanê xwe ji herdu aliyan ve û ji pêş ve bigihînî diranên jorê, ev her çar çêdibin. Lê çaxê ku tu (z) bêjî, serê zimanê te ne bi jorê ve hindik dimênî berdayî.

**Kitwazên Paşpidû:**

Ev kitwaz didu ne: **c, ç.**

*C* û *ç* weke yên berî xwe (a,b) derdikevin. Lê divê ku tu pêşiya zimanê xwe, ne serî bi xwe, bighênî piduwê ji aliyê hindur ve. Ji ber wilo, ez ji van re dibêjim *Paşpidû*.

**Kitwazên Serîzimanî:**

Ev kitwaz pênc in: **r, l, n, d, t.**

Çaxê ku tu ji pêş ve û ji aliyê hindirû ve bi sistî ku herdu aliyên zimanê xwe bigihênî serê diranên xwe yên jorê, ev pênc

kitwaz derdikevin. Pê re jî tu yê serê zimanê xwe bigihênî pişta diranên xwe, yanî jora wan. Vêca ew, yek li pey yekê derdikevin.

(**N**) jî çendî ku weke wan e, lê gava zimanê te giha diranan, tu yê hilma xwe rawestênî. Ew, ji ber ku di jora bêvilê re derdikevî, tenê ji bêvilê derdikevî.

**Kitwazên Lêvdiranî:**

Ev kitwaz, didu ne: **f, v.**

Çaxê ku tu diranên xwe yên jorê bigihênî lêva xwe ya jêrê, ev herdu kitwaz derdikin.

**Kitwaza Lêvpikî:**

Ev kitwaz, yek e: **w**.

Çaxê ku tu herdu lêvên xwe bi pêş de bînî û bikî weke lûlik, serê wan jî nêzî hev bikî, lê negihênî hev û duvre lêva xwe ya jêrê bi rêj ve bibî û hilma xwe rawestînî, ev kitwaz derdikevî.

**Kitwazên Dulêvî:**

Ev kitwaz, sisê ne: **b, p, m.**

Çaxê ku tu lêva xwe ya jêrê bigihênî lêva xwe ya jorê, çi bi sistî û çi bi xurtî, ev hersê kitwaz derdikevin. Ji van û derve de hew kitwaz çêdibin.

Kitwazên ku me ji serî ta dawiyê gotin, ev bûn. Rêza wan ji hinavî ta dawiya lêvan halo tê. Dîsa li wan binêre:

**h, û, î, ê, u, i, e, o, a. é, h`. ´x, x, q, k, g. y.**

**j, ş, s, z. c, ç. r, l, n, d, t. f, v. w. b, p, m.**

Vêca ev kitwaz bi hawekî dî, dîsa dibin çend nifş:

Tîpên winda û sivik: **h, w, y.**

Hin caran ev kitwaz dengê xwe winda dikin û bi dengê hinek tîpên nerm têne xwendin.

Weke: **Xwê**, Li vir **w** di **ê** de winda bû.

Weke: **Wê bê.** Pêşî **wê bihê** bû, va ye **h** di **ê** de winda bû.

Weke: **Daê**. Pêşî **dayê** bû, va ye **y** bû **ê**.

Tîpên nerm ên bêhestî: **û, î, ê, u, i, e, o, a.**

Ev kitwaz di serê bêjeyan de nayêne gotin, belê di nîvê du kitwazên ziwa de yan jî piştî yeke ziwa tên. Ji ber wilo ev, kitwazên nerm in. Weke: *Kût, kit, kêt, kut, kit, ket, kot, kat...* Weha reng e: *Kû, kî, kê, ku, ki, ke, ko, ka...*

Heger (ev tîpên nerm ên bêhestî-nm) di serî de bên, divê **ê**-yek berî wan bi deng, lê ne bi nivîsîn bê. Weke: *Ûk, îk, êk, uk, ik, ek, ok, ak.* Vêca ev kitwaz bi nivîsînê dibin tîp. Ev tîp jî dibin du nifş.

Nermî dirêj: **û, î, ê, o, a.**

Nermî kin: **u, i, e.**

Tîpên Ziwa: **h, é, h`, ´x, x, q, k, g, y, j, ş, s, z, c, ç, r, l, n, d, t, f, v, w, b, p, m.**

**Ev tîp çima ziwa ne?**

Lewra di serî de tên û dido bi hev re nayêne gotin, divê tîpek ji yên nerm di pey wan de bê. Weke: *Ker, ker* (kerr).

Tîpên ziwa yên dudeng: **k, ç, r, t, p.**

Ev tîp sist çêdibin. Yanî tu yê bi sistî wazderê wan bigihênî hev. Weke: *Kevir, çekur, ti, piling.*

Heçî **r** ye, di serî de sist nayê. Lê di nêvî de sist tê.

Weke: *Derzî.*

Li vir **r** sisit e. Weha reng e çêdibin *cêwî.* Eger ku di serî de bên, weke: *Kkêr, ççûr, rrût, ttêr, ppirç.*

Yan di nêvî de ku bên dîsa sist in, weke: *şekir, qarçik, gurçik, kutilk, tapan.*

Weha reng e di paş de jî ku bên sist in, weke: *Çek, keç, kit, kep.*

Heçîka **r** ye, di ser û paş de tim xurt e, weke: *Rrist, kerr.*

Di nêvî de **r** xurt û sist tê, weke: *Qirrik, durrist.*

**Tîpên Duhawe:**

Ev tîp, zirav û stûr tên: **s, z, l, d, t.**

Eger di serî de bin zirav in, weke: *Serî, zilam, law, dendik, tilî.*

Eger ku di nêvî de bin zirav in, weke: *Dustan, dûzan, tolek, zendik, dehlêz.*

Eger di paşî de bin zirav in, weke: *Das, toz, dil, zend, tert.*

Lê ev tîp ku di serî de bên stûr in, weke: *Sor, Zal, lotik, danîr, tel.*

Ev tîp ku di nêvî de bên stûr in, weke: *Pesin, dazwan, galon, satil.*

Heçîka **d** ku di nêvî de bê tim tenik e, weke: *Kendûn.*

Ev tîp ku li paş bên stûr in, weke: *Dasî, pez, dol, îsot.*

Heçîka **d** ku di paşî de tê tim zirav e, weke: *Gerd.*

Vêca bê çilo ev pênc tîp stûr tên:

Tîpên nerm ên bêhestî ku di nêvî û paşî de bên, stûr tên.

Weke: *Gawir.* Va ye **i** di vir de stûr e.

Weke: *Çal.* Va ye **a** di vir de stûr e.

Weke: *Tiraf.* Va ye **a** di vir de stûr e.

Weke: *Sopar.* Li vir xuya ye tîpa nerm ku stûr bê, divê tîpa ziwa ya berî wê ne xurt bî, divê sist bî. Weke: **Ppar** ku (**k-ç**) bin, lê ne ku (**r, t, p)** bin.

Ev xurt jî çêdibin, weke: *Rrot, top, paşe.*

**Lata sisiyan**
**ÇIVAZÊN VÎNDAR:**

Çivazên Vîndar ew in ku tenê dengê mirovan in. Lê divê tîpeke nerm a bi hestî bî. Weke: **û, î, ê, u, i, e, o, a.**

Çaxê ev tîp bi tenê bin, bi hestî têne gotin. Yan tîpeke ziwa û yeke nerm a bêhestî di pey de bê.

Weke: **ha, h`a, ´xa, xa, şa, ta, ma** ta paşî...

Vêca çi vîna wê hebî, weke **ha**yê. Bersiva bakirinê yan bê vîn bî, weke **yû**yê. Ev herdu jî, çivaze ne.

Vêca **çivaze** bi hev re dibin û jê bêje çêdibin, lê tenê ji mirovan re. Ji ber ku *çivaze* bi tîp in.

Lewra deng ji sewal, dewar û perindan re jî çêdibî, lê ew deng bê tîp in.

**GOTIN:**

**Heye**, ev *kite* ew e ku tîpa hestî berî tîpa nerm bê. Weke: **a, î, i, u, û, e, ê, o,** ta paşî...

**Ker**, ev ew e ku *kitek* bê û di pey de tîpeke ziwa bê. Weke: *Ak, ok, êk, îk, ûk,* ta paşî...

**şikeste,** ev ew e ku tîpeke ziwa bê û di pey de tîpeke nerm a bêhestî bê. Weke: *Ka, kû, kî, kê, ku, ki,* ta paşî...

**Movik,** ev ew e ku du tîpên ziwa bin û di nîvê wan de yeke nerm a bêhestî bî. Weke: *Mir, mîr, mûr, mar,* ta paşî...

**Guvişk,** ev ew e ku di serî de tîpek ji yên nerm ên bêhestî bênî û dûvre tîpek ji yên *nîvzengo* ta bi tîpên *dulêvî*, yan tîpek ji yên *hinavî,* yan ên *qirrikî* bê û dûvre yek ji tîpên *jêrzimanî* bê, ew dibî *guvişk*. Weke: *Ihk, ih`k, eyk, îşk, itk, ibk, imk.* Çaxê ku tîpa pêşî *nermê bihestî* bî û herdukên dî *jêrzimanî* bin, çêdibî. Lê giran e.

**Goşî:** Ev *Goşî* ew e ku te guvişk çêkir, dûvre tu yê tîpek ji tîpên ziwa, kîjan bî, tu yê li pêş bênî. Weke: *Mihk, şikh`k, teyk, pişk, pitk, rimk,* ta paşî...

# 04-HOXA DIDUWAN

**BÊJE:**

*Bêje*, ji ***kitwaz*** û ***çivazan*** çêdibî. Lê ne weke *çêvazê bêvîn* û *daxwaze* naxwe, çi bêjeya ku bê gotin, çi *kit,* çi *movik,* çi *goşî* û çi *daneheva* wan bî, divê vîn û daxwazek jê re hebî, dûvre ew jî pêşî dibî. Ev sê nifş in. Nifşek jê vîna wê di wê de tê naskirin û navê wê *vînxweser* e. Ya dî vîna wê nayê zanîn lê ku di serî, yan nêvî, yan paşiya *xweser* de bê, ji nû ve vîna wê tê naskirin û navê wê *vînbeste* ye. Yên dî ne weke herdukan in, naxwe ev piştî yan berî kutabûna peyvê tê gotin. Yên berî bên, navê wan *haydar* e. Yên piştî bên, navê wan *bersivî* ye. Herdu jî vîncuda ne.

**VÎNXWESER, VÎNBESTE û VÎNCUDA**
**VÎNXWESER:** *Xuya, winda, livînî, derhiş.*
**XUYA:** *Nav û şûnbêje.*
*Nav,* du pişk in: Navê *kit*, navê *nifş*.
Navê *kit* heye; navê *kes,* yanî navê mirovan.

Ev *nifş* hinek *nasmend* e. Lewra çaxê ku te got, wa Restem xuyaye, tu Restem nas dikî heta ku tu navê wî dibêjî. Vêca ku ev nav ê nêran bî, tîpa **o** di paş de tê. Weke: *Restemo*. Lê heger mê bî, tîpa **ê** di paş de tê. Weke: *Rojînê.*

Lê carna **o** di mêyan de û **ê** di nêran de jî tê. Lê ev bêmewqûfî ye. Weha reng e çêdibit ku tu navkî li dewarekê yan tiştekî din bikî, weke tu navê **ga**yekî bikî *hovo,* yan tu navê darekê bikî *şengê.* Ev jî *nasmend* e, ne navê kes e.

**Navê Nifş:**

Ev nav ew e ku ne navê yeke tenê ye, belê navê her tiştê weke wî ye. Weke, çaxê ku tu bêjî *dar,* tu nizanî kîjan dar e. Lewra dar gelek in û bê nav in. Ji ber wilo, navê vî **nenas** e. Vêca ev nav, yên **kit** û **nifş** çêdibin, tenha bi anîna **ik**, yan **ek** in. Yên *kit*, weke tu bêjî, *Restemek*. Yanî yekî tenê ku navê wî Restem e ji çendekên ku navên wan jî Restem e. Yên *nifş*, weke tu bêjî, *darek, kevirek.* Yanî kevirekî tenê, dareka tenê.

**Zovan:**

Ev **zovan**, Weha reng e herdu (**zo** û **van**-nm) nav dibine **zo** bi anîna *pêjimara du* ku berî wan bênî. Yên *kit*, weke du Restem. Yên *nifş*, weke du dar. Yanî weke tu bêjî: *Restem-Restem û dar-dar*.

**Peyzo:**

Ev *peyzo* ew e ku ji diduwan bêhtir e, lê ta paşiya hebûna *pêjimar*an diçe û bê sînor e. Ev, bi anîna pêhijmarekê çêdibî. Ji hijmara sisê ta hezar hezarî. Weke tu bêjî: *Sê, çar, deh, sedhezar Restem...* Herwiha: *Sê, çar, dehsedhezar dar an zilam*...

**Nasmend:**

Ev herdu nav (**nas** û **mend**-nm) dibine *nasmend* ku tu *şûnbêj*ek ji yên *bertilî* di pêşiya wan de bênî. Weke tu bêjî: *Ev Restem, ew Restem* /kit. Yan bêjî: *Ev dar, ew dar.*

**Nenas:**

Ev herdu (nav) dibine *nenas* ku tu nişanên **kit** di paşiya **kit** de bênî. Nîşan jî ev in ku di paş de tên. Çaxê navên kes digel *demgîra* yekxwedî bî, dûvikê **ek** tê û digel *demgira* du-sê xwedî bî, dûvikê **ekî** tê.

**Ek**, *Restemek hat*. Yanî navê wî Restem e, lê wî nasnakim.

**Ekî**, *min li Restemekî xist*, dîsa navê wî Restem e, lê ez wî nasnakim.

Naxwe navê wî *nîvnas* e, yan *dêhingir* e, yanî yekî weke Restem e û heye navê wî ne Restem bî.

Ev nav heger **zo-van** bî, *pêjimara du* berî wî tê û digel demgîra yekxwedî bî dûvikê **in** pê ve tê. Lê di paşiya demgirê de, ne li pişt wê. Weke: *Du Restem hatin*.

Dûvikê **an** di paş de tê ku digel demgîra du-sê xwedî bî. Weke: *Min li du Resteman xist*.

Weha reng e *peyzo* jê ne başqe ye. Weke: *Sê-çar Restem hatin*. Ku tu hijmarê neyênî, tu yê dûvikê **in** bi wê ve û bi *demgîr*ê herdukan ve bênî. Weke: *Restemin hatin*. Ku ev digel *demgîra yekxwedî* bî.

**An**, ev dûvik di paşiya *peyzo*yê de tê, ku demgîr du-sê xwedî bin. Çi *pêjimar* berî bê û çi neyê. Weke: *Min li serê Resteman xistî*, yan: *Min li Resteman xist*.

**Navê Nifşê Nenas:**

Heger *şûnbêja bertilî* berî wî bê, digel demgîra yekxwedî ew *nîvnas* e. Weke:

**a)** Ev zilam hat, ew zilam hat.

**b)** Ev zilamê han hatin, ew zilamê han hatin.

**c)** Min li vî zilamî xist, min li wî zilamî xist.

**d)** Min li van zilaman xist, min li wan zilaman xist.

Çima nîvnas e? Yanî zanîye ku zilam e, lê navê wî nizane.

Navê *nifşê nenas* digel *demgîra dûsêxwedî* çaxê *peyzo* bî, weha ye:

**-** Min li zilamekî xist.

**-** Min li sê zilaman xist.

**-** Min li zilamina xist.

Navê *nifş ê nîvnas* digel *demgîra* du-sê xwedî, çaxê *peyzo* bî weha ye:

**1-** Min li van/ wan zilaman xist.

**2-** Min li van/ wan zilaman xist.

**3-** Min li van/ wan her sê zilaman xist.

**Kinbirîn:**

Navê kesê nas digel *demgîra yek*(*xwedî*), divê ku xwedî digel *bertilî* bî.

**Çêl:** Ev Restem hat/ ew Restem hat.

**Çêl:** Ev Restemên vir hatin/ ew Restemên wir hatin.

Navê kesê nas digel *demgîra dusêxwedî*:

**-** Min ev/ew Restem kuşt.

**-** Min ev Restemên vir kuştin.

**-** Min ew Restemên han kuştin.

Navê kesê *nîvnas* digel *demgira yekxwedî:*

**Çêl:** Restemek hat/ yek Restem hat.

**Çêl:** Restemin hatin/ du-sê Restem hatin.

Navê kesê *nîvnas* digel *demgira dusêxwedî*:

**Çêl:** Min Restemek kuşt.

**Çêl:** Min du-sê Restem kuştin.

**Çêl:** Min Restemin kuştin.

Navê kesê **nenas** nîne.

Navê *nifş***ê** *nîvnas* digel *demgîra yekxwedî*:

**Çêl:** Ev zilam hat/ ew zilam hat.

**Çêl:** Ev zilamên vir hatin.

**Çêl:** Ev zilamên han hatin.

**Çêl:** Ev/ ew du-sê zilamên ha hatin.

Navê *nifşê nîvnas* digel *demgîra dusêxwedî*:
**Çêl:** Min ev/ ew zilam berdan.
**Çêl:** Min ev/ ew zilamên vir kuştin.

Navê *nifşê nenas* digel *demgîra yekxwedî*:
**Çêl:** Zilam/ zilamek hat.
**Çêl:** Zilam/ zilam hatin.
**Çêl:** Zilam/ zilamin hatin.

Navê *nifşê nenas* digel *demgîra dusêxwedî*:
**Çêl:** Min zilam berda.
**Çêl:** Min zilamek berda.
**Çêl:** Min du-sê zilam berdan.
**Çêl:** Min zilamin berdan.
Navê nifşê *nasmend* nîne.

Weha reng e navê kes digerî *pirnas* ku pê ronî peyda bê:
**Çêl:** Restem, kurê Zal.
Va ye *Restem* bêruhnî ye. *Kurê Zal* pê ruhnî ye, *xwepêgir* û *balxwegir* e. Bi vî hawî *Restem* pir hate naskirin û bû *pirnas*.
Hem ku *balxwegir* di peyde bê:
**Çêl:** Restemê **min**.
Va ye **Restem** *xwepêgir* e û **ê** çengelê pêgirtinê ye. **Min** *balxwegir* e. *Restem* dîsa bû *pirnas*.
Hem ku *pesnek* jê re bê. Ew *pesin* (pesn) çi *hişpêzan* bî:
**Çêl:** Restemê zana. *Zanîn* di hiş de ye.
Ew *pesin* çi *çavpêzan* bî:
**Çêl:** Restemê sor. *Sor*bûn bi çav e.
Ew *pesin* çi *laşpêzan* bî:
**Çêl:** Restemê nerm. *Nerm*bûn bi laş e.
Ew *pesin* çi hemberî *bêsînor* bî:
**Çêl:** Restemê mezin. *Mezin*bûn bê sînor e.
Ew *pesin* çi *hinerpêzan* bî:

**Çêl:** Restemê giran. *Giran*î bi hinerê ye.

Ew *pesin* çi *livînî* bî:

**Çêl:** Restemê xurt. *Xurt*î bi livînê ye.

Evên ku me li jorê gotin, hemî *tenha* ne û çêdibin *civînbêje*, weke: *Wa/lê* piştî (bertilî-nm). Çi *civînbêje* (navbêje) bî, çi *demgîr* bî, çi *yekxwedî* bî û çi *dusêxwedî* bî.

**Çêl:** Restem. Evê, ewê *zana, sor, nerm*.

Ev *mezin, xurt, giran, navbêje* ne.

Heçî *civînbêjê demgirî* divê *çengel*a **ku-**yê di piştî ser*peyvê bertilî* re bê.

**Çêl:** Restem, ewê ku dizanî/ ewê sor dikî/ ewê nerm bûye/ ewê mezin bûye/ ewê giran bûye/ ewê xurt bûye.

**Navên Vînxweserên Winda:**

Ev nav ew in ku hene û mirov bi laşê xwe pê şiyar dibî, lê bi dest û laş nayêne dîtin û nayêne girtin. Weke *deng* û *ba*yê. Ev jî di her tiştî de weke yên xuya ne di *hostebêjî*yê de. Belê çaxê ku tu *şûnbêja bertilî* di wan de bênî, weke yên xuya bi rastî ne, lê *vîndêhnî* ne û tu wan bi dilê xwe dibênî, ne bi çavên xwe.

Ev herdu nifş ne dibin *pesin,* ne dibin *bêjemak* û ne jî dibin *peymak*.

**Navên Vînxweserên Livînî û Derhişk:**

Ev herdu bi navê *sitewr* û *bêjemak* tên.

Navê *sitewrê Livînî.*

**Çêl:** Lez-lez.

Ev ew e ku nabî *bêjemak*, negotî. Nîşana *bêjemakî*; **andin** an **dan** e. Divê pê ve bikî. Weke: Bez**andin**, bez**dan**, lez**andin**, lez**dan**.

Yan *bêjemak*ê pê ve bikî ku **kirin** e. Weke: Bez**kirin**, lez**kirin**.

Heçî bêjemaka **bûn**ê, pê ve nayê. Ev nifş du hawe ne; *bêjemak* û *sitewr*. Lê bi xwe nabî *berpeyv*.

**Navên Sitewr ên Derhiş:**

Ev ew in ku nîşanên *bêjemakî* pê ve nayên û ne *livîne* ne, lê di hiş de ne. Weke: *Hiş, kul, derd, renc, kêf, endîşe*.

Ev bi anîna *bêjemak*ê dibin *bêjemak*. Weke: Kêf**kirin**... Yan tu *nîşangîr* bi *bêjemak*ê ve bikî. Weke:

- Kêf**anîn**, kul**dîtin**...

**Şeş Pesin:**

**1- Pesnê Sitewrên Livînî:**

Ev bi anîna *bêjemak*ê (kirin û bûn) dibî *zayinmak.* Weke: *Xurt, sist*... Ku dibin xurt**kirin**/ xurt**bûn**, sisit**kirin**/ sist**bûn**...

**2- Pesnê Sitewrê Hişlêzan**:

Ev bi hiş têne zanîn. Weke: *jîr, şît, zirz, har, dîn, rind, baş*...

**3- Pesnê Sitewrê Laşpêzan**:

Ev bi laş têne zanîn. Weke: *Nerm, hişk, şil, ziwa, sar, germ*...

**4- Pesnê Sitewrê Çavpêzan**:

Ev bi çavan têne naskirin. Weke: *Sor, xweşik, şahîk*...

**5- Pesnê Sitewrê Hemberî bêsînor**:

Ev bi *hemberî* têne zanîn. Weke: *Biçûk, mezin, gir, hûr, dûr, nêzîk, bilind, nizim*...

**6- Pesnê Sitewrê Hinerpêzan**:

Ev bi hinerê têne zanîn. Weke: *Giran, sivik*...

Ev her şeş *pesin* bi anîna *bêjemak* (kirin) û *bûn*ê dibine *zayinmak* û hemî jî dibin *berpeyv*. Weke: *Gul sor e/ ez sor im*...

**Navên Vînxweserên Bêjemak:**

Ev nav *zayîndare* ne. Yanî dizên û tişt ji wan çêdibin. Ev jî sisê ne: *Karmak, Kirmak û Bûnmak.*

**1-** *Karmak*, ew e ku jê karek tê zanîn. Weke: *Xwarin, dan, danîn*...

Ev *duxwedî* û *sêxwedî* ye. Çaxê çêdibî, ji yekî derdibî diçî bi alê yekî dî ve. Heye herî bi alê diduwan ve. Yê pêşî weke, *xwarin*. Yê dî weke, *danîn.*

**2-** *Kirmak*, ew e ku kirina tiştekî tê de çêdibî û bi yekî tenê çêdibî. Weke: *Rûniştin, çûn, hatin*...

**3-** *Bûnmak*, ew e ku tiştek dibî û tê ser yekî bê xwestina wî. Weke: *Mirin, ketin, mayîn, jîn*...

**Hişmak:**

*Hişmak*, ew e ku bi hiş tê zanîn. Weke: *Zanîn, banîn, pûnijîn*... (ponijandin).

**Jînmak:**

*Jînmak*, ew e ku bi can tê zanîn. Weke: *Arîn, bihîstin, dîtin...*

**Çavmak:**

*Çarvmak*, ew e ku bi çavan tê zanîn (nasîn). Weke: *Dîtin, nêrîn.*

**Laşmak:**

*Laşmak*, ew e ku bi laş tê zanîn. Weke: *Razan, zayin, mayin, måztin, hiştin, hêlam*...

**Tenhagirê Wan:**

Ev *bêjemak* tev nabin *berpeyv* ji bo *şûnbêj*an, weke tu bêjî: *Ez ranazim/ ew xwarine*, ev çênabî.

Ne tê de ku tu *vîn* bikî, *ev hawê xwarin*ê yan *ev rengxwarin e*.

Weha reng e nabî *berpeyv* ji bo *bêjenavî*, weke: *Restem xwarine*, ev çênabî.

Hem nabî *berpeyv* ji bo *hemyek*ê xwe, weke: *Xwarin xwarine*, ev çênabî.

Ne tê de ku tu *vîn* bikî, pesnek di wir de heye. Yanî, *xwarin xweş xwarin e*.

Hem nabî *serpeyv* ji bo *navê sitewr* tevan, weke: *Razan Restem e, dar e*. Lê dibî *serpeyv* ji bo *pesnê sitewr* hemiyan ku ji hemberê hev bin, weke: *Razan xweş e* çêdibî. Lê *razan bilind e* çênabî. Lewra *razan* û *bilind* ne hemberê hev in. *şûnbêj* tev û *navê sitewr* weha ne, tev naxwe. Lê divê *berpeyv* her ji tevan re *pesin* bî, çi *bêmak* û çi *peymak* bin.

**Nîşanên Bêjemakan:**

Nîşanên Bêjemakan ev in: *Hene, herdemî/hene, hindemî*.

**Herdemî:**

Nîşanên Bêjemakan ên *herdemî*, ew in ku timî digel *bêjemakî*yê têne gotin û çênabî ku bê wê nîşanê bêne gotin. Ew, evên ha ne: *Yin/ yan/ tin/ în/ in/ an/ n/ din/ yan*.

**Tin**: Avê + *tin*, bihîs + *tin*, rêh + *tin*, go + *tin*, so + *tin*, cû + *tin*, xwes + *tin*, kuş + *tin*, hiş + *tin*, doh + *tin*, ko + *tin*. Ev hemî bê nîşan nayêne gotin.

Belê hinek *rêzava* hene ku bê nîşan têne gotin. Weke: *Rîs, ris**tin**/ biz, biz**tin**/ xwaz, xwaz**tin***.

**Tenhagîr:**

Ev hemî duxwedî ne û hene:

**Karmak** weke ***avêtin*.**

**Kirmak** weke ***rûniştin*.**

**Laşmak** weke ***bihîştin, dîtin*.**

**Hişmak** weke ***xwestin*.**

**Çend Tîpî ne:**

**- Dutîpî/ *cûtin, gotin***.

**- Sêtîpî/ *guftin, sojtin*** ê yekavêtî.

**- Sêtîpî/ *kuştin, hiştin*** ê hersêgotî.

Heger bêhtirî sê tîpan bê, ew *duker* e, weke: ***Bihîstin***/ berê ***ba hîstin***. Yanî xwedî hîs: Deng hatiye guhan.

**Din:**

***Xwen*** + **din**, ***jen*** + **din**, ***çan*** + **din**.

**Tenhagîr:**

Ev jî ***duxwedî*** ye: **Karmake**/ *sêtîpî* ye.

**În:**

An**în**/ dan**în**/ zan**în**/ ban**în**... Ev *herdemî* ne.

Kir**în**/ bir**în**/ gir**în**/ ken**în**/ nal**în**... Ev *hindemî* ne:

**Tenhagîr:**

Ev jî *duxwedî* ye: **Karmake**/ **hişmake**...

**In:**

Zay**in**/ may**in**/ gay**in**/ xwar**in**/ mir**in**/ bir**in**/ ji vî dergehî ye.

**Kirin û Bûwin** (bûyîn)**:**

*Tenhagir,* **herdemî** û **hindemî** hene.

Yên *hindemî* weke: **Kirin**. Tu karî bêjå **kir** yanî *kirin.*

Ev jî *duxwedî* ne û *sêxwedî* ne:

**- Laşmak/** zay**in**, may**in**.

**- Kirmak/** kir**in**.

**- Bûnmak/** bûy**in**.

**- Karmak/** bir**in**.

**Yan/ n**/ **yin**/ cîgira **in** û **în** in.

Ev di şûna **in** de tên, çaxê ku tîpa paşî ji vî *nifşê bêjemakî* (a) bî, weke:

- Va**n**, v**în**, vî**yan**.

- Ga**n**, gay**in**.

- Jî**n**, ji**yan**.

Naxwe ku paşîya bêjemakî (**a**) bî, heye (**n**) tenê bê, weke **van** û heye **yin** bê weke *ga**n**, ga**yin***. Heger (**î)** bî, dîsa heye (**n**) tenê bê û heye (**yan**) bê, weke vî**n***, vî**yan***.

Dîsa çaxê paşî (**a**) bî, heye (**n**) tenê bê, weke *va**n***. Heye (**a**) bibî (**î**) û (**yan**) bê, weke *van*, *vî**yan*****.** Heye (**yin**) bê, weke *van, va**yin***.

**Tenhagir:**

Ev *dutîpî* ne; *yekxwedî, duxwedî* û *sêxwedî* tên. Weke:

**- jîn**; yekxwedî.

**- Vîn**, **van**; duxwedî.

**- Dan, dayin**; sêxwedî.

Heye, ***karmak/* dan, dayin.**

Heye, ***bûnmak/* vîn, viyan.**

Ev jî, nîşana *herdemî* ye.

**Nîşanên Bêjemakî yên Hindemî:**

Hîmê *Nîşanên Bêjemakî yên Hindemî,* bê nîşan jî têne gotin. Ew him **andin** e û piştî navê sitewr ê livînî û yê hişpêzan tê; wan digerînî duxwedî. Weke:

- *Gerr, gerr***andin.**

- *Hed, hed***andin.**

Ev jî *hindemî* ye û dikevî ser navên weke: **Sitewr**/ *livînî*, yên weke *ve***dan**/ *ber***dan**.

**An:**

Ev jî *herdemî* ye, sê-çar tîpî ye û di pey *tîpên ziwa* de tê. Weke: *Kol***an**/ *hêr***an**/ *seyr***an**/ *dêr***an**...

**Tenhagir:**

Ev *karmak* tê, weke: *Kolan/ hêran/ seyran/ dêran*...

Ev *Jînmak* tê, weke: *Seyran.*
Hem ev *duxwedî* tê, weke: *Kolan...*
Geh *amîret û duxwedî* tê, weke: *Seyran*. Yanî, lê seyran.

**Dan:**

Ev ji *nîşanên bêjemakê, hindemî* ye. Weke: *Ba**dan**/ biz**dan**/ ra**dan**/ ve**dan***...

**Tenhagir:**

Ev dikevî ser *amîretan*, weke: *Radan/ badan/ vedan*...

Dikevî ser navên *livînî*, weke: *Bizdan/ mizdan/ firdan/ berdan/ girêdan/ hildan*...

Dikevî ser navên *nifşên xuya*, weke: *çavdan/ serdan/ destdan*...

Dikevî ser *navên bêsînor*, weke: *Hildan/ berdan*...

Dikevî ser *navên vînpêzan*, weke: *Zordan/ guhdan/ hişdan*...

**Tenhagir:**

Ev *tenhagir* dibî duxwedî: **Bûn** û **kirin**.

Ev herdu piştî her şeş *nifşên pesin* tên û wan digerînin *bêjemak*. Geh bi *amîret* û geh *bê amîret* tên. Weke:

**- Hişpêzan**, *bêamîret*/ jîrkirin, j*îr bûn.*
**- Laşpêzan,** *bêamîret*/ nermkirin, *nerm bûn.*
**- Çavpêzan,** *bêamîret*/ sorkirin, *sor bûn.*
**- Hemberî** *bêsînor*/ mezinkirin, *mezin kirin*.
**- Hinerpêzan,** *bêsînor*/ girankirin, *giran bûn.*
**- Livînî,** *bêsînor*/ xurtkirin, *xurt bûn.*

**Kirin** û **Bûn**:

Digel *navên xuya* û yên ***derhiş*** ku *amîre*tek piştî wan bê.

Weke: **Çavlêkirin**/ çav lê bûn.
Weke: **Destpêkirin**/ dest pê bûn.
Weke: **Bîrpêkirin**/ bîr pê bûn.

Weke: **Guhlêkirin**/ guh lê bûn.

Digel *navên karbêj.*
Weke: **Karkirin**/ kar bûn.
Weke: **Barkirin**/ bar bûn.

Weha reng e *pesnê peymak:*
Weke: Xwe re kirin/ **xwerbûn,** ê karmak.
Weke: Zana kirin/ **zanabûn,** ê hişmak.

Çi *bêjemakên* **tin** û **din** ku hene, ne tê de çaxê ku tu nîşanê ji wan bavêjî, tu nikarî **andin**ê bixî wan. Weke:

- Mirin/ *mirandin*.
- Zayin/ *zêyandin*.
- Gihan/ *gihandin*.
- Nalîn/ *nalandin.*
- Alîn/ *alandin.*
- Alan/ *alandin*.

Heçîka **andin** bi *bêjemakên derhişî* re nayê. Weke: *Zanîn,* nabî *zanandin*. Belê *bêjemak*ê **dane** dikevî pêşiyê. Weke: *Dane zanîn*.

Hem yên *çavpêzan*ê dikevî pêşiyê. Weke: **Dîtin**/ *dane dîtin*.

Hem yên *jînpêzan*ê dikevî pêşiyê. Weke: **Bihîstin**/ *dane bihîstin*.

## 05-PEYMAK

**PEYMAKÊ YEKÊ**

**Kardarên Bêdem:**

*Peymak* ji *bêjemak*ê bi avêtina hinek tîpan û anîna hinek tîpan çêdibî. Ew jî çend pişk in:

**Pesnê Peymak:**

Ev bi avêtina nîşana *bêjemak*ê çêdibî. *Peymak*ê ji *bêjemakê duxwedî,* bi avêtina nîşana *bêjemakî* û anîna tîpa (**e**) di şûna wê de çêdibî. Weke:

- Xwer**e**/ **xwarin**. Ev *karmak* e.
- Zan**e**/ **zanîn**. Ev *hişmak* e.

Ji yên *bûnmakan*, (**in**) tê avêtin û tîpa (**î**) dikevî. Weke: Mir**î**/ mirin.

Ji yên (**din**) nîşan têne avêtin û tîpa (**e**) dikevî paş. Weke:

- Xwend**e**/ **xwendin.**

Ev (**in**) tê avêtin û (**d**) dimênî. Weke:

- Jen**d**e/ **jendin**.

Evên ku duxwedî ne, (**tin**) jî bi avêtina (**in**)ê ji (**tin**)ê (**t**) dimênî û dûvikê **ar, yar, kar, ker** çêdibin. Weke: Av**tar**, y**ar**, k**ar**, k**er**...

Ji (**tin)***ê yekxwedî* bi avêtina (**in**)ê ji (**tin**)ê û anîna (**î)**yê di paş de çêdibî. Weke: Rûnişt**î**/ rûniştin.

Di vî bêjemakê (**tin)**ê de ku tîpa avêtî vegerî, (**tin**) tev diçî û (**e**) tê, mîna yên dî. Weke:

- Bavêj**e**. Ji avêjtin: Avêtin.

- Dihoş**e**. Ji dihoştin: Dohtin.
- Soj**e**. Ji sojtin: Sotin.
- Daviş**e**. Ji dohiştin: dotin.

Hem di *bêjemakê* (**tin**)ê de jî çêdibî ku nîşanên cuda weke **ar, yar, dar, kar** ku neyên, tenê tîpa (**e)** tê. Weke:
- Avêt**e**/ avêtin.
- Kuj**e**/ kuştin.
- Cût**e**/ cûtin.
- Firoş**e**/ firotin.

**Dan**:

Ev bi avêtina tîpa (**n**) û bi anîna *bêjemaka* (**kirin**)ê çêdibî. Tîpa (**n**) jî jê bavêjî, dibî (**kir**) û bêjeya (**kir**) di paş da bênî. Weke:
- Bada**kir**/ badaker, ji badanê.
- Ava**kir**/ avaker, ji **avdan**ê.
- Hilda**kir**/ hildaker, ji **hildan**ê.

**Andin:**

Ev bi avêtina (**in)**ê ji paşiya (**andin**)ê û anîna tîpa (**î**) digel bêjeya (**kir**)ê çêdibî. Weke:
- Kelandî**ker**, ku ji **kelandin**ê ye.

Hem tu dikareî (**din**)ê bavêjî. Weke:
- Kelan**ker***,* ku ji *kelandin*ê ye.

Hem jî tu dikarî (**andin**)ê tevî bavêjî. Weke:
- Kela**ker**, ku ji *kelandin*ê ye.

Weha reng e çi *bêjemak*ên ku hebin, tu dikarî bi vî hawî çêbikî. Weke:
- Kuştî**ker**, kuj**ker** ku ji *kuştin*ê ne.
- Bade**ker**, ba**ker** ku ji *badan*ê ne.

- Miraî**ker**, mire**ker** ku ji *mirin*ê ne.
- Zana**ker,** ji *zanîn*ê ye.

Ev dibin *sêxwedî*.

Weha reng e her şeş pesin:

- Jîr**ker**, jîre**ker**, ji *jîrî* tê û *derhiş* e.

Ev wilo dibî *sêxwedî*:

- Sor**ker**, sore**kerkir**, ji *sor*î çêdibin û *çavpêzan* e.

Ev wilo dibî *sêxwedî* û **karlêder** lê *guhertî* dibî.

- Nerm**ker**, **kir** ji *nerm*î û *laşpêzan* e.
- Giran**ker**, **kir** ji *giranî* û *bê sînor e*.
- Germ**ker**, **kir** ji g*ermî* û *jînpêzan* e.
- Xurt**ker**, **kir** ji *xurtî* û *livînî ye*.

Weha reng e dikevî pişt navên *sitewr* ku kîjan be jî, lê yên kesnetêde. Weke:

- Çê**ker**, jîn **kir** (ji çêbûnê), *bûnmak*.
- Kêf**ker** (kir kêf), *hişmak*.
- Deng**ker** (kir deng), *winda*.
- Zîv**ker** (kir zîv), *xuya*.
- Êrîşker (kir êrîş), *livînî.*

Weha reng e **dan** jî dikevî pişt van navan. Weke:

- Kêf**dan**/ deng**dan**/ çav**dan**/ êrîş**dan**.

Lê yên *bûnmak* ne tê de, ew çênabî. Weke: *Çêdan.*

Weha reng e **ek**, **ok** û **ik** çaxê ku bikevine pişt *pesnê stewr* û ku *livînî* bî, ji bo *serkar*î dibine nîşan. Weke:

- Lez**ek**, lez**ok**, lez**ik** (Ji lezkirinê ye).

Hem *serkarê peymak* ku ji *bêjemak*ê **in**, **în** û **an** bî. Weke:

- Bir**ek**, ji *birîn*.
- Nal**ek**, ji *nalîn*.

Weha reng e nîşanên **ar, dar, yar, kar, end, mend, bend, wend, ing, eng, wer, war, awer, êr, wêr, în, van, wan, man** û **va**. Ev hemî dikevin paşiya *navên vîndar*, ên *xuya*, pesnê *peymak* in û bi vîna xwedî tên. Weke:

- Sal**ar,** yanî bi sal.
- Dil**dar**, yanî bi dil.
- Hiş**yar**, yanî bi hiş.
- Zor**kar**, yanî bi zor.
- şerm**end**, yanî bi şerm.
- Zêr**mend**, yanî bi zêr.
- Gul**bend**, yanî bi gul.
- Gul**wend**, yanî bi gul.
- Bêj**ing**.
- Leh**eng**.
- Ser**wer**.
- Vîn**war**.
- Ceng**awar.**
- Dil**êr**.
- Ser**wêr**.
- şerm**în**.
- Xwende**van**.
- Kar**wan**.
- Qewhur**man**.
- Zare**va**.

**PEYMAKÊ DIDUYAN**

**Berekar:**

Ev nifşek ji yê navên *peymak* e û ji *bêjemak* û *navê vîndar* çêdibî.

Yên ji bêjemakê:

Ev ji bêjemakên **tin, din, andin** û **dan** çêdibî. Ev bi avêtina **in** ji paşiya hersêkan çêdibî, weke:

**- Revandî**/ ji revandinê.

**- Avêtî**/ ji avêtinê.

**- Xwendî**/ ji xwendinê.

**- Badayî**/ ji badanê.

Ev ji bêjemakên **în, an, in** û **n** çêdibî bi avêtina nîşanên **anî, na** û **î**-yê. Lê divê ku tu *amîret*a **da** yan **ra** yan **dane** yan jî **hate** berî wan bênî. Weke:

**- Da**birrî/ ji birrînê.

**- Ra**birî/ ji birinê.

- **Dane**/ tune.

**- Hate**nalî/ ji nalînê.

**- Hate**dayî/ ji dayinê.

**- Hate**danî/ ji danînê.

Ev ji *bêjemak*ên *stewr* ên bênîşan çêdibin, bi anîna **ber** û **bi** berî wan. Weke:

**- Ber**vîn/ **bi** vîn.

**- Ber**şîn/ **bi** şîn.

Hem bi anîna **ber** û **bere** piştî wan çêdibî. Weke:

- Vîn**ber**/ vîn**bere**.

- Jîn**ber**/ jîn**bere**.

## PEYMAKÊ SISYAN
## BIHURTÎ

### Demgirê Bihurtî:

*Demgirê Bihurtî* bi avêtina nîşanên bêjemakê **tin, din, in, în, an, yin, yan** û **andin**ê çêdibe. Lê di tevan de **in** tenê diçî. Duvikên ku bi paşiya wan ve dibin, şeş in: **ibû/ ibûna/ ibana/ iba/ ibî/ iye**. Ev her şeş dûvik, çaxê bihurtî û berfireh û navde tên, piştî ku *şûnbêjê berteng* bê. Lê di **tenha, zo** û **peyzo**yê de nayên guhertin.

**Ibû**, ji bo bihurîyê ducar. Ev dûvik, piştî bihurîyê ducar tê. Weke tu bêjî:  Min, te, vî, wî, vê, wê, van, wan, me, we (pirtûka) *Pelxîz* xwend**ibû**.

Yanî berî niha ez çûme, min lê pirsî, wî berî hingê xwendibû. Ev du caran bihurtî ye, du caran heyînî ye û neyînî jî çêdibî. Weke: Min/ te nexwendibû.

Vîna dûvikên **ibûna, ibana, iba** yek e. Ev piştî *bihuriyê nehatî* tên (hegerî, dû civînbêje) weke: Min/me, te/we, vî/van, vê/van, wî/wan, wê/wan (ê, yê, wê, dê)

- xwaribûna
- xwaribana
- xwariba

Yanî heger te nan jê re biribûna, wê xwaribana. Lê te nan nebir.

Li gor **heyîn** û **neheyîn**ê û li gor **bihurî** û **nehatî**yê gelek hawên vî nifşî hene. Lewra *Civînbêj*ê paş wê ku weke wê bî, çaxê ku herdu **heyîndar** bin, mîna: *Heger te xwendiba, dê wî xwendiba*.

Çaxê ya paş **neheyîn** bî, wê bibî *derkêliyê bihurtî*. Mîna em bêjin: *Heger te ew danîbana, tu nediwestî*. Va ye *diwestî* derkêlî ye.

Vêca ev *civînbêj*ê pêşî heye *bihurî* bî û yê paş jî bihurî bî, yanî dev ji herdukan hatiye berdan û heye herdu nehatibin, yanî *çivaza* bihurî û derkêlî ne. Lê vîna wan nehatiye. Heye yê pêşî bihurî bî û yê paşî nehatî bî, yanî dabaş niha ye û yê pêş hegera bihurtî ye û yê paş hegera nehatî ye. Weke tu bêjî: *Heger tu doh hatiba, ew ê jî ji vir pê de hatiba*.

Weha reng e **iba, ibana, ibûna, ibî** ji bo goman û xwazmendiyê tên. Ev yek civînbêj e, navê wê *bihuriya gomanî* ye. Weku amiretekê yan bêje(ye)k ji yê pirsmendiyê di serê civînbêjê de bê **li** bi civîna gumanê ne **a** yan jî demgira **heye** di serî de tê, ku ev jî goman e. Weke:

**-** Gelo *wê* xwar**ibî**, rûnişt**ibî**?

- Ma *wê* xwar**ibî**, rûnişt**ibî**?

Navê vî nifşî, *rengbihurî* ye. Lewra tê de *amîreta nehatî* tê ku **wê** ye.

Bihurîyê Gomanî:

- **Heye** xwar**ibana.**
- **Heye** xwar**ibûna.**
- **Heye** xwar**ibî**.

Bihuriyê Xwazmendî:

- Xwezî min xwar**iba.**
- Xwezî min xwar**ibana.**
- Xwezî min xwar**ibî.**

Di van tevan de çaxê ku *karlêder* **zo** yan **peyzo** bî, di paşiya *demgir*ê de li şûna **î**-yê **in** tê, weke:

- Min dê herdu/ hersê nan xwarib**in**.
- Xwezî/ heye min hersê nan xwarib**in**.

**Ye**, di paşiya zûbihurî de tê. Ev di paşiya *demgîr*ê de tê ku karlêder tenha bî û **ine** tê ku karlêder **zo** û **peyzo** bî, weke:

- Min/me, te/we, vî/van, vê/van nanek xwari**ye.**
- Wî/wan, wê/wan, nanek xwari**ye.**
- Min/ me, te/we, vî/van, vê/van du-sê nan xwar**ine.**
- Wî/wan, wê/wan, du-sê nan xwar**ine.**

**Nêzbihurî:**

Çaxê ev *tenha* bî, tiştek bi paşiya wê ve nayê. Çaxê **zo** û **peyzo** bî, li gor *karlêderî* **in** bi paşiya wê ve tê. Weke:

- Min/ wan nanek xwar (tenha).
- Min/ wan du-sê nan xwar**in** (peyzo).

Naxwe şûnbêja dûvik li gor *karpêderî* di paşiya *demgir*ê de tê.

# PEYMAKÊ ÇARAN
## BIHURTÎ

**Bihuriya Derkêlî ji Peymakê Çaran:**

Ev bi avêtina hemû nîşanên bêjemakî çêdibî, tu dûvik pê re nayên û destikê **di** kêliyê di serî de tê. Çewa ku ev, di *demgira duxwedî* de jî wilo ye. Weke:

- Min/ wan nanek **di**xwar (tenha).
- Min/ wan du-sê nan **di**xwarin (peyzo).

**Bihurî, Denkêlî/ Demgira Yekxwedî:**

Ev bi avêtina nîşanên bêjemakî çêdibî, destikê **di** di serê wê de tê, şûnbêja berfireh berî wê tê û şûnbêja dûvik di pey demgîrê de tê.

**şûnbêjên Berfireh:**

şûnbêj ev in: *Ez/tu, me/hûn, ev/ew, evana/ewana.*

**şûnbêjên Dûvik:**

şûnbêj ev in: *...im, ...î* û *...in.*

Weke tu bêjî:

- Ez dirûnişt**im**/ tu dirûnişt**î**.
- Ev dirûnişt/ ew dirûnişt.
- Em dirûnişt**in**/ ew dirûnişt**in**.
- Evana dirûnişt**in**/ ewana dirûnişt**in**.

Weha reng e *şûnbêjên dûvik* dîsa di paşiya *demgîra bihurî* de tên, çaxê ku *hegerî* yan *gomanî* yan *xwazmendî* yan *regnbihurî* bin. Weke:

- Ez çûbûm/ çûbûma/ çûbama/ çûba/ çûbî.
- Tu çûbû/ çûbûna/ çûbana/ çûba/ çûbî.

- Ev, ew rûniştibû/ ...rûniştibana/ ...rûniştibûna/ ...rûniştiba/ ...rûniştibî.

- Em, ew rûniştibûn/...rûniştibana/ ...rûniştibûna/ ...rûniştibin.

- Evana, ewana rûniştibûn/ ...rûniştibana/ ...rûniştibûna/ ...rûniştibin.

## PEYMAKÊ PÊNCAN

**Derkêlî ji Peymakê Pêncan:**

Ev ji *Demgirê Dusêmak e*.

Ev bi avêtina nîşanên bêjemakî çêdibî, destikê **di** dikevî serê wê, şûnbêja berteng di pêşiya wê de tê û tiştek tê paşiya demgîrê. Weke:

- Min/me, te/we, vî/van, wî/wan, vê/van nanek **di**xwar (tenha).
- Min/me, te/we, vî/van, wî/wan, vê/van du-sê nan **di**xwarin (peyzo).

**Derkêlî Ji Demgîrê Yekxwedî:**

Ev piştî  şûnbêjên berfireh û dûvik li pey demgîrê tên. Weke:

- Ez diçim**im**/ tu diçî**î**.
- Em diçin**in**/ hûn diçin**in**.
- Ew/ ev diçû**û**, evana/ ewana diçûn**ûn**.

## PEYMAKÊ ŞEŞAN

**Peymakê Nehatî yê şeşan** ji *Demgîra Dusêxwedî.*

Ev di hinek şêweyên kurmancî de bi avêtina *nîşanên bêjemakî* piştî *şûnbêja berfireh* tên û *amîret*a **bi** dikevî ser. Berî **bi**yê, destikê **wê, yê, ê** û **dê** tên, dûvik jî li pey *demgîr*ê tên. Weke:

- Ez **ê**/ **yê**/ **dê**/ **wê** kujim. **Bi**kujî (î).
- Em, hûn **ê**/ **yê**/ **dê**/ **wê** kujin. **Bi**kujin (in).
- Ev, ew **ê** / **yê**/ **wê**/ **dê** kujî. **Bi**kujî (î).
- Evana, ewana **ê**/ **yê**/ **wê**/ **dê** kujin. **Bi**kujin (in).

**Nehatî ji Demgîra Yekxwedî:**

Ev jî piç bi piç weke ya *dusêxwedî* ye. Weke:

- Ez **ê** herim.
- tu **ê** herî.
- Em/hûn **ê** herin.
- Ev/ew **ê** herin.
- Evana/ewana **ê** herin.

Ev demgîr çi bihurî bin û çi nehatî bin, her yek li gorî benga wan navekî wan heye. Weke:

- Ez **ê** herim - *yekxwebêj*.
- Tu **ê** herî - *pêşdarê tenha.*
- Em **ê** herin - *gelxwebêj.*
- Hûn **ê** herin - *pêşdarê peyzo.*
- Ev **ê** herin - *bertilî tenha.*
- Ew **ê** herî - *windaê tenha.*
- Evana **wê** herin - *bertilî peyzo.*
- Ewana **wê** herin - *windaê peyzo.*

Çi *demgîra tenha* ku hebî, di *nehatî* de dûvikê piştî wan çend tîp her yek li gor şêwekî bi çend hawa tên. Ew şêwe jî ev in:

- Ti/ ev/ ew ê her**î** - (î) Dekşûrî*.
- Ti/ ev/ ew ê her**ê** - (ê) Aşîtî*.
- Ti/ ev/ ew ê her**e** - (e) Bişêrî*.
- Ti/ ev/ ew ê her**i** - (i) Kîkî, Milî*.
- Ti/ ev/ ew ê her**a** - (a) Hebizbinî*.
- Ti/ ev/ ew ê heri**t** - (t) Botanî*.
- Ti/ ev/ ew ê heri**tin** - (tin) Behdînî*.

Vêca çaxê ku (**t**) di paş de tê, di hemiwan de tê. Weke:

- Em/ hûn ê heri**tin.**
- Evana/ ewana dê heri**tin.**

Ev **nehatî** ye, yanî hê nehatiye. Ku tu bi vê hê bi paş de bimênî, tê amîreta **hê** bixî ser, weke tu bêjî: *Wê* **hê** *herî*. Yanî tu dibêjî: *Ne siba, du siba wê herî.*

Çi **bêjemak**ê ku hebî nîşanên wan ên di **nehatî** de têne avêtin, weke:

- Wê biavêjî/ avêt**in** (in).
- Wê bixwênî/ xwend**in** (din).

* Dekşûrî, Aşîtî navên eşîran in. Bişêrî navê herêmekê ye. Kîkî, Milî û Hebizbinî navên eşîran in.

- Wê bimirî/ mirin (in).
- Wê binalî/ nalîn (în).
- Wê bikolî/ kolan (an).
- Wê bijî/ jîn (n).
- Wê bijî/ jîyan (yan)
- Wê bizê/ zayin (yin).

Di vêya paşî de (zayin-nm), **a** çûye û bûye **ê**. Gereke bigota: *Wê bizaî*. Lê gotina wiha giran e, di şûna **a-î** de **ê** tê ji bo sivikbûnê, yan gereke bigota: Wê bizayî.

- Wê bixelênî/ xelandin (din) tenê.

Ji (**an**)ê, (**din**) çûye û maye (din), (A)ya wê jî bi (ê) hatiye guhartin. Vêca bûye: *Wê bixelênî.*

Weha reng e hemî *bêjemak*ên **andin**ê bi vî hawî çêbî/ bêjemakê *xwarin* û *kirin*ê ne tê de. Ji van tenê nifşê **in**ê ne weke hevalên xwe ne. Lewra di **nehati**yê van herduwan de bê ka çawa **in** diçî û tîpa **r** jî diçî. Nexwe em ê bêjin ku **rin** jê diçî. (in) nîşan e û (r) jî tîp e, him weke:

- Wê bixwî/ yanî wê bixwêrî, ji (xwarin)ê.
- Wê bikî/ yanî wê bikirî, ji (kirin)ê.

Heye ku ev karê ha çêbûbî, ji bo ku naskirin bikevî navbera: *wê bixwerî*/ ji xwerînê, yanî gurrî û navbera *wê bixwerî*/ ji xwarinê, yanî şîv û firavîn. Û ji bo naskirina *wê bikirrî*/ ji kirrîna hemberê firotinê. Û navbera *wê bikirî*/ ji kirina hemberê bûyînê.

Vêca *bêjemak* du nifş in. Weke ku me got *yekxwedî* hene û *dusêxwedî* hene.

**Bêjemakên yekxwedî:**

Bêjemak ev in, weke:

- Rûniştin (tin).
- Mirin (in).
- Nalîn (în).
- Razan (an).
- Vejendin (din).
- Jîyan (yan).
- Zayin (yin).

Naxwe *Bêjemakên Yekxwedî* heft in: **Tin/ in/ în/ an/ din/ yan/ yin.**

Ev ew in ku şûnbêja berteng berî wan nayê, çênabî ku tu bêjî: *Min rûniştim/ vî rûnişt/ te rûnişt*.

Lê ku mirov amîretekê di serê van de bênî çêdibî, weke tu bêjî: *Lêrûniştim/ pêrûniştim/ jê rûniştim*. Hem çi peymakên ku jê çêdibin jî wilo ne, weke tu bêjî: *Lê rûnişt/ lê rûniştî/ pê rûniştî.*

Bêjemakên dusêxwedî. Ev ew e ku ji yekî derdibî û bi yê dî çêdibî û heye li yekî dî çêdibî, weke:

- Avêtin (tin).
- Xwendin (din).
- Kirin (in).
- Birrîn (în).
- Kolan (an).
- Gayin (yin).
- Van (n).
- Berdan (dan).
- Vîyan (yan).
- Beyandin (andin).

Naxwe *Bêjemakên Dusêxwedî* deh in: **Tin/ din/ in/ în/ an/ yin/ n/ dan/ yan/ andin.** *şûnbêja berfireh* nakevî ser van bêjemakan, çênabî ku tu bêjî: *Ez avêtim/ tu avêt/ vî rûnişt*.

Weha reng e ev nifş bi hawakî dî jî çêdibî. Lewra çaxê ku tu amîretekê bikî destik, jê re vîneke dî didî. Weke: *Xistin*. Ev duxwedî ye. Lewra tu dibêjî ku *min ew xist*. Va ye (min) serpeyv e, (ew) karpêder e û va ye ev duxwedî ye. Ku te got: (Lê xist), dibî sêxwedî. Lê karlêder nayê gotin û bi vî haweyî vîneke dî didî. Lewra çaxê tu bêjî (min lê xist), yanî min ew êşand, va ye (min) serpeyv e, (lê) amîreta çengel û karlêder e. Ev bû duxwedî

û karpêder ev e. Yanî (min dar li wî xist), va ye bû sêxwedî. Lewra (dar) nehatiye gotin.

Weha reng e *pêxistin*/ min pê xist: *Min agir bi mûmê xist*/ *min xwar*/ *min lê xwar*/ *min li gor wî dît.*

Weha reng e yê yekxwedî jî wilo, weke: *Rûniştim*. Yanî dilê min lê rûnişt. Eger **ra/ da/ hil/ rû** ji van yek di serî de hebî, (**wê)** tê û (**bi**) nayê. Weke: *Wê **ra**bî*/ *wê **da**kevî*/ *wê **rû**nit*/ *wê **hil**dî*. Hem *demgira* (**here**) jî wilo ye, weke: *Wê herî*/ û êdî çêdibî ku (bi) bê yan neyê.

## PEYMAKÊ HEFTAN

**Berexwazî:**

Ev ew e ku didî zanîn ku divê bikî. Û ev nûpeyda ye, ne berê bûye. Lewra dibêjî: *Niha bike*, yan *ji vir pêde bike*, ne ku dibêjî: *Berê bûye*, yan *wê hê bibî*. Vêca ev ji çi çêdibî û çilo çêdibî, em ê niha bêjin.

**Berexwazê Pêşdar:**

Berexwazê Pêşdar ji *nehatî* çêdibî, bi avêtina amîreta **wê** ji serê nehatîyê. Wekî dî di her tiştî de weke **nehatî**yê ye.

Bêjemakê (**tin**)ê weke:

- Bavêje: Biavêje (avê**tin**). Ev *pêşdarê Tenha* ye.
  - Hûn herdu/ hûn hersê bavêj**in**. Ev Pêşdarê *Zo* û *Peyzo* ye.
  - Hilêne, hilênin/ hila**tin**.

Bêjemakê (**din**), weke:

- Bixwêne, bixwênin/ xwen**din**.

Bêjemakê (**in**) ê Dusêxwedî, weke:

- Bike, bikire/ bikin, bikirin/ kir**in**.

Bêjemakê (**kirin**)ê

- Bêjemakê (**in**) ê Yekxwedî, weke: Bimire, bimirin/ mir**in**.
- Bêjemakê (**în**) ê Dusêxwedî, weke: Bikirre, bikirrin/ kirr**în**.
- Bêjemakê (**în**) ê Yekxwedî, weke: Binale, binalin/ nal**în**.
- Bêjemakê (**n**) ê Dusêxwedî, weke: Bive, bivin/ vî**n**.
- Bêjemakê (**n**) ê Yekxwedî, weke: Bije, bijin/ jî**n**.
- Bêjemakê (**yin**) ê Dusêxwedî, weke: Bige, bigin/ ga**yin**.
- Bêjemakê (**yin**) ê Yekxwedî, weke: Bimêne, bimênin/ ma**yin**.
- Bêjemakê (**yan**) ê Dusêxwedî, weke: Bişiye, bişiyin/ şi**yan**.

- Bêjemakê (**yan**) ê Yekxwedî, weke: Biçirre, biçirrin/ çirr**yan**.
- Bêjemakê (**dan**) ê Dusêxwedî, weke:

a) Berde, berdin/ ber**dan**.

b) Lê de, lê din/ lê**dan**- amîretî.

c) Hilde, hildin/ hil**dan**- destikî.

Bêjemakê (**dan**)ê Yekxwedî, weke:

- Xwê bide, xwê bidin/ xwê**dan**.

Divê ku destikê (**bi**), di serê **demgîr**ê de bê. Lê (**bi**) dikare di ê berî wê de bê, dikare nê. Çaxê **amîret** û **destik** hebin, weke:

- Hilde, hil**bi**de/ lê de, lê **bi**de/ Rade, ra**bi**de jî têne gotin.

Bêjemakê (**an**)ê Dusêxwedî, weke:

- Bikole, bikolin/ kol**an**.

Bêjemakê (**an)**ê Yekxwedî, weke:

- Bihêle, bihêlin/ hêl**an**- bi vîna hiştinê.

Bêjemakê (**andin**)ê Dusêxwedê, weke:

- Bigerrêne, bigerrin/ gerr**andin.**

Bêjemakê (**andin**)ê Yekxwedî, weke:

- Jê bigerêne- ev nîne û çênabî, lewra yê **andin**ê *Yekxwedî* nîne ji bilî **Bêjemakê Dengî**, weke:

- Bilîlîyêne, bilîlîyênin/ lîlîy**andin**.

**Berxwazê Winda:**

*Berxwazê Winda* ji *Demgîra Nehatî* çêdibî, destikê wê tê avêtin û bêjeya **bere** dikevî ser wê, weke:

- **Bere** (bila) biavêjî, **bere** biavêjin-avêtin.
- **Bere** hilê, **bere** hilên-hilatin.
- **Bere** bixwênî, **bere** bixwênin-xwendin.
- **Bere** badî, badin/ **bere** babidî, babidin-badan.
- **Bere** hildî, hildin/ **bere** hilbidî, hilbidin-hildan.

- **Bere** radî, radin/ **bere** berdî, berdin-berdan.

Naxwe navê *nifş* piştî amîreta (**bi**)yê ya piştî (**ra**)yê nayê, ji ber ku ev ne mînaye **amîret** û **demgîrê.**

- **Bere** binalî, binalin/ nalîn.
- **Bere** bibirrî, bibirrin/ birrîn. Ev, bê (**bi**)yê çênabî.
- **Bere** bixwî, bixun/ xwarin.
- **Bere** bimrî, bimrin/ mirin. Ev, bê (**bi**)yê çênabî.
- **Bere** bijî, bijîn/ jîn, jîyan.
- **Bere** bivê, bivin (bivên)/ vîn, vîyan. Ev, bê (**bi**)yê çênabî.
- **Bere** bikolî, bikolin/ kolan.
- **Bere** bihalî, bihalin/ halan (hewar). Ev, bê (**bi**)yê çênabî.
- **Bere** bigiyê, bigiyên/ bigê, bigên (bigîjê).
- **Bere** biziyê, biziyên/ bizê, bizên. Ev, bê (**bi**)yê çênabî.
- **Bere** biqelişênî, biqelişênin/ qelişandin.
- **Bere** bilîlîyênî, bilîlîyênin/ lîlîyandin. Ev, bê (**bi**)yê çênabî.

**ŞÛNBÊJE:**

şûnbêje di şûna navekî kes de, yan di şûna navekî nifş de tê gotin. Weke tu bêjî:

- *Ev/ew hat*. Yanî weke tu dibêjî: *Restem hat*. Ev, navê kes e.

Weke tu bêjî:

- *Ev/ew bajar*. Yanî weke tu dibêjî: *Nisêbîn.*

Belê çi şûnbêja ku ji bo navê nifş bê gotin, tim dibî *bêrohnî* û navê nifş bi xwe jî di pey de tê gotin. Ew, navê nifş dikî *pêrohnî.* Ev nifş jî, ji navê *bêmak* e.

*şûnbêje* du nifş in: **Xweser** û **Besteyê Dûvik**.

*Xwesr* jî du nifş in: a) **Berfireh,** b) **Berteng**.

**a)** *Berfireh* ev in: Ev berî navê *kes*, berî navê *nifş*, berî navê *pesin*, berî navê *demgîra yekxwedî* çi bihurî, çi derkêlî û çi nehatî tên, hem jî di *demgîra dusêxwedî* de yanî berî wê çi *derkêlî* bî û çi *nehatî* bî tê. Ew jî, evê han in:

- Ez (Xwebêjê tenha).
- Tu (Pêşdarê tenha).
- Ev (Bertilê tenha yê pêşdar).
- Ew (Bertilê winda yê tenha).
- Em (Gelxwebêjê zo û peyzo).
- Hûn (Pêşdarê zo û peyzo).
- Evana (Bertilê zo û peyzo yê pêşdar).
- Ewana (Bertilê zo û peyzo yê winsa).

Ev, heşt in. Her yek dûvikê wan heye. Dûvikê wan ên piştî *demgîra bihurî* yên her pênc nifşan ev in:

- Ez *bûm/ bûma/ bama/ ba/bim* (im).
- Tu *bû/ bûna/ bana/ ba/ bî* (ye).
- Ev *bû/ bûna/ bana/ ba/ bî* (ye).
- Ew *bû/ bûna/ bana/ ba/ bî* (ye).
- Em *bûn/ bûna/ bana/ ba/ bîn* (ne).
- Hûn *bûn/ bûna/ bana/ ba/ bîn* (ne).
- Evana *bûn/ bûna/ bana/ ba/ bîn* (ne).
- Ewana *bûn/ bûna/ bana/ ba/ bîn* (ne).

Dûvikê wan piştî *demgîra derkêlî*:

| | | | |
|---|---|---|---|
| - Ez | im | dirûniştim, dikirim. | |
| - Tu | î | dirûniştî, dikirî. | |
| - Ev | î | | |
| - Ew | î | | |
| - Em | | in | dirûniştin, dikirin. |
| - Hûn | | in | |
| - Evana | | in | |
| - Ewana | | in | |

Dûvikê wan piştî *demgîra nehatî*:

| | | |
|---|---|---|
| - Ez ê | im | bikirim, bikevim. |
| - Tu yê | î | bikirrî, bikevî. |

- Ev ê î
- Ewê î
- Em ê in bikirrin, bikevin.
- Hûn e in
- Evana wê in
- Ewana we in

Dûvikê wan piştî navê *kes*, yê *nifş* û piştî *pesin*:
- Ez im Restem şêr baş, im
- Tu î Restem şêr baş, î.
- Ev e Restem şêr baş, e.
- Ewe
- Em in Restem şêr baş, in.
- Hûn in
- Evana in
- Ewana in

**Pêgirtek:**

Em dikarin bêjine vê şûnbêjê, şûnbêja *kêmhiner*. Lewra çaxê ku tu bêjî: *Ez baş*, berî ku tu **im**-ê bênî, vîna wê negihaye serî û pev nehatiye bestin. Lê çaxê ku te got: *Ez baş im*, te **im**-ê anî, vîna peyvê giha serî û peyv hate bestkirin jî. Naxwe **şûnbêjên dûvbest** ên piştî **bihurîyê demgîr** ev in:
- Ez /im ime a ma ama m.
- Tu /wî î a na ana ye.
- Ev ew/wî î a na ana ye.
- Em hûn evana ewana n in
ina ne a ana.

şûnbêjên piştî **derkêlî** û **nehatî** yên **demgîr**ê:
- Ez im im.
- Tu î î.

- Ev î î.
- Ewî î.
- Em in in.
- Hûm in in.
- Evana in in.
- Ewana in in.

Çaxê **civînbêj** ne li dûv (pey) pirsê bî, **şûnbêj**ên piştî **nav** û **pesin** ev in:

- Ez im.
- Tu î.
- Ev e.
- Ewe.
- Em in.
- Hûn in.
- Evana in.
- Ewana in.

Heger **civînbêj** li dûv (pey) pirsê bî, hingê wê **şûnbêja dûrbest** bi **şûnbêja xweser** ve bê (were). Ew jî ev in:

- Ez im ê baş.
- Tu wî ê baş.
- Ev e ê baş.
- Ew e ê baş.
- Hûn in ên baş.
- Em in ên baş.
- Evana ne/nin ên baş.
- Ewana ne/nin ên baş.

Naxwe du dûvik di yek **civînbêj**ê de nayên, weke: *Lazim ê baş im*, çênabî.

**Pêgirtek:**

şeş **amîret** hene ku ji **demgîr**ê re dibin destik. Her yekê wan vîneke başqe dide. Çaxê yek ji wan bê destika **bi**-yê bî, nakevî ser. Ew jî ev in: Ji bo bilindî û hilêkişandinê:

**- Ra**, ji bo rastbûna li ser qadê: *Rada li ser qadê.*

**- Ra**, ji bo hildana bi jor de: *Rakişand bi jor de.*

**- Da**, ji bo nizmkirina bi jêr de: *Daketin, dahilandin.*

**- Rû**, ji bo pehinbûna ser qadê: *Rûkir, rûnişt.*

**- Ve**, ji bo birina bi paş de li ser qadê: *Vekişandin, veçirrandin.*

Çaxê ku **ve** bikevî ser bêjeya **dan**-ê, weke *vedan* dibî bi vîna *kolan*ê. Lewra axê ji koncalê bi paş de tênî, yan bi vîna ku vala dikî. Yanî axê jê derdixî û tê bi vîna raxistin, weke *dawa xwe li ber veda*. Yanî li berê dawa xwe vala hişt. Û bi vîna bergirtî jî tê, weke *min por ji ser dîmê* (dêmê) *xwe veda*. Yanî min (porê xwe-nm) da alîkî û dîm xuyakir. Weha reng e bêjemakê **kirin** ku **ve** pê ve bê, dîsa dibî bi vîna nebergirtî, weke *min vekirin*, yanî *du tiştên bi heve, min ji hev bi paş xistin*. Naxwe **ve** bi vîna paşxistin e.

Çaxê ku tu bêjî, *min çirrand*, yanî du tişt li ser dirjî ji hev qut bûn. Lê ku tu bêjî, *min veçirrand*, yanî *min bi gelek cihan ji hev qut kirin*. Weke tu bêjî, *min çirrçirrand*, yanî min gelek caran çirrand. Weha reng e çi bêjemakên hebin çi **karî** bin û çi **dengî** bin, çi yên dî bin ku tîpên hîmî du caran hatine gotin, tê zanîn ku gelek caran wilo bûye, weke *kişkişandin/ xirxirandin*... Heçî yên dengî ku du caran dibin nîşana **bêjemak**ê, nema pê ve tên. Çaxê dibî **demgîr** bi bêjemakê *kirin*-ê çêdibî û hew weke *zinge zing/ çinge çing,* naxwe tîpa **e**-yê dikeve navbera herdu perçeyan. Çaxê tu van bigerênî **demgîr**, tu yê bêjî: *Zingezing kir*, yanî *gelek caran zingîn kir*. Weha reng e çêdibî ku goşî bî: **Çingeçing**/ *çingeçing kirin*. **Teqeteq**/ *teqeteq kirin*.

Çaxê ku **bêjemak** *sêtîpî* bî, meriv dikarî **andin**-ê pê ve kî, weke: *Tiktikandin/ çikçikandin/ siksikandin/ niknikandin/ liklikandin/ rikrikandin*...

**Pêgirtek:**

Vêca me berê jî hinekî gotibû ku *bêjemak* an movik e, yanî *sêtîpe* weke *hildan/ gurandin/ mirin/ nalîn* an kit û movik e weke *avêjtin* an *ker* e yanî dutîp e weke *arandin/ alandin/ îçkirin* yanî şikeste ye weke *vekirin/ bakirin* an *goşî* ye weke *qurtandin*. Çaxê ku **şikeste** û **movik** bî, weke *bihîstin/ biraştin/ guvaştin/ pejilandin/ gemirrandin* an **dumovik** bî weke *gelviçandin/ kelpitandin/ hilweşandin/ hilgirtin/ kurkusandin*, hemî duker in. Lê binêre:

**- Bihîstin**- bahîstin: Xwedîdeng.

**- Biraştin**- behrijîtin: Qenc bû rijî.

**- Guvaştin**- guvweştin: Guva wî weşandin.

**- Pejilandin**- pejwelandin: Pejên wê belakirin.

**- Gemirandin**- guvmorandin: Guva wê kire virik.

**şûnbêjên şeştîpî:**

- Gelviçandin/ digel hev viçandin.
- Kelpitandin/ kalanê wê pût dibî.
- Hilweşandin/ hildidî û diweşênî.
- Hilgirtin/ hilda û girt.
- Kurkusandin/ kûr dikutî.

**şûnbêjên Berteng ên Paşbestî:**

*şûnbêjê Berteng ên Paşbestî* ew in ku di serê *demgîra bihurî û ya derkêlî* de çaxê ku duxwedî bî tên, hem piştî *xwepêgir*ê jî tên:

- Min kuşt/ ...ibû/ ...ibûna/ ...ibî/ ...iye.
- Te kuşt/ ...ibû/ ...ibûna/ ...ibî/ ...iye.
- Vî-vê kuşt/ ...ibû/ ...ibûna/ ...ibî/ ...iye.

- Wî-wê kuşt/ ...ibû/ ...ibûna/ ...ibî/ ...iye.
- Me kuşt/ ...ibû/ ...ibûna/ ...ibî/ ...iye.
- We kuşt/ ...ibû/ ...ibûna/ ...ibî/ ...iye.
- Vana kuşt/ ...ibû/ ...ibûna/ ...ibî/ ...iye.
- Wana kuşt/ ...ibû/ ...ibûna/ ...ibî/ ...iye.

Naxwe di *bihurî* de dûvikê tevan yek in û weke yên kit in, her wekî me got derkêlî: *Min, te, vî, vê, wî, wê, me, we, van, wan dixwar*. Çaxê **karpêder** *zo* û *peyzo* bin di bihurî de û dûvikê **demgîr**ê li gor **karpêderî** *peyzo*yê tên, weke: *Min, te, vî, vê, wî, wê, me, we, van, wan du-sê nan xwarin.* Vêca hemî dîsa dibin weke hev, yanî *bûn, bûna, bana, ba, bin, ne*/ *in* derkêlî.

**Pêgirtek:**

Du **şûnbêj**ên ji rengê hev, yanî her yek bi hev re di yek **civînbêj**ê de nayên. Demgîrê dusêxwedî bê, ev *şûnbêjên berfireh* çênabin weke tu bêjî:

- Ez ê ez bikujim.
- Em ê em bikujin.
- Tu ê tu bikujî.
- Hûn ê ez bikujin.
- Ev ê ev bikujî.
- Ewê ew bikujî.
- Evana ê evana bikujî.
- Ewana ê ewana bikujî.

Ev *şûnbêjên berteng* jî çênabin, weke tu bêjî:

- Min min kuşt.
- Me me kuşt.
- Te te kuşt.
- We we kuşt.
- Vî vî kuşt.
- Wî wî kuşt.
- Van van kuşt.

- Wan wan kuşt.

şûnbêja **xwe** piştî van *şûnbêjên berfireh* tê, yanî dibî **karpêder** û çêdibî weke tu bêjî:

- Ez ê **xwe** bikujim.
- Tu ê **xwe** bikujî.
- Ev ê **xwe** bikujî.
- Ew ê **xwe** bikujî.
- Em ê **xwe** bikujin.
- Hûn ê **xwe** bikujin.
- Evana w ê **xwe** bikujin.
- Ewana w ê **xwe** bikujin.

Ev *şûnbêjê berteng* e û çêdibî weke tu bêjî:

- Min xwe hişt.
- Me xwe hişt.
- Vî xwe hişt.
- Wî xwe hişt.
- Te xwe hişt.
- We xwe hişt.
- Van xwe hişt.
- Wan xwe hişt.

Naxwe tu car du şûnbêjên ji yek rengî di pey hev de nayên. Weha reng e du şûnbêjên ji yek nifşî jî di pey hev de nayên. Gerçî ne yekhijmar bin jî, çênabî weke tu bêjî: *Ez ê hûn bikujim/ tu yê em bikujî*.

Tu carî du şûnbêj ji *nifşê berfireh* di pey hev de nayên. Her wekî du şûnbêjên berteng jî di pey hev de nayên, weke tu bêjî: *Min/ vî/ wî/ van/ wan* kuşt.

Belê di hinek şêweyên kurmancî de wilo çêdibî û ji wilo pê ve jî nabêjin; yanî şûnbêjeke berfireh nayênin.

Naxwe di şêweyê Midyad, Kercos û Nisêbînê de ku demgîreke dusêxwedî bê, divê bi vî hawî bî: Tê pêşî şûnbêjeke berteng bênî û duvre şûnbêjeke berfireh bênî û bere (bila) di kiteyan de jî ne weke hev bin an vajî jî bin. Ev çênabin, lewra *nehatî* ye weke tu bêjî:

| **Berfireh** | **Pergar** | **Berteng-**duxwedî |
|---|---|---|
| - Ezê | te | bikujim. |
| - Tuyê | min | bihêlî. |

Ev çêdibî, lewra **nehatî** û **derkêlî** ye, weke tu bêjî.

| **Berteng** | **Berfireh** | **Bihurî-**derkêlî |
|---|---|---|
| - Min | tu | anî/dianî. |
| - Te | ev | kuştin/dikuştin. |

Weha reng e çaxê ku bibî balxwegir şûnbêjê berteng tê û çêdibî weke tu bêjî:

- Kurê min/ te/ me/ we/ vî/ wî/ van/ wan **hat/**wê bê.

Lê çênabî ku tu bêjî:

- Kurê ez/ tu/ em/ ev/ ew/ hûn **hat**/wê bê.

Erê *evana, ewana/ evan, ewan* çi **berteng** û çi **berfireh** çêdibin balxwegir.

**Paşgotinek**

**Zo** û **peyzo:**

Evên dusêxwedî di *demgîr*an de **in** e çi **bihurî** bî, çi **nehatî** bî û çi **derkêlî** bî weke tu bêjî:

- Wan/ we/ me/ van avêt**in**, diavêt**in**, wê biavêj**in**.
- Wan/ van/ me/ we xwend**in**, dixwend**in**, wê bixwên**in**.
- Wan/ van/ me/ we kir**in**, dikir**in**, wê bik**in**.

Ev jî **demgîr** in:

- Em/ hûn/ evana/ ewana hat**in**, dihat**in**, wê bih**ên**.

- Em/ hûn/ evana/ ewana rûniişt**in**, dirûnişt**in**, wê rûn**in**.

Heçîka **nav** in, çaxê ku bibin *karpêderê amîretî* dîsa ji bo **zo** û **peyzo**yê **an** tê, weke:

- Min li heval**an** nerî.
- Wî ji mal**an** pirsî.

Weha reng e û çaxê ku **zo** û **peyzo** bibî, *xwepêgir* dîsa **an** tê û çêdibî ku **a**, **ya**, **an** bibin **ê**, yanî dibin **ên**, weke:

- Hevalan**ê** me hatin
- Heval**ên** me hatin.

Naxwe **dûvik** di **demgîr**ê de jî tê, weke me got ku *hatin*. Her wekî dûvik di **ê**-ya dusêxwedî de jî tê, weke:

- Kurê me Pelok dixwendin.

Çaxê ku **zo** û **peyzo** ne ji van herdu hawan bin, bêweku *demgîra dusêxwedî* di pey wan de bê û **zo** û **peyzo** serpeyv bin dîsa bi wan ve **an** tê, weke:

**a)** Mêvan**an** xatir xwest/ karpêder, tenha ye.
**b)** Mêvan**an** zarok birin/ karpêder, peyzo ye.

Naxwe **an** di sê cihan de tê:
**a)** Min li heval**an** nerî/ karpêderê pergarî.
**b)** Xezûr**an**, xezûr**ên** me hatin/ xwepêgir.
**c)** Mêvan**an** xatir xwest/ serpeyv.
**d)** Mêvan**an** zarok xwestin/ karpêder, peyzo ye.

Çaxê ku *demgîra yekxwedî* di pey de bê, **in** di *peyzo*yê de nayê, tenê di paşiya *demgîr*ê de tê, weke:

- Zilam hat**in**/ ...rûnişt**in**/ ...mir**in**...

Naxwe çênabî ku tu bêjî:

- Zilaman hatin/ ...rûniştin/ ...mirin...

Eger **berpeyv** *nav* an *pesin* bî, dîsa di **peyzo**yê de **in** nayê, tenê (in) di paşiya *berpeyv*ê de tê, weke:

- Zilam, baş **in**.
- Zilam, ev **in**.
- Zilam, Restem **in** û şêr **in**.
- Evana/ ewana/ hûn mêr **in**.

**şûnbêjê Hîmê Bêkit ê Nenasmend**

Ew ev in:

**- Çi ku**: Ji bo her tiştî.
**- Ku**: Ji bo cih.
**- Kî**: Ji bo kes, *demgîra yekxwedî*.
**- Kê**: Ji bo kes, *demgîra dusêxwedî*.
**- Kîja/ kîjka/kîka**: Ji bo kesî: *her demgîr*.
**- Kengî/ kînga/ hinga**: Ji bo çax.

**şûnbêjên Ber çav û Dil:**

şûnbêj ev in:

*- Wa ye, va ye, wê ha ye, wê ha ne, wiha, wisa, wilo, welê, weha, wi, ew, we/ we, ev:*

**- Ha han**: Hawe.
**- Sa san**: Hawereng.
**- Lo lon**: Reng.
**- Lê lên**: Reng.
**- Kîja/ kînga/ hinga**. (ji bo çax).

**Rengbêje:**

Ev ew e ku **vîn** jê re heye, lê ne *nav* e û ne *demgîr* e; vîna wê tenha tê zanîn. Vêca ew jî du nifş in: 1) **Rengbêjê Kesaxêv**, 2) **Rengbêjê Jîndaraxêv**.

1) *Rengbêjê Kesaxêv* jî du nifş in: a) **Kesaxêvê Pêşgotin**, b) **Kesaxêvê Paşgotin.**

**a)** *Kesaxêvê Pêşgotin* ew e çaxê ku tê gotin, bêhtir berî peyvê tê gotin û piştî peyvê jî çêdibî çaxê ku berê bûbî, lê çaxê nûpeyda bî, peyv jê re navê û mirov dikare tenê wê bibêje. Em ê niha yên ku berê bûn bêjin.

Berê, weke van bû:

- *Fûfê*, yanî ev xwarin e.
- *Bivvê*, yanî ev agir e.
- *Yaq*, yanî ev pîsîtiya mirovan e.
- *Kix*, yanî ev bê mirês e.
- *Hewe*, yanî ev nema.
- *Ka ew*, yanî ew li kû ye.
- *Kanî ew*, yanî ew li kû ye.
- *Hema*, yanî ez natirsim.
- *Bere*, yanî ez divêm.
- *Wayahey*, yanî ez bang dikim te.

**Yên nûpeyda:**

- *Ala*, yanî raze (raketin).
- *Lorî*, yanî raze.
- *Lalê*, yanî raze.
- *Kanî*, yanî bide min.
- *Ko*, yanî bide min.
- *Hêdî*, yanî raweste.
- *Pixk*, yanî bitirse.
- *Xwezî*, yanî ez lave dikim.
- *Wişk*, yanî bikene.
- *Bes*, yanî min nema divê.
- *Hew*, yanî nema bike.
- *Çûçê*, yanî rûne.
- *Buhbuhokê*, yanî teba hate te.

**b)** *Kesaxêvê Paşgotin* ew e ku mirov bersiva hinekan didî û piştî gotinê tên. Ew jî du (2) ne. 1) **Berê Bû**, 2) **Nûhatî.**

**1)** *Berê bû*, weke van:
- *Hahê-hohayê*, yanî va ez li vir im.
- *Herê-erê*, yanî gotina te ye.
- *Bere bila bira*, yanî ez ê bi ya te kim.
- *A-e*, yanî ev wilo ye.
- *Lelê*, yanî bi ya te nakim.
- *Na-ne-no*, yanî ev ne wilo ye.
- *Lo-herê,* yanî ne li gor min e.
- *Ha-ha*, yanî deq bi deq wilo ye.
- *Lew-lewma*, yanî min ji ber vê (yekê) kir.
- *Hema*, yanî ji te natirsim.

**2)** *Nûhatî* (nûpeyda) weke van:
- *Hiş de hiş*, yanî vî tiştî nebêje.
- *De bes-bese*, yanî ne rast e, hew bike.
- *Ha*, yanî qey ev rast e.
- *Hema*, yanî min bêhode kir.
- *Herê-erê*, yanî ez ê bikim.

**Rengbêjê Xweaxêv:**

Ev ew e ku piştî gotinê tê. Tu karî bêjî û nebêjî. Vînek jê tê zanîn. Lê tu ji xwe re dipeyivî. Heye pêşdarê wî deng bikî yan nekî. Ew nabe hîmê gotinê û ne jî bersiv in. Lê tu weke ku bersiva dilê xwe didî der, berê jî çênebûne û hemî nûpeyda ne. Weke van:
- *Haha*, yanî qey ev rast e.
- *Hêhê*, yanî qerfê xwe dikim.
- *Hii*, yanî ez fêr bûm.
- *Hoho*, yanî çima ev wilo ye.
- *Hahey*, yanî tu ne rast î.

- *Hahû*, yanî te ez bêhit-teng kirim.
- *Haha*, yanî weke gotina te baş e.
- *Haha*, yanî weke gotina te ne baş e!
- *Heyha*, yanî girê dilê min çû.
- *Heyho*, yanî ez ji te gêj bûm.
- *Hahew*, yanî xwezî ne wilo ba.
- *Heylo*, yanî ev tişt wêran bû.
- *Heydê*, yanî ev tişt wêran bû.
- *Hek*, yanî ne li gor hev in.
- *Hîk*, yanî tu virran dikî.
- *Hihi*. yanî nêzîk e ku çêbibî.
- *Him*, yanî ez fêr bûm.
- *Hey*, yanî dilê min dişewite.
- *Herê-herê*, yanî dilê min dişewite.
- *Ûy*, yanî tiştek êşiya.
- *Oy*, yanî tiştek êşiya.
- *Ax*, yanî ez lave dikim.
- *Ax*, yanî ez êşiyam.
- *Ox*, yanî ez êşiyam.
- *Ox*, yanî kêfa min hat.
- *Ohman Ohmayî*, yanî weke dilê min çêbû.
- *Êç-êt-ix-iq-êq-yaq-yoq-yêq*, yanî dilê min jê digerrî.
- *Ya*, yanî qey rast wilo ye.
- *Lêlê-lolo*, yanî gelkî ne bi dilê min e.
- *Lîlî*, yanî kêfa min pir hat.
- *Wiş-çiv-tiş-piş*, yanî qerfan pê dikim.
- *Weh-wehew*, yanî çilo tu wilo dikî.
- *Wa*, yanî qey wilo rast e.
- *Wî*, yanî min nizanî ku wilo pîs e.
- *Wey*, yanî ez poşman bûm.
- *Wey*, yanî ne li gor hişê min e.
- *Piv*, yanî qerfê xwe dikim.
- *Pepek*, yanî min ev hêvî nedikir.

**Rengbêjê Jîndaraxêv:**

*Rengbêjê Jîndaraxêv* ew e ku mirov bi jîndarê ne mirov re diaxivî û ne pêşî, ne paşî ku gotin bi wan re nîne, mirov vînekê jê fêr dibî û mirov dixwaze ku bi jîndaran jî bide fêrkirin. Ev jî du nifş in:

a) **Navê Jîndarê Dusêcar**.

b) **Peyva Digel Jîndarê Yekcar**.

**a)** *Navê Jîndarê Dusêcar*.

Ev ew e ku tu navê jîndarekî du-sê caran ji bo tiştekî yan ji bo ku dilê te rind fêr bibî dibêjî, weke:

- *Tû-tû-tû*, yanî bere (bila) mirîşk bê.
- *Pis-pis-pis*, yanî bere pisîk bê.
- *Çî-çî-çî*, yanî bere çîçik bê.
- *Kit-kit-kit*, yanî bere pisîk herî.
- *Kûç-kûç-kûç*, yanî bere kûçik bê.
- *Kiş-kiş-kiş*, yanî bere mirîşk herî.

Hinek ji van ên yekcarî hene, weke:

- *Kit*, yanî bere pisîk herî.
- *Pist*, yanî bere pisîk herî.
- *Kûç*, yanî bere kûçik herî.

Hinek ji van ên ducarî hene, weke:

- *Çîçî,* yanî bere çîçik herî.
- *Haşhaş*, yanî bere bizin herî.
- *Hirehir*, yanî bere mih herî.
- *Kaçkê*, yanî bere bizin bê.

**b)** *Peyva Digel Jîndarê Yekcar*.

Weke tu bêjî:

- *Kiş*, Yanî bere mirîşk herî.
- *Çûçûçû*, yanî bere seh (kûçik) herî sehê dî.

- *Wiştho*, yanî bere seh herî tiştekî.
- *Dîdî*, yanî bere kûçik herî.
- *Weşt*, yanî bere kûçik herî.
- *Wirî*, yanî bere kûçik vegerî.
- *Hoş-hêş*, yanî bere ker rawestî.
- *Ço*, yanî bere ker herî.
- *Weş*, yanî bere ker vegerî.
- *Irho*, yanî bere dewar avê vexwî.
- *Irist*, yanî bere pez avê vexwî.
- *Qurho*, yanî bere pez avê vexwî.
- *Tiha-tiha*, yanî bere ga bê.
- *Oha*, yanî bere ga rawestî.
- *Haş*, yanî bere bizin vegerî.
- *Digdigdig*, yanî bere dîk li dîkê din bidî.
- *Tex*, yanî bere dewar vegerî.
- *Tes*, yanî bere hesp vegerî.

**Destikê Pergarê Pêşdest:**

*Destikê Pergarê Pêşdest* di serê *civînbêj*ê de tên û bi tenê jî nayêne gotin, lê nakevin ser *demgîr*ê, weke:

| | | | |
|---|---|---|---|
| **- Ji** | vir | hat | |
| **- Li** | wir | ket. | |
| **- Bi** | wî | re | hat. |
| **- Ji** | wir | ve | ... |
| **- Di** | wir | de | raza. |
| **- Bi** | wî | re | ... |
| **- Di** | wir | de | |

**Çengelê Pergarê Nîvbets:**

*Çengelê Pergalê Nîvbest* ew e ku di nîvê du navbêjan de tê, weke:

| | | |
|---|---|---|
| - *Kur* | **ê** | *min*. |
| - *Keç* | **a** | *min*. |

Va ye **ê** di herdu navbeynan de tê, wan bi heve çengel dikî û tenê nayê gotin; vîna nêr û mê jê tê zanîn. Yekê kiriye *xwepêgir* û ya dî kiriye *balxwegir.*

**Pergarê Paşbest:**

*Pergarê Paşbest* du nifş in. **Paşbestê Demgîrî** û **Paşbestê Navgîrî**. Ev ew e ku di paşiya **demgîr**ê de tê, tenê nayê gotin û vînek jê tê fêrkirin. Vêca **demgîra bihurî** di pey de tê, weke:

- Ez/ *im, ima, ama, a, im, im*/ yekxwebêj.
- Ti/ *iwî, a, ana, na, î, ye*/ paşderê tenha.
- Ew, ev/ *û, a, ana, na, î, ye*.
- Em, hûn, evana, ewana/ *in, a, ana, in, ine, in*.

**DÛVIK**

**Dûvikê Derkêlî:**

| | | | |
|---|---|---|---|
| - Ez | im, | im. | |
| - Ti | î, | **î**. | |
| - Ev-ew | | î, | **î**. |
| - Hûn- em- evana- ewana, | | | **in**. |

**Dûvikê Nehatî:**

| | | |
|---|---|---|
| - Ez | ê, | **im.** |
| - Tu- ev- ew | ê, | **î**. |
| - Hûn- em- evana- ewana | e, | **in**. |

**Dûvikê Berexwazê Pêşdar:**

| | |
|---|---|
| - Tu, | **e**. |
| - Hûn, | **in**. |

**Dûvikê Berexwazê Winda:**

| | |
|---|---|
| - Ez, | **im**. |

- Tu- ev- ew, **î**.
- Hûn- em- evana- ewana, **in**.

**Dûvikê Berpeyvî:**

Nav û pesin:

- Ez, **im.**
- Tu, **î**.
- Ev- ew, **e**.
- Em- hûn- evana- ewana, **in**.

**Dûvikê Pergarî:**

- Ji, ve.
- Di, de.
- Bi, re.

**Dûvikê Hemî Nifşî:**

Nav û hawegîr:

Ev ew in ku piştî **navê nifş**, piştî **bêjemak**ê, piştî **navê vînê** û **navê livînî** tên. Ev di paşiya tiştan de tên û bi vîna xwedîtişt digerênin. Weke:

*...kar, ...van, ...wan, ...end, ...de, ...mend, ...bend, ...wend, ...va, ...war, ...wer, ...wên, ...yar, ...awer, ...ar, ...êr, ...ing, ...eng, ...î, ...în, ...ane, ...ene, ...dar, ...ek, ...ok, ...man, ...kan:*

- Qencî + **kar**, qencîkar.
- Hiner + **van**, hinervan.
- Sî + **wan**, sîwan.
- Lew + **end**, lewend.
- Pesin + **de**, pesinde.
- Dewle + **mend**, dewlemend.
- Qer + **bend**, qerbend.
- Zêr + **wend**, zêrwend.
- Zehir + **va**, zehirva.

- Bende + **war**, bendewar.
- Ser + **wer**, serwer.
- Eser + **wên**, eserwên.
- Hiş + **yar**, hişyar.
- Ceng + **awer**, cengawer.
- Gul + **ar**, gular.
- Dil + **êr**, dilêr.
- Bêj + **ing**, bêjing.
- Leh + **eng**, leheng.
- Beng + **î**, bengî.
- Reng + **în**, rengîn.
- Mêr + **ane**, mêrane.
- Ceng + **ene**, cengene.
- Dikan + **dar,** dikandar.
- Ser + **ek**, serek.
- Ser + **ok**, serok.
- Girr + **man**, girrman.
- Ser + **kan**, serkan.

**Dûvikê Bêjemakê Sitewr ê Pesin**
**û**
**Dûvikê Navê Nifş:**

Dûvik ev in: *...Î, ...anî, ...îtî, ...atî, ...anî, ...înî:*
- Qenc + **î**= Pesin.
- Mêr + **anî**= navê nifş.
- Jin + **îtî**, jinîtî.
- Jin + **atî**, jinatî.
- Jin + **anî**, jinanî.
- Jin + **înî**, jinînî.

**Dûvikê Berhawe:**

Dûvik, ev in: *...ber, ...bar, ...bir, ...va, ...gir, ...hil:*

- Kar + **ber**, karber.
- Kar + **bar**, karbar.
- Kar + **bir**, karbir.
- Kar + **va**, karva.
- Kar + **gir**, kargir.
- Kar + **hil**, karhil.

**Dûvikê Pesnê Raser:**

Dûvik, ev e: *...tir:*

- Ez çê + **tir** im, çêtir im.
- Tu çê + **tir** î, çêtir î.
- Ev çê + tir e, çêtir e.
- Ew çê + **tir** e, çêtir e.
- Hûn çê + **tir** in, çêtir in.
- Em çê + **tir** in, çêtir in.
- Evana çê + **tir** in, çêtir in.
- Ewana çê + **tir** in, çêtir in.

## 06-PERGAR

Ev ew e ku tê dikevî ser *nav, demgîr* û *şûnbêj*ê. Vîna wê piştî hatina bêjeyên di pey de tê zanîn û vîn jê bi tenê nayê zanîn. Ev ne **demgîr** e, ne **nav** e û ne jî **şûnbêj** e. Vêca ev sê nifş in. a) **Serkombêj**, b) **Serdemgîr**, c) **Sernav**,

**a)** *Serkombêj*:

**Pergarê Serkombêj** ew e ku dikevî ser **nav** û **demgîr**ê. Naxwe divê tim **kombêj** di pey de bê, weke van:

- *Heke tu bê, wê ew jî bê*. Ev qewlendeyê dukombêj e.
- *Heke tu bixwênî, tê jîr bibî*. Ev qewlendeyê dukombêj e.
- *Hela tu bixwêne, bê çi dibî*. Ev dikevî ser berexwazê û nûpeyd e.
- *Qey tê herî malê?* Ev pirseka yekkombêj e.
- *Ku go, gi tu herî, ez ê jî herim*. Ev qewlendeyê dukombêj e.
- *Gelo tê herî*(?) Pirskera yekkombêj e.
- *Gidî here qelema xwe werêne*. Hêvîkera yekkombêj e.
- *Bere/ bira/ bila/ bixwênî, xwendibî*. Fermankerê yekkombêj e. Evana kevnê sernehatîyê rast û derkêlî ne.
- *Ma tê herî, tu wilo xurt î*(?) Pirsekê yekkombêj e. Ev **bûn** (verb) ji *serkombêjên yekker* e.

**Serkombêjên Duker:**

Ev ew in ku di pey wan de **kombêje** tê û heye ku carna li paşîyê bê, weke van:

- *Ku ca tu çûye*(?) Pirseka çaxmend e.
- *Ka ca ez binerim*. Destûrxwaz e.
- *Kusa ev kiriye*. Haydûrî ye.
- *Çire te lê xist*(?) Pirseka bomendî ye.
- *Çilo bêî min çû*(?) Pirseka haydûrî ye.
- *Çima te nexwend*(?) Pirseka seravde ye.
- *Hêjî tu neçûyî*(?) Pirseka Peyhevî ye.
- *Kengî ez çûme jorê*(?) Pirseka çaxmendî ye.

- *Çawa tu guh nadiyê*(!) Haydûrî ye.

Naxwe ev hemû, tenê kombêje piştî wan tê. Weha reng e:

- *Bo çi tu guh nadiyê*(?)

**Peykombêjê Yekker:**

*Peykombêjê Yekker* ew e ku di pey gotina hevalekî de tê, kombêjek tenê bi dûvde tê gotin û yekperçe ye, weke ku yek bêjî:

- *Çima tu neçiwî* (neçûyî)? Ez ê bêjim: *Hema ez ê herim*. Ev xwespar e.
- *Qaşo tu rêber î*! Kêmxuyabûn e.
- *Goya xwe dibênî mêr*! Kêmbawerî ye.
- *şalê me digo ku tu xurt î*. Kêmxuyabûn e.

**Peykêmbêjê Duker:**

*Peykêmbêjê Duker* ew e ku piştî gotina hevalan û dûkeran tê gotin. Ev heye ku sêker jî bê. Weke *yekî gotiye ku avê venexwe*, dibêje:

- *Naxwe ez ê çi vexum*(?) Ev bersivxwaz e.
- *Vêca ez ê li kû razin*(?) Ev bersivxwaz e.
- *Îdî/ ica ez ê herim, ez ê çi bikim*(!) Ev bersivdan û bersivxwazî ye.
- *Lo herê ez ê çilo pê re bipeyivim*(!) Ev jêsilbûn e.

Evên han jî dibine berpeyva ji bo serpeyveke nûgotî, weke ku tu bêjî:

- *Hege tu herî*. Ev hemîbûn e. Ev heger e yanî qewl e.
- *Qaşo tu mela ye*. Ev qaşo ye, yanî ev ne li gor te ye. Weha reng e yên dî jî wisan...

**b)** *Serdemgîr.*

**Pergarê Serdemgîrê Bêker** ew e ku tenha vîn jê nayê fêrkirin, tim bi serê **demgîr**ê ve tê. Bi demgîrê jî vîna wê di nabir (navber) û hîm de xuya dibin. Lewra ev beste ne. Weke:

- *Wê herî*. Yanî ji vir û pêde wê herî.
- *Dê/ yê/ ê bixwênî*. Yanî ji vir û pêde xwendin heye.
- *Bixwêne*. Yanî divê xwendin hebî.
- *Nexwêne*. Yanî divê xwendin nebî.
- *De here*. Yanî divê zû here.
- *Çi hatiye*(?) Yanî nizane çi tişt hatiye.
- *Za herre*. Yanî ez divim tu herî.
- *Sakû here*. Yanî ez divêm tu herî.
- *Rakeve*. Yanî xwe li qadê rast bike.
- *Dahilêne*. Yanî wî tiştî berde jêrê.
- *Rûnişe*. Yanî niştinê nizim çêbike.
- *Vekişêne*. Yanî wî tiştî ber bi xwe ve bibe.
- *Hilkişêne*. Yanî wî tiştî bi jorê ve bibe.

**c)** *Sernav*

**Pergarên Sernav û şûnbêj** ew e ku dikevî ser navekî yan **şûnbêj**ekê û vîna wê tenha nîne, vîna wê bi vîna yê pey wê re ye. Yên bi dûvik ev in:

- *Ji te re*. Bi dûvik e.
- *Ji wê ve*. Bi dûvik e.
- *Di wir de*. Bi dûvik e.
- *Bi te re*. Bi dûvik e.
- *Li vir*.
- *Bo te*/ tevî.
- *Bê te*.
- *Bi te*.
- *Ne tu*.
- *Çi tu*.
- *Gel te*.

Kombêj nakeve ser van her çarên dawî yên li jorê û ne jî dikeve ser pergara **ku**-yê ku di pey de tê. Ew kombêj dikevî şûnvegera bêjemakê û dibî balxwegir. Weke:

- *Bo ku tu bixwênî* (xwarin-nm). Yanî bo xwarina te.
- *Bê ku tu herî*. Yanî bê çûna te.
- *Bi ku tê herî*. Bi çûna te.
- *Ne ku tê herî*. Neçûna te.
- *Gel ku tu herî*. Tevî çûna te.
- T*evî ku tu herî*. Tevî çûna te.

**Pergarên Nîvgotin ên Nîvdunav:**

*Pergarên Nîvgotin ên Nîvdunav* ew in ku tenê vîna wan nîne, çaxê ku di *nîvnav*an de hat, vîna wê tê fêrkirin û nabî hîmê gotinê. Weke:

- Restem **û** Xusro. Tîpa **û**-yê têkevîn e.
- Ev **an** ev. Bêjeya **an**-ê duguman e.
- Restem **ta** Xusro. Bêjeya **ta**-yê dusînor e.
- Ji vir **heta** vir. Bêjeya **heta**-yê dusînor e.
- Restem **hela** Xusro. Bêjeya **hela**-yê şaşdirustî ye.

**Pergarên Nîvdukombêj û Yekker:**

Weke:

- *Min bazda, lew ez westiyam*. Bomendê ducar e.
- *Ew hat, lê ew nehat*. Veqetandin/ hemjiwan e.

**Pergarên Nîvdukombêj û Duker:**

Weke:

- *Ez çûbûm*, **ji lew** *tu hatî*.
- *Ez çûbûm*, **lewra** *tu hatî.*
- *Ez çûbûm*, **lewma** *tu hatî.*

Weha reng e *digel/ têkil/ hêjî/ hîna*...

**Rengbêja Nîvgotin:**

*Rengbêja Nîvgotin* ew e ku di nîvê du navan de tê, weke:

- *Restem,* **yanî** *bavê min e*. Ev danasîn e.
- *Restem,* **mîna** *te ye*. Ev dêhndarî ye.
- *Restem,* **weke** *te ye*. Ev dêhndarî ye.
- *Restem,* **temet** *me ye*.
- *Restem***ê** *te me*.
- *Zînê***ya** *me*.

Balxwegirtin, yanî *Restem, kesê me ye*. *Zînê, kesa me ye*.

Heger tu kombêjê li pêş an li paş bênî, divê ku tu pergara **ku**-yê piştî wan bênî. Weke:

- Restem hat, mîna **ku** tu hatî.
- Tê wî bikujî, yanî **ku** tê wî biêşînî.

Li vir dirust e û çêdibî ku bêjeya **ku-**yê neyê, weke:

- Restem mir, weke ez mirim.
- Restemê tê, şer dikî.

Herweha *Zîn, ya şewq jê diçî*. Di van tevan de bêjeya **ku**-yê ne qewlmend e û peyhatê wê dikevî *şûnvegera balxwegir,* an *pesin*.

**d)** *Dûvik*

Dîvik ew e ku tê de vîn nîne û tenê nayê gotin, bi paşiya **demgîr**ê, yan ya **nav**, yan ya **pesin** ve tê.

**Dûvikê Bihurî û Demgîra Yekxwedî:**

- Ez/ im, ima, ama, a, im, me.
- Ti/ iwî, ana, na, a, î, ye.
- Ev/ iwî, ana, na, a, î, ye.
- Ew/ iwî, ana, na, a, î, ye.
- Em/ hûn/ evana/ ewana/ win, ana, ina, ine, in. Ev derkêlî ye.
- Ez im/ im.

- Tu-hûn-evana-ewana/ in. Ev nehatî ye.
- Ez/ im.
- Tu-ev-ew/ î.
- Em-hûn-evana- ewana/ in. Ev bihurî û dusêxwedî ye.

**Dûvikê Berexwaz ê Pêşdar:**
- Ti/ e.
- Hûn/ in.

**Dûvikê Berexwazê Destûrî yê Winda û Xwebêjê Pêşdar:**
- Ez/ im.
- Ev-ew/ î.
- Hûn-evana-ewana/ in.

**Dûvikê Berpeyv ê Nav û Pesin:**
- Ez/ im.
- Tu/ î.
- Ev-ew/ e.
- Em-hûn-evana-ewana/ in.

**Dûvikê Pergarî:**
- Ji, de, re, ve/ re, de, ve.
- Di, de, re, ve/ ve, de, re.
- Bi, de, re, ve/ de, re, ve.

**Nîşana Nîvxweser:**

*Nîşana nîvxweser* ew e ku di paşiya **nav**, an **pesin**, an **pesnê peymak**, an **bêjemak**ê de tê. Vîna wê tenha nayê zanîn. Piştî ku bi yekê ji wan ve tê, vînekê didî xuyakirin û xwediyê xwe ji vîna berê diguhêzî bi aliyekî dî ve.

**Nîşana Nav:**

*Nîşana nav* dikevî pey navê **xuya** û yê **derhiş**, û wan digerênî **hawedar**.

**Hawedarên Navên Xuya yên Derhiş û Livînî:**

Ev jî ev in: *Van, wan, man, va, wên, mend, end, ende, wend, awer, wer, ar, êr, yar, ane, ene, ing, eng, î, în, dar, dêr, kan, de, ek, ok, eke, oke, ak, a, e.* Weke:

- Kar**van**.
- Kar**wan**.
- Qewhirr**man**.
- Zehir**va**.
- Kar**wên**,
- Dewle**mend**.
- şerm**end**/ şerm**ende**.
- Pê**wend**.
- Cеng**awer**/ Ceng**wer**.
- Zing**ar**.
- Dil**êr**.
- Hiş**yar**.
- Ceng**ane**.
- Ceng**ene**.
- Bêj**ing**.
- Leh**eng**.
- Beng**î**/ Beng**în**.
- Guh**dar**/ guh**dêr**.
- Ser**kan**.
- Jîn**de**.
- Ser**ek**/ ser**ok**.
- Ser**eke**.
- Ser**oke**.
- Ron**ak**.
- Zan**a**/ zan**e**.

- Xwer**e**/ Xwer**a**.

**Nîşanên Pesin û yên Bêjemakên Hîm:**

Ew ev in: *Î, îtî, atî, anî, înî, ayî, etî,  ik, ikî, akî*. Weke:

- Jin**î**/ jin**îtî**/ jin**atî**/ jin**anî**/ jin**înî**.
- şeng**î**/ şeng**îtî**/ şeng**atî**/ şeng**anî**/ şeng**înî**.
- Zan**atî**/ zan**etî.**
- Rohnî/ rohn**îtî**/ rohn**atî**/ rohn**ayî**/ rohn**ik**/ rohn**ikî**/ Rohn**akî**.

**Dûvikên Bavedanê piştî Nav û Hawedar:**

Ew ev in: *Î, îtî, înî, anî.* Weke:

- Gund**î**/ gund**îtî**/ gund**înî**/ gund**anî**- nav.
- Navdar**î**/ navdar**îtî**/ navdar**înî**/ navdar**anî**- hawedar.
- Reng**î**/ reng**îtî**/ reng**înî**/ reng**anî**- nav.

**Nîşanên Zo û Peyzo:**

*Nîşanên Zo û Peyzo*yê ev in:

- **An**: Peyzowa nexwepêgir.
- **Ên**-**An**: Peyzuowa xwepêgirtî. Weke:

. Zilam**an** kar dikirin/ nexwepêgir.

. Zilam**ên** me kar dikirin/ xwepêgir.

- **At**: Peyzo piştî tîpa Ziwa. Weke:

. Keleh**at.** Gelek keleh.

- **Hat**-**Wat**: Peyzowa paş tîpa nerm. Weke:

. Dêhat. Gelek gund.

Weha reng e: Koçer**at**/ zêrze**wat**/ axe**wat**...

**Nîşanên Biçûkiyê:**

*Nîşanên biçûkiyê* ev in: *Ûk, ik, ok, kok, îl, îlik, îlok, île, ûle, elek, elok*. Weke:

- Biç**ûk**.
- Piç**ik**.
- Gil**ok**.
- Qul**kok**.

- Gul**îl**.
- Kul**îlik**.
- Kuj**île**.
- Kuj**ûle**.
- Sêw**elek**.
- Sîp**elok**.

**Nîşanên Hindikî:**

*Nîşanên Hindiki*yî dikevine ser pesin bi vîna hindikbûna wî pesnî. Nîşan ev in: **Ek** û **ik.** Weke:

- şil**ek**/ şil**ik**. Yanî hindik şil e.
- Diz**ek**/ diz**ik**. Yanî hindik diz e.

**Dûvikê Pêwest:**

Dûvik ev in: **ik, ek**. Weke:

- Qet**ik**.
- Zend**ik.**
- Paç**ik**. Ya zendê.
- *Kutlik*. Ev ne ji bo biçûkî ye.
- Kul**ek**. Kul-qul.
- Êl**ek**.

**Nîşanên Yekbûnê:**

Ev in: **ik, ek**. Weke:

- Sal**ek**/ sal**ik**. Yek sal.

**Nîşanên Pirbûnê:**

Nîşan ev in: **O-o***,* **e-î.** Weke:

- şil**o**-vil**o**. Gelekî şil-virrik.
- Qul**o**-qul**o**/ kel**o**-kel**o**/ xil**o**-pil**o**.
- Çal**e-**val**î**. Xwar û dûrê hev.

**Nîşanên Nêr û Mê:**

Nîşana nêr, **O** ye. Weke:

- Kur**o**/ zilam**o**/ Restem**o**/ heval**o**/ xweşik**o**/ sivik**o**/ qeşmer**o**/ mêr**o** û gwd.

Nîşana mê, **Ê** ye. Weke:

- Keç**ê**/ pîrek**ê**/ Zîn**ê**/ heval**ê**/ xweşik**ê**/ sivik**ê**/ qeşmer**ê**/ jin**ê** û gwd (*Qeşmerê* û *jinê*, herdu çaxê bangê ne).

Nîşana nêr û mê gava piştî nêr û mê tên û ku dibin xwepêgirtî, ev in: **Ê**, ji bo nêran e, weke: Kur**ê** min. **A**, ji bo mêyan e, weke: Keç**a** min.

**Nîşanên Nerindî û Nepaqijî:**

*Nîşanên Nerindî û Nepaqijî*yê ev in: **Oq, oqî, ikî, iqî, ok, okî, oyî.** Weke:

- Zer**oq**.
- Bel**oq**.
- Virç**oqî**. Bo bêmirêsî.
- şal**oqî**.
- Virç**ikî**.
- Pirç**iqî**.
- Çilm**ok.**
- Çilm**okî.**
- Dem**okî**.
- Çilm**oyî.**
- Hilm**oyî**.

**Nîşanên Pirbûn û Kêmiyê:**

*Nîşanên Pirbûn û Kêmiyê* ev in: **Ok, okî, yokî, oyî, koyî.** Weke:

- Bêhin**ok**. Gelekî bi bêhn e.
- Bêhn**okî**. Bêhnê pir dikî.
- Fedfêht**okî**. Pir fihêt e.
- Fedi**yokî**.
- Feht**oyî**.

- Fedî**koyî**.

**Nîşanên Pesnê Raser:**

*Nîşanên Pesnê Rase* ev in: **Tir** di paşî de tê û **ê** di nêvî de tê. Weke:

- Sor**tir**. Ev, li paş e.
- şêr**ê** sor. Ev, di nêvî de ye.

Dûvikê vê jî, **serpeyvî** ye. Weke:

- Ez sor**tir im**.
- Tu sor**tir î**.
- Ev/ ew sor**tir e**.
- Em/ hûn/ evana/ ewana sor**tir in**.

**Nîşanên Bêguman:**

*Nîşanên Bêguman* **Ê**-**A** ne û di nêvî de tên. Weke:

- Kevir**ê** kevir. Yanî kevirê rastî.

**Ê** û **A**, dîsa di nêvî de dibin nîşana xwepêgir, weke:

- Kur**ê** kurî. Nêr.
- Keç**a** keçê. Mê.

Dûvikê balxwegir **Î**, di paşiya nêr de û **Ê** jî di paşiya mê de tê.

Karê Pergarê: Çaxê **Ê**, **A** û **ÊN** di nîvê bêjeyan de, di navbera du navbêjeyan de ku dûvik bi **Ê di** pey de neyê, tên. Weke:

- Kur**ê** kur. Yanî kurê wî bi xwe ye.
- Keç**a** keç. Yanî keça wî bi xwe ye. Ev, mêya tenha ye.
- Kur**ên** kur in/ keç**ên** keç in. Ev herdu **peyzo** ne û dûvikên **in**-ê di pey de tên.

Heger dûvikên **Ê, A** û **ÊN-**ê di navbera du navan de **Î, Ê** û **AN** bên, dibine xwepêgirtin. Weke:

- Kur, **ê** kur**î**. Nêr û tenha.
- Keç, **a** keç**ê**. Mê û tenha.

- Kur, **ên** kur**an**/ keç, **ên** keç**an**. Ev nêr û mê, peyzo ne.

Heger **Ê, A** û **ÊN** di navbera du pesnan de, di **tenha**yê de bê dûvik û di **peyzo**yê de **AN** bên, dibin *pesnê raser.* Weke:

- Baş**ê** baş. Herdu nêr.
- Baş**a** baş. Herdu mê.
- Baş**ên** baş**an**. Nêr û mê, peyzo.

Heger tu dûvikê **An**-ê di **tenha**yê de bênî, **raser** û **xwepêgir** çêdibin. Weke:

- Baş, **ê** başan/ baş, **a** başan. Tenha.
- Baş, **ên** başan. Peyzo.

Ev dibin **pesnê raser**. Yanî *ji başan baştir e* û dibin **xwepêgir**. Yanî, *başek ji nav başan e*.

Ev **Ê, A** û **ÊN**-ên ku di navbera nav û pesnekî de ne, dibin pesnekî din. Weke:

- Baş**ê** baş/ baş**a** baş. Nêr û mê, tenha.
- Baş**ên** baş. Nêr û mê, peyzo.

Heger ev nifş bibe *xwepêgir*, dîsa **Ê, A** û **ÊN** tên. Piştre li gor navê paşî ji nêr û mê yeke dî jî **(ê, a, ên)** tê. Divê ku **Ê**-ya pêşî nav bî û **Ê**-ya paşî pesin bî. Weke:

- Kur**ê** **yê** baş. Ev herdu nêr in. Yanî bav baş e.
- Kur**ê** y**a** baş. Pêşî nêr e, paşî mê ye.
- Keç**a** y**ê** baş. Pêşî mê ye, paşî nêr e.
- Kur**ên** **ên** baş/ keç**ên** **ên** baş. Peyzo.

Çaxê *serpeyv* bibe *nav* û *kombêj* û ku piştî wê bê, divê pergara **ku**-yê jî piştî wê bê. Hingê hersê ji bo **serpeyv**ê dibin pêrohnî û **ku** tevlî *kombêj*ê jî ji bo *serpeyv*ê dibin *pesinde*. Weke:

- Kurê **ku** dixwênî, baş e.
- Keça **ku** dixwênî, baş e.
- Keçên/ kurên **ku** dixwênin, baş in.

Gava *pesin* di serî de bê û *kombêj* piştî hersêkan bê, divê şûnbêjeyeke berfireh piştî pesin bê. Ew şûnbêj dibî **peyva nîvrê**, ew kombêj ji bo **berpeyva şûnbêjê** dibî pesin û pê dibî **hemîdar**. Weke:

- Baş ew e ê ku bixwênî.
- Baş ew e ya ku bixwênî.
- Baş ew in yên ku bixwênin.

Bêjeyên **baş** serpeyv in, bêjeyên **ew e - ew in** berpeyv in. Heçîka **ê** û **yên** in, pergarên pesinvan in. Bêjeya **ku**-yê, pergara pêşvegerê ye. Bêjeyên **bixwênî-bixwênin**, pesindan in. Pesinva û pesinva, li ser hev ji bo şûnbêjê dibin pesinda. Weha reng e eger nav jî di serî de bê wilo ye, weke:

- Kur ew e ku bixwênî.
- Keç ew e ku bixwênî.
- Kur/ keç ew in ku bixwênin.

Di van herdu nifşan de çêdibî ku tu şûnbêjeyê bênî serî, nav û pesin bikî berpeyv. Weke:

- Ew kur e, ê ku bixwênî.
- Ew keç e, ya ku bixwênî.
- Ew kur in/ ew keç in, ên ku bixwênin.

Di vî nifşî de tu dikarî **ê, a, ên**-ê nebêjî. Weke:

- Ew kur e/ ew keç e ku bixwênî.
- Ew kur in/ ew keç in ku bixwênin.

Hem di vî nifşî de tu karî **ê, a, ên**-ê bênî serî. Weke:

- **Ê** baş ew e ku bixwênî.
- **A** baş ew e ku bixwênî.
- **Ên** baş ew in ku bixwênin.

## KARÊ PERGARAN

*Karê Pergaran (ji, bi. di, li) ev in:*

**Ji** bêdûvik e, ji bo *jêder*ê ye û bêwestîn e. Weke:

- **Ji** wir hat.
- **Ji** te merivî.

**Ji**-ya digel dûvikê **re**-yê, ji bo berdestiyê ye. Weke:

- **Ji** te **re** ye. Yanî li ber destên te ye.

Hem **ji**, ji bo **kedmendî**yê ye. Weke:

- **Ji** te **re** hat. Yanî ev tişt ji keda te çêbûye.

**Ji**-ya digel dûvikê **ve**-yê. Ev, ji bo xuyarexê ye. Weke:

- **Ji** vir **ve** hat/ **ji** wir **ve** hat. Aliyê hatina wî/wê, xuya ye.

**Ji**-ya digel dûvikê **de**-yê. Ev, ji bo xuyaşopê ye. Weke:

- **Ji** vir **de** hat/ **ji** wir **de** hat. Yanî şopa hatinê bi xwe dibêjî.

**Bi**, bi vîna *hode* û bê dûvik tê. Weke:

- **Bi** te hat/ **bi** te çû/ **bi** te xwar. Yanî bi *hode*ya te hat, çû û xwar.

**Bi** bi vîna yektîyê tê. Weke:

- Nan **bi** avê xwar. Yanî herdu kirin yek.

**Bi**-ya digel dûvikê **re**-yê. Ev, bi vîna hevaltiyê tê. Weke:

- **Bi** wî **re** hat/ **bi** te **re** xwar. Yanî bi te re, bi wî re bû heval.

**Bi**-ya digel dûvikê **ve**-yê. Ev, ji bo hewarê tê. Weke:

- **Bi** te **ve** hat/ **bi** wî **ve** çû. Yanî ji bo alîkariya te/wî hat û çû.

Heger **bi** digel **bû** yan **kir**-ê bê, dibî vîna zeliqîna pê ve. Weke:

- **Bi** te ve **bû**/ **bi** te ve **kir**. Yanî bi te ve leyîsand.

Weha reng e ev digel hemî demgîran jî weke ***bi** te ve hat*, yanî ***bi** te ve zeliqî bû* û ***bi** te re hat* çêdibî.

**Bi**-ya digel dûvikê **de**-yê. Ev, bi vîna windabûna tê de tê. Weke:

- **Bi** wir **de** hat/ **bi** te **de** çû. Yanî *di wir de winda bû/ di te de winda bû*.

**Di**-ya digel dûvikê **de**-yê. Ev bi vîna rawestin û windabûnê tê. Weke:

- **Di** wir **de** rûnişt/ **di** wir **de** xwar.

Heger tu bêjî, *di wir de hat*, yanî di hindurê *lezok*ê de hat.

**Di**-ya digel dûvikê **re** û **ve**-yê.

Ev dûvik bi vîna xuyabûna şopekê tên. Weke:

- **Di** wir **re** hat/ **di** wir **ve** hat. Yanî şopa hatinê tê naskirin.

***Li*-ya bêdûvik, bi heft haweyan tê.**

Ev **li**, bi vîna westînê tê. Weke:

1- **Li** wir rûnişt/ **li** wir xwar.

Hem **li** bi vîna gorhevî tê. Weke:

2- Ev **li** te tê. Yanî li gor te ye.

Hem **li** bi vîna gihanê tê. Weke:

3- **Li** te ket. Yanî giha te.

Hem **li** bi vîna jorbûnê tê. Weke:

4- **Li** wir danî. Yanî li ser wir danî.

Hem **li** ji bo hemberî tê. Weke:

5- Berê min **li** te ye. Yanî hemberê te me.

Hem **li** ji bo sipartinê tê. Weke:

6- Ev **li** min e. Yanî ev siparê min e.

Hem **li** ji bo vîna duristî tê. Weke:

7- Ev **lê** ye/ ev ne **lê** ye. Yanî ev durist e/ ev ne durist e.

Çaxê ev her çar rengên han ku **ji, bi. di, li** ne, bikevin ser şûnbêja tenha û winda, nema şûnbêj tê gotin. Di şûna wê de pergara **ê** tê gotin. Çaxê pergara **ê** bê, **bi** dibî **pê**. Weke:

- Ev **bi** wî ye: Ev *pê* ye.

Çaxê pergara **ê** bê, **di** dibî **tê**. Weke:

- Ev **di** wir de ye: Ev *tê* de ye.

Çaxê pergara **ê** bê, **ji** dibî **jê**. Weke:

- Ev **ji** wî ye: Ev *jê* ye.

Çaxê pergara **ê** bê, **li** dibî **lê**. Weke:

- Ev **li** wî ye: Ev *lê* ye.

**Kombêje:**

Me berê gitiye ku *nav, demgîr, rengbêje, pergar û dûvik* hene. Vêca em ê wan bi heve girêbidin ku bibin peyv, da mirov ji wan fêm bikin*.

**Fêrpeyve:**

Ev ew e ku bê gotin, ne bêjeyeke tenha ye, lê dubêje ye û bêhtir in. Ew bêje divê ku bi heve bêne girêdan. Girêdan jî bi van çêdibe: **Destik, pergar, çengel** û **dûvik**. Heger ne wisan be, ji bêjeyan nayê fêmkirin. Lê divê ku her du bêje li hev bikin û ne dijê hev bin. Ev hawe jî didu ne: a) **Hawegîr**, b)

**Demhawe:**

*Hawegîr*, ji du bêjeyan çêdibî. Bêjeya pêşî *serpeyv* e, bêjeya paşî *paşpeyv* e. Yanî di paşiya peyvê de tê.

**Serpeyv**

*Serpeyva Yekker*, du nifş in. 1- **Navê kes** û **tişt**/ *navê nifş*. 2- **Berpeyva yekker**. Ev *Berpeyva Yekker* jî, sê nifş in: **Pesin, Hawegîr** û **Demhawe**.

Vêca ev herdu bi çi hawî bên, çi weke van herdukên ku me gotin û çi evên ku em ê bêjin, ji wan re dibêjim **hîm**. Yanî fêrpeyv bê van herdukan çênabî. Piştre em ê hinek tiştan bêjin ku ew **dês** in, yanî dîwar in. Hinek tiştên dî jî hene, ew **qaç** in û hinek dî jî hene ku ew **sitûn** in. Vêca divê ku **serpeyv** û **berpeyv** di van tiştên li jêrê de li gorî hev bin:

* Li vir di fotokopiya destnivîs de nimra rûpelê 10`an nebûn. Gelo Melê nivîskar bi şaşî wilo reqem dane rûpelan, an ew rûpel wenda bûye!?

**-** Tenha zo û peyzo, di nîşanan de.
**-** Nêr û mê, di pergaran de.
**-** Hevgirtin, di vînê de.

**Serpeyv/ Berpeyv/ Yekker:**

*Serpeyv*: Navê Kes.
*Berpeyv*: Pesin.
Weke:

- *Restem baş e*.

Bêjeya *Restem* serpeyv e, kes e, nêr e û tenha ye.
Bêjeya *baş* e berpeyv e, pesn e, nêr e û tenha ye.
Weke:

- *Restem baş in*.

Bêjeya *Restem* serpeyv e, kes e, nêr e û ne tenha ye.
Bêjeya *baş in* berpeyv e, pesn e, nêr e û ne tenha ye.
Weke:

- *Zînê baş e*.

Bêjeya *Zîn*ê serpeyv e, kes e, mê ye û tenha ye.
Bêjeya *baş* e berpeyv e, pesn e, mê ye û tenha ye.
Weke:

- *Zînê baş in*.

Bêjeya *Zîn*ê serpeyv e, kes e, mê ye û ne tenha ye. Bêjeya *baş in* berpeyv e, pesn e, mê ye û ne tenha ye.

Ev **babûnî** ye, lê ku **ne** berî berpeyvê bê, dibe **bêbûnî**. Weke:

- Restem **ne** baş e.
- Zînê **ne** baş e.
- Restem û Zînê **ne** baş in.

**Yekker**

Herdu Yekker:

*Serpeyv*: Navê Tişt.

*Berpeyv*: Pesin.

Weke:

- Hirço har e/ Hirço har in.
- Rindê har e/ Rindê har in.

Di vir de Hirço navê gayekî ye û Rindê jî navê çêlekekê ye.

**Tu bizan!**

Çaxê ku navê *kes* û *tişt* ne *tenha* bin, *vîn* ew e ku çi bi yekî (mirov) yan tiştê ku bi wî navî bin be.

Weke:

- *Resten û Zîn baş in*. Yanî çi mêr û jinên ku navên wan Restem û Zîn bin, ew tev baş in. Hem wilo ye:
- *Hirço û Rindê baş in*. Yanî çi ga û çêlekên ku navên wan Hirço û Rindê bin, ew tev baş in.

Ev hawe *serpeyv,* navê *nifş:*

- *Bar giran e/ bar giran in.*
- *Dar geş e/ dar geş in.*

*Serpeyv:* Navê kes, tişt û nifş.

*Berpeyv:* Hawegîr.

Weke:

- *Restem/ Zînê serdar e*. Kes, nêr û mê, tenha.
- *Restem/ Zînê serdar in*. Kes, nêr û mê, ne tenha.
- *Hirço parêzvan e/ Rindê parêzvan e*. Tenha.

- *Hirço û Rindê parêzvan in*. Ne tenha, navê tişt, nêr û mê.
- *Zilam dewlemend e/ jinik dewlemend e*.
- *Zilam dewlemend in/ jinik dewlemend in*.

Navê nifş, nêr û mê:
*Serpeyv:* Bi pergar.
*Berpeyv:* Bê pergar û yekker.

Di vî hawî de serpeyv pesin jî çêdibî. Weke:
- *Ê baş, baş e/ ya baş, baş e*. Nêr û mê, tenha.
- *Ên baş, baş in*. Nêr û mê, tenha.
Navê vî nifşî, *dupesnî* ye. Bi vî hawî *berpeyv* çêdibî.

Navê kes, tişt û nifş. Weke:
- *Ê baş Restem e/ ya baş Zîn e*. Tenha.
- *Ên baş Restem, Zînê ne.* Netenha
- *Ên baş zilam in/ ên baş pîrek in*. Navê nifş.

Ev hawe çêdibî berpeyvê hawegîr. Weke:
- *Ê baş Serdar e.*
- *Ya baş Serdar e.*
- *Ên baş Serdar in*.
*Serpeyv:* Hawegîr.
*Berpeyv:* Pesin û hersê nav.
Weke:
- *Serdar baş e/ baş in.*
- *Serdar zilam e/ zilam in.*
- *Serdar Restem e/ Restem in.*
- *Serdar Zînê ye/ Zînê ne*.
*Serpeyv:* Hawedar û pergar.
*Berpeyv:* Pesin û hersê nav.
Weke:
- *Ê Serdar Restem e/ Serdar Zîn e.*

- *Ên Serdar Restem in/ Zîn in*. Netenha.
- *Ê Serdar Hirço ye/ Rindê ye*. Tenha.
- *Ên Serdar Hiço ne/ Rindê ne*. Netenha.
- *Ê Serdar zilam e/ jinik e*. Tenha.
- *Ên Serdar Zilam in/ jinik in*. Netenha.
- *Ê Serdar baş e/ ya Serdar baş e*.
- *Ên Serdar baş in.*

*Serpeyv:* Hawegîrê Pergarî.

*Berpeyv:* Pesnê Pergarî.

Weke:
- *Ê Serdar, ê baş e/ ya Serdar, ya baş e*.
- *Ên Serdar, ên baş in.*

Bi vî hawî berpeyv hersê çênabin. Bi vî hawî mirov dikare *berpeyvê pesin* bibe şûna *serpeyvê hawegîr*. Weke:
- *Ê baş, ê Serdar e/ ya baş, ya Serdar e.*
- *Ên baş, ên Serdar in*. Netenha.

Çêdibî ku mirov van tevan bikî *fêrpeyvê nebûnî*, an alîkî tenê bikî *bêbûnî*. Çaxê serpeyv û berpeyv herdu ji yek navî bin, çênabî. Weke:
- *Restem, Restem e.*
- *Hirço, Hirço ye.*
- *Zilam, zilam in*.

Çaxê bi vîna bêguhertin, yanî her li ser navê xwe û zilamiya xwe bî çêdibî.

Lê çaxê herdu her yekê ji navekî dî bin, çêdibî. Weke:
- *Restem zilam e/ Zînê jin e.*
- *Restem û Zînê zilam in*.

Weha ye çaxê ku mirov vê vajî bikî, dibe fêrpeyvê pêş û paş. Weke:
- *Zilam Restem e/ jin Zînê ye*.

Ev, fêrpeyvê pêş û paş e.

**Serpeyv û Berpeyvê şûnbêje:**

*şûnbêj:* Berfireh û pesin.

*Serpeyv:* şûnbêj/ berpeyv, hersê nav. Weke:

- *Ez Restem im/ Zîn im/ Hirço me/ Rindê me/ zilam im.*
- *Tu Restem î/ Zîn î/ Hirço yî/ Rindê yî/ zilam î.*
- *Ev-ew Restem e/ Zîn e/ Hirço ye/ Rindê ye/ zilam e.*
- *Evana-ewana Restem in/ Zîn in/ Hirço ne/ Rindê ne/ zilam in.*
- *Ez baş im/ tu baş î/ ev-ew baş e/ evana-ewana baş in*.

*Serpeyv:* Pesnê pergarî.

*Berpeyv:* şûnbêj.

Weke:

- *Ê baş ez im/ tu wî/ ew e/ em in/ hûn in/ ev in/ ew in*.

Heger çaxê pesin bê pergar bibî serpeyv, çêdibî, lê dibî fêrpeyvê pêş û paş. Weke:

- *Baş ez im/ tu wî/ ew e/ em in/ hûn in/ ev in/ ew in*.

Weha reng e hersê nav serpeyv û şûnbêje jî berpeyv, lê dibî fêrpeyvê pêş û paş, weke:

- *Restem û Zînê, ez im/ tu wî/ ev e/ ew e/ em in/ hûn in/ ev in/ ew in/ evana ne/ ewana ne*.
- *şêr ez im/ tu wî/ ev e/ ew e/ em in/ hûn in/ ev in/ ew in/ evana ne/ ewana ne*.

**Serpeyv û Berpeyvê Duker:**

Serpeyv ku nav bî yan şûnbêja fireh bî û pergara xwepêgitinê di pey de bê, çêdibî ku berpeyv jî çi nav bî û çi şûnbêja berteng bî. Weke:

- *Restem, ê Xusro ye/ Zînê, ya Xusro ye.*

- *Restem, ê Zînê ye/ Zînê, ya Restem e.*
- *Restem, ên Zînê ne/ Zîn, ên Restem in*.

Di vir de serpeyv duker e. Çiku **ê**-ya di vir de, di şûna kur û keç de ye. Yanî di şûna nav de ye. Weke:
- *Ez, ê Restem im/ ez, ê Zînê me.*
- *Tu, ê Restem î/ tu, ê Zînê ye.*
- *Ev-ew, ê Restem e/ ..., ê Zînê ye.*
- *Em-hûn-evana-ewana, ên Restem in*.

Di vir de serpeyv duker e, berpeyv yekker e û nav e. Weke:
- *Ez, ê xwe me/ ez, ê te me.*
- *Tu, ê min î/ tu, ê xwe ye.*
- *Ev-ew, ê xwe ye/ ...., ê xwe ye.*
- *Em-hûn-evana-ewana, ên xwe ne*.

Ev serpeyv şûnbêja fireh e, duker e û berpeyv şûnbêja berteng e. Weke:
- *Ez, ê te me/ ez, ya te me.*
- *Tu,* (y)*ê min î/ tu ya min î.*
- *Ev-ew, ê te ye/ ev-ew, ya min e.*
- *Em-hûn-evana-ewana, ên vî ne*.

Serpeyv şûnbêja berfireh e û pergarê rengnav pê re ye. Berpeyv şûnbêja berteng e û pergarê rengnav berî wê tê. Weke:

- *Ez, ê ya te me.* Yanî, *ez kurê keça te me*.

Di vir de çênabî ku du rengnav yek bin. Weke:

- *Ez, ê ê te me.*

Di vî hawê li jorê de, divê ku yek ji herdu **ê**-yan bibî navekî heşkerî. Weke:
- *Ez, ê kurê te me.*

- *Ez, kurê ê te me:* Ez, kurê hevalê te me.
- *Ez, ya kurê te me.*
- *Ez, keça ya te me:* Ez, keça hevala te me.

Serpeyv, şûnbêja berteng û pergarê rengnav ku berî wê tê, berpeyv pesin û hersê nav e. Weke:
- *Ê min, Restem e/ Hirço ye/ dar e-* nêr.
- *Ya min, Zîn e/ Rindê ye/ zerik e-* mê.
- *Ên we/ me/ vana/ wana Restem in/ hirço ne/ dar in-* netenha.
- *Ên we/ me/ vana/ wana Zîn in/ Rindê ne/ zerik in-* netenha.

Vajiya wê jî eva han e:
- *Restem/ Hirço/ dar ê min e/ ên min in*.
- *Zîn/ Rindê/ zerik ya min e/ ên min in*.

Herdu şûnbêjên berteng û herdu pergarên rengnav. Weke:
- *Ê min, ê min e.*
- *Ya min, ya min e.*
- *Ên min, ên min in*.

Herdu şûnbêjên berfireh, bêpergar û bêkêmî. Weke:
- *Ez, ez im/ tu, tuwî/ ev, ev e/ ew, ew e/ em, em in/ hûn, hûn in/ evana, evana ne/ ewana, ewana ne*.

Ev hawe digel pergarê çênabî. Weke:
- *Ê ez, êz im/ ê tu, ê tiwe/ ê hûn, ê hûn in*.

Hem ev hawe jî çênabî. Weke:
- *Ê ez, ez e/ ez, êz e*.

Herdu şûnbêjên berteng û bêpergar çi alîkî û çi jî du alî di van sê mînakan de çênabî. Weke:

- *Min, min e/ te, te ye/ we, we ye.*
- *Ê min, min e/ ê te, te ye/ ê we, we ye.*
- *Min, ê min e/ te, ê te ye/ we, ê we ye*.

Naxwe şûnbêja berteng divê pergar di herdukan de bê ta ku bibin serpeyv û berpeyv. Weke:

- *Ê min, ê min e/ ên we, ên we ne*.

Herdu ji hersê navan û rengnav li pêş. Weke:
- *Ê Restem, Xusro ye/ ya Zînê, Zîvê ye.*
- *Ya Restem, Zînê ye/ ê Zînê, Xusro ye.*
- *Ên Resteman, Zîn in/ ên Zînan Xusro ne*.

Herdu hersê nav pergar, piştî yê pêş. Weke:
- *Restem, ê Xusro ye/ Zîn, ya Xusro ye.*
- *Zilam, ên Xusro ne/ jin, ên mêrn in*.

Herdu hersê nav û pergar li pêş û nêvî. Weke:
- Ê Restem ê Xusro ye/ ya Zînê ya Zînê ye.
- Ên Restem ên Restem in/ ên Zînê ên Zînê ne.
- Ên Resteman ên Resteman in.
- Ên Zînan ên Zînan in.

Herdu duker, dunav û balxwegir. Weke:
- Kurê Restem, kurê Xusro ye.
- Kurê Restem, kurê Restem e.

Serpeyv, dunav, duker. Berpeyv, navekî kit. Weke:
- Kurê Restem, kur e.
- Keça Zînê, keç e.

Ê berpeyv ji bo hêjabûnê. Weke:
- Kurê Restem, Bengî ye.
- Keça Zînê, Jale ye.

Pergarê serpeyvê di nêvî de ye.

Serpeyv, pesnê digel rengnav/ berpeyv û pesin. Weke:
- Ê baş, baş e/ ya baş, baş e.
- Ên baş, baş in.

Serpeyv, navê pesinva, balxwegirê pesin û berpeyva pesin. Di vir de herdu kerên serpeyvê dibin pesingîr û pesindar. Weke:
- Kurê baş, baş e/ keça baş, baş e.
- Kur û keçên baş, baş in.

Serpeyv, navê xwepêgir û balxwegirê pesin. Berî wê rengnavê xwepêgirtinê ya berpeyva pesin. Weke:
- Kurê (y)ê baş, baş e/ keça ya baş, baş e.
- Kurên ên baş, baş in.
- Keçên ên baş, baş in.

Di vî hawî de berpeyv û hersê nav. Weke:
- Kurê (y)ê baş, Restem e.
- Keça ya baş, Zîn e.
- Kurên/ keçên ên baş, baş in.

Di vî hawî de berpeyv hawegir e. Weke:
- Kurê (y)ê baş, serdar e.
- Keça ya baş, serdar e.
- Kurên/ keçên ên baş, serdar in.

Bi vî hawî balxwegir û berpeyvê hawegir. Weke:
- Kurê (y)ê serdar, serdar e.
- Keça ya serdar, serdar e.
- Kurên/ keçên ên serdar, serdar in.

Ji van hemî serpeyvan çi nifşên ku hebin, mirov dikare ducar bike. Ew di bin bi vîna gorhatinê. Weke:

- Serdar e, serdar e: Serdarî li gorî ye.
- Kurê ê serdar, serdar e.

Mirov ev hemî nifşên serpeyvê dikarî *berpeyv*ê wan bikî *navwar* û *navdem*. Belê divê pergarek ji van her çarên li jêrê di serê herdukan de bê ku **bi**, **di**, **li,** û **ji** ne. Weke:

**a**) **şûnbêjê Navwar**.

**1-** Restem **bi** wir de ye/ **di** wir de ye, **li** malê ye/ **ji** malê ye.

**b) Navwarê Nav:**

**1)** şêrdar **li** wir e/ **li** malê ye.
**2)** Ê baş **li** vir e/ **li** malê ye.
**3)** Serdar **li** vir e/ **li** malê ye.
**4)** Ê Serdar **li** vir e/ **li** malê ye.
**5)** Ê Serdar, ê **li** vir e/ ê **li** malê ye.
**6)** Ez **li** vir im/ ez **li** malê me.
**7)** Ez, ê **li** vir im/ ez ê **li** mal im.
**8)** Ez ê ya **li** vir im/ ez ê ya **li** mal im.
**9)** Ez ê kurrê **li** vir im/ ez ê kurrê **li** mal im.
**10)** Ê min **li** vir e/ ê min **li** mal e.
**11)** Restem, ê **li** vir e/ Restem, ê **li** mal e.
**12)** Restemê min **li** vir e/ Restemê min **li** mal e.
**13)** Ê min, ê **li** vir e/ ê min, ê **li** mal e.
**14)** Ê Restem **li** vir e/ ê Restem **li** mal e.
**15)** Ê Restem, ê **li** vir e/ ê Restem, ê **li** mal e.
**16)** Kurê Restem **li** vir e/ kurê Restem **li** mal e.
**17)** Kurê Restem evê **li** vir e/ kurê Restem evê **li** mal e.
**18)** Ê kurê Restem **li** vir e/ ê kurê Restem **li** mal e.
**19)** Kurê Restem evê **li** vir e/ kurê Restem ewê **li** mal e.
**20)** Kurê baş **li** vir e/ kurê baş, ê **li** mal e.
**21)** Kurê baş, ê **li** vir e/ kurê baş, ê **li** mal e.
**22)** Kurê ê baş **li** vir e/ kurê ê baş **li** mal e.

**23)** Kurê Serdar **li** vir e/ kurê Serdar **li** mal e.
**24)** Kurê ê Serdar **li** vir e/ kurê ê Serdar **li** mal e.
**25)** Ê kurê Serdar **li** vir e/ ê kurê Serdar **li** mal e.

Weha reng e pergara **bo**-yê jî weke **bi**, **di**, **ji** û **li**-yê piştî van her bîst û şeş navwar û navdemîyan tê (şûnbêjê Navwar û Navwarê Nav) û dikevî ser şûnbêjê berteng. Weke:

- Kar-xwarin, vîn-şêr, Restem-dar.
- Serdar **bo** te ye/ **bo** vir e/ **bo** mal e.

Vêca bê (ka) çilo navê kes û nifş û pesnê gel, pergar dibin ser peyv. Weha reng e bêjemak, hawedarê xweser, peymak, navê winda, vînî û livînî tev dibin serpeyv. Weke:

- Xwarinan xwarine- ducarî.
- Xwarin bo te ye/ xwarin ji te re ye.
- Xwarin bi te re ye/ xwarin di dawê de ye.
- Xwarin li wir e/ xwarin baş e.

**Hawegîrê peymak:**

- Karê wî weke kar e- pesnê sitewr.
- Ê mirî mirî ye/ ê mirî winda ye.
- Ê xwere xwere ye/ ê xwere xurt e.

Bêjemak bi her hawî dibî serpeyv û berpeyv, belê çaxê ku hersê nav bibin berpeyv divê ku pergawa xwepêgirtinê di pey de bê. Weke:

- Xwarin ya Restem e/ ya şêr e.

Lê eger bêjî: *Xwarin Restem e*, çênabî.

**Tenhagira Serpeyv:**

Hersê nivşên nav û bê rengnav dibin serpeyv, weke:

- Restem/ şêro/ zilam, xurt e.

Pesnê sitewr digel pergarê serpesnî:

- Ê baş mêr e.

Pesnê sitewr ê bêpergar, lê dûvikê **o-ê** herdu pesnan dikin nêr û mê, yan dikin nav. Weke:

- Başo sist e/ Qencê sipehî ye.

Hawegîrê nav digel rengnavî û bêyî wî evê bi nîşan. Weke:

- Serdar xurt e/ ê Serdar xurt e.

Hawegîrê peymak digel pergarê pesn û rengnav. Weke:

- Ê zane jîr e/ ê zanewer jîr e- rengnav.

şûnbêja berfireh. Weke:

- Ez baş im.

şûnbêja berteng digel rengnav û bê wê. Weke:

- Min xwariye/ ê min baş e.

Bêjemak hemî. Weke:

- Xwendin baş e.

**Tenhagirê ku nabî serpeyv:**

Pesin bê rengnav û pergar (nabin serpeyv). Weke:

- Baş xurt e.

şûnbêja berteng bê rengnav û pergar. Weke:

- Min baş im.

Hawegîrê peymakê bê pergar û rengnav. Weke:

- Zanewer baş e.

Demhawe tev ji berê ve. Weke:

- Xwariye/ wê bixwî/ dixwî/ bixwe.

Pergar, nîşan, dûvik, tîp, rengnav û rengbêje çênabin. Weke:

- Ê baş e/ wend baş e/ o baş e/ a baş e/ kanî baş e.

Ev herdu nifşên paşî dibin serpeyv û berpeyv, çaxê bi vîna *çiraze* bin. Weke: *Xwariye* û *xweşik*. Yanî çiraza (nivîsîn) wê xweşik e. Weha reng e yên dî tev wilo. Û navwar û navdem jî dibine serpeyv, bi qewlê ku pergarek ji her çaran di serî de bê. Weke:

- Ê li vir baş e/ ê ji wir baş e/ ê bi vir ve baş e/ ê di vir de baş e/ ê bo te baş e.

**Tenhagira Berpeyv:**

Tiştê ku dibî berpeyv.

Çi tiştê ku dibî serpeyv, dibî berpeyv jî û çi tiştê nebî serpeyv, nabî berpeyv jî. Lewra ji bil demhaweyê hemî dibin berpeyv. Weke:

- Restem xwariye/ dixwar/ wê bixwî (bixwe).
- şêro xwariye/ dixwar/ wê bixwî.
- Zilam xwariye/ dixwar/ wê bixwî.

Heçî *warnav* dibin serpeyv û berpeyv, çaxê pergarê pesin beriya wê bê. Lê divê pergarek ji her çaran pê re bê ku **li, ji, di** û **bi** ne. Weke:

- Ê **li** vir/ ê **ji** vir/ ê **di** vir de/ ê **bi** vir ve- serpeyv.

Çaxê (warnav) bibî berpeyv, tîpa **ê** pê ve nayê. Weke:

- Restem ji vir e/ di vir de ye/ bi vir ve ye/ li vir e- berpeyv.

Heçî *navdem* e nabî berpeyv, lê ku demhawek bê, dibî berpeyv. Dîsa divê yek ji her çar pergaran (*di, ji, bi* û *li*) di serî de bê. Weke:

- Restem **di** êro de çû.
- Restem **ji** doh de peyivî.
- Restem **bi** sibehê re kar dibî.
- Restem **li** salê dinerî.

Çaxê (yek ji her çar pergaran) di serî de bê, nabî serpeyv, lê dibî *navwarê pêşketî.* Weke:

- Ji doh ve Restem çû. Va ye (ji vir de) bûye nardemê pêşketî.

Herçî navwar e ku demhawe di pey de bê, ew dibî karlêderê pergarî. Weke:

- Restem li vir raza.

**Restem:** Serpeyv e.

**Raza:** Demhawa bihurî ye.

**Li vir:** Navwarê *raza*yê ye.

Pergarê **bo**-yê dibî berpeyv û nabî serpeyv. Lê divê ku tim û tim jê re navek an şûnbêjek bibî balxwegir. Weke:

- Restem **bo** te ye/ Restem **bo** Zînê ye.

Çaxê ku **bo** bikevî ser demhaweyê çênabî, ji bil ku **ku** bikevî ser demhawê. Weke:

- Restem hatiye, **bo** ku bixwênî.

Naxwe divê **bo** di navbera du fêrpeyvan de bê û merov dikarî **ji**-yê jî bixî ser **bo**-yê. Weke:

- Restem hatiye, *ji* **bo** ku rûnî.

Weha reng e **da** jî bi vîna **bo**-yê ye, lê **ji** nakevî ser. Weke:

- Ez hatime, **da** ku bixwînim.

Ew (da) weke **bo**-yê nakevî ser navan. Naxwe çênabî ku mirov bêjî: ***Da** Restem e.* Lê ku fêrpeyvik berî wê hebî dikevî ser nav. Weke:

- Xusro hatiye, **da** Restem herî.

Ev **bo**, **ku** û **da** hersê di navbera du fêrpeyvan de tên. Vêca divê fêrpeyvê paşî her nehatî bî, yê pêşî bihurî bî û nehatî jî çêdibî. Weke:

- Restem hatiye **ku** herî.
- Wê Restem herî, **bo** tu razî.
- Wê Restem herî, **da** tu razî.

Heger fêrpeyveke nedemhawe berî fêrpeyvê bê, ev hersê jî (bo, ku, da) çêdibin, lê yê piştî wan divê demhawe bî. Weke:

- Ev baş e **ku** tu herî/ ev baş e **ku** tu çûbî.
- Ev baş e **da** tu herî/ ev baş e **bo** tu herî.

Ev **lê** di navbera du fêrpeyvan de tê û divê yek ji fêrpeyvan çi yê paşî û çi yê pêşî *babûnî* bî, yê dî jî *bêbûnî* bî. Weke:

- Ev hatiye, **lê** ev nehatiye.
- Ev nehatiye, **lê** ev hatiye.
- Evê bê, lê ev nayê/ ev nayê, **lê** evê bê.
- Ev hatiye, **lê** ev e bê.
- Ev nehatiye, **lê** ev nayê.

Heger di pey van (**lê**)yan de fêrpeyvên nedemhawe bên, navê di hebûn û nebûnê de ku dijê hev bin ev in, weke:

- Ev hatiye, **lê** ev ne baş e.
- Ev nehatiye, **lê** ev baş e.

Di vî hawî de mirov dikarî serpeyvê/ fêrpeyvê paşî bavêjî. Weke:

- Ev hatiye, **lê** baş e.
- Ev hatiye, **lê** ne baş e.

Herçîka fêrpeyvê ku di nûpeyv de nabin serpeyv û berpeyv jî, ev in:

- Bi Xwedê tê (tu yê) bê- sûnd (sond).
- Xwezî tu neyê- lavekirin.
- Bere (bila) ew bê- fermanê winda.
- Bixwîne- fermanê pêşdana.
- Ma tê herî?- pirsiyar.
- Heger tu herî- qewlendî.
- Wa kurê hoste!- bakirin.

Weha reng e çi pergar û rengbêjê ku di serê van fêrpeyvan de bên, dîsa **bo-ku-lew-lewra-lê-da** nakevin ser wan. Naxwe pergar û rengnavê nêv du fêrpeyvan nayêne ku ew fêrpeyv ne berê bûbin.

Herçî fêrpeyvê nû, di pey de weke vayên me gotin, nabin tu tişt; ne xwedî kar, nekar, pêder û lêder, ne jî serpeyv û berpeyv.

**Pêgirtek:**

Me berê gotiye ku demhawe nabî serpeyv, belê çaxê ku tîpa **ê** digel **ku**-yê di serî de bên, ew herdu tevlî *demhaw*ê dibin *serpeyv*. Weke:

- **Ê ku** bixwî/ ê ku xwendiye.
- **Ê ku** dixwênî Restem e.

Va ye li vir, **ê** û **ku** tevî hersê demhawan dibin serpeyv û *Restem* dibî berpeyv. Naxwe mirov nikare wê di nehatî de bihêlî. Yanî mirov nikarî bêjî: *Ê ku wê bixwênî*...

**Berpeyvê Demhawe:**

*Berpeyv* çi nehatî, çi derkêlî, çi bihurî û çi fermana winda bî, çêdibî demhawe. Vêca pergara **wê** di nehatî de û **bere** (bila) di fermana winda de berî serpeyvê tên. Yanî ji demhawê qut dibin. Weke:

- **Wê** Restem herî- nehatî.
- **Bere** Restem bixwênî- fermana winda.

Weha renng e bihuriyê hegerî, gomanî (gumanî) û tev. Weke:

- **Wê** Restem xwaribana/ xwaribûna/ xwaribî.

Û çêdibî mirov piştî serpeyvê, *jî*-yekê jî bênî. Weke:

- Restem **jî** wê herî/ Restem **bere** herî.

**Başqegotek:**

Pergara **ne**-yê, ji berê ve dikevî ser demhawa bihurî û dikevî ser derkêlî. Weke:

- ...**ne**xwaribûna/ **ne**xwaribana/ **ne**xwariba/ heye **ne**xwaribî/ xwezî **ne**xwaribî/ **ne**xwariye/ **ne**xwar- bihurî.
- ...**ne**dixwar- derkêlî.
- **Bere** nexwî- fermanê winda.
- **Ne**xwe- fermanê pêşdar.

Weha reng e çi pesn û navên ku hebin, weke:

- **Ne** baş e/ **ne**xwariye/ **ne** serdar e/ **ne** gundî ye/ **ne** zanîn e/ **ne** dar e.

Belê çaxê ku (**ne**) bikevî ser demhawa nehatî, yan bibî bersiva pirsê, ew **ne** dibî **na**. Weke:

- **Na**xwênî/ **na**çî- nehatî.

Ev (**na**)ya han bersiva pirsê ye.

Ev serpeyv kîja bî û berpeyv kîja bî, bê van herdukan fêrpeyv çênabî. Ji ber wilo, ji wan re tê gotin **hîm**. Û ji van herdukan pê ve, tê gotin **dês** yanî dîwar. Vêca çi *dês*ê ku hebin, di navbera serpeyv û berpeyvê de tên.

Piştî berpeyvê du tişt hene ku tên. Yek jê **karlêder** e, ya dî **navwar**/*navdem* ên bê pergar e ku ji wan re tê gotin **perr**. Ev herdu piştî derhawa yekxwedî tên. Weke:

- Ez rûniştim.
- Ez rabûm.
- Ez giham salê.
- Ez hatim te.

- Ez karim te.
- Ez hinguvtim te.
- Ez ketim çalê.

Naxwe çi karlêderê ku di pey demhawa yekxwedî yan duxwedî de bê, ew jî dibî bi vîna navwar. Weke:

- *Ez hatim te*. Yanî ez hatim cem te.
- *Min ajote te*. Yanî (min ajot) hindirwê te.

Heye ku ne bi vîna navwar û navdem bî jî. Weke:

- *Ez karim te*. Yanî, ez karim bi te.

# 07-DÊS

## DÊS 1

Em ê niha dabêja *dês*ê bikin. Me berê got *dês* ew in ku di navbera serpeyv û berpeyvê de bên.

### 1- Balxwegir û Xwepêgir

*Balxwegir* û *Xwepêgir* ew in ku pergara **ê**-yê berî wan bê û tu nîşan pê ve nayên. Lê çêdibî ku mirov duvikê **î**-yê di paşiya yê tenha de bênî û fêrpeyv pê nagihê serî. Çi tiştê ku dibî serpeyv, dibî balxwegir û **ê** dibî çengelê balxwegirê û (y)ê berî **ê** bî, dibî xwepêgir. Weke:

- Kur**ê** Restem baş e.

**Kur**: Serpeyvê xwepêgir e.
**Ê**: Çengelê xwepêgir e.
**Restem**: Balxwegir e.
**Baş**: Berpeyv e.
**E**: Dûvikê berpeyvê tenha ye.

Çaxê ku balxwegir weke serpeyvê pesin bî, divê ku **ê**-ya rengnav berî wê bê, da ew pesin bibî gewde. Weke:

- Kurê **ê** baş xuya ye.

**Kur**: Serpeyv û xwepêgir e.
**Ê**: Çengel e.
**Ê**: Bi vîna kes, balxwegir e.
**Baş**: Pesnê **ê** ye.
**Xuya**: Berpeyv e.
**Ye**: Dûvikê berpeyvê tenha ye.

şûnbêja berfireh dibî xwepêgir, lê nabî balxwepêgir. Weke:

- Ez, ê Restem im/ ez kurê Restem im- ev çêdibî.

- Ez, ê ez im/ Restem, ê ez im- ev çênabî.

şûnbêja berteng dibî balxwegir, lê nabî xwepêgir. Weke:

- Restem, ê min e/ Restem kurê min e- ev çêdibî.
- Min, ê Restem e/ min kurê Restem e- ev çênabî.

Çaxê xwepêgir şûnbêja berfireh bî, mirov karî şûnbêja **xwe**-yê bikî balxwegir. Weke:

- Ez, ê xwe me/ hûn, ê xwe ne.

Vêca yek dibî serpeyv, ê dî dibî berpeyv. Yek xwepêgir e û yê dî balxwegir e.

**2- Pesingîr û Pesinbêj:**

Pesingîr serpeyv e. Çi tiştê ku dibî serpeyv, dibî pesingîr jî. Lê divê ku pesinbêj ne nav, ne bêjemak, ne demhawe û ne navê vînê bî, belê yek ji her şeş nifşên pesin bî, weke: *Baş, xweşik, bilind, sivik*...

Yan hawegîrê peymak bî, weke: *Mirî, ketî, xwere, zane, xwende*...

Yan hawegîrê bi nîşan bî, weke: *Serdar, dewlemend, şivan, pezvan*...

Yan pesnê peynav bî, weke: *Rûşeng, laşnerm, sergerm, bêvilmezin*...

Yan vajiyê wê bî, weke: *şengrû, mezinser, pehnsing, hûrçav*...

Yan hawê peynav ê peymak bî, weke: *Bavserdar, kurdewlemend, dêdikandar*...

Yan vajiyê wê bî, weke: *Serdarbav, dewlemendkur, dikandardê*...

Yan hawê peynav ê peymak bî, weke: *Bavmirî, kurxwenda, dêzana*...

Yan vajiyê wê bî, weke: *Mirîbav, xwendakur, zanadê*...

Yan hawê pey navwar û navdem ê peymak bî, weke: *Livirmirî, îrozayî, hingahatî, vêgaçiwî*...

Yan dunav bî, weke: *Kurebav, keçebav, navsere, duserî.*...

Yan dupesnê sêtîpî bî, weke: *Belereş, kurîsor, gewrîboz*...

Yan pesnê ducar ê sêtîpî bî, weke: *Harhare, pispise, sorsore*...

Yan dunavê vînî yê sêtîpî bî, weke: *Girgire, kinkine, jinjine, poşpişe*...

Yan dunavê dengî yê sêtîpî bî, weke: *Qîrqîre, hîrhîre, çîrçîre, zîrzîre, pitpite*...

Yan nav û pergar û hawê peymak bî, weke: *Serjêkirî, derpêjêketî, avlêrijî.*..

Yan pergar û nav û hawê peymak bî, weke: *Jirêketî, livirmirî, jigundkirî*...

Yan du navê ji hev û nîvpergar bî, weke: *Kurê kur, keça keç, bavê bav*...

Weha reng e hemî nifşên ku me gotin, bi vî hawî ne, weke: *Başê baş, serdarê serdar, mirîyê mirî*...

Yan pesn û bêjemakê bê dûvikê hindemî yê sitewr bî, weke: *Nûêrîş, zûêrîş, pirêrîş*...

Yan dunavê pergar ku di nêvî de bî, weke: *Ber bi hev, ling li dûv, ser bi por*...

Yan nav û pesin û hawê peymak bî, weke: *Sermezinbiwî* (sermezinbûyî), *sermezinkirî.*..

Yan bêjemak û pesnê sitewr û peymak û vajiya wan bî, weke: *Xwarin xwarin, xwarinpir, pirxwarin*...

Yan navwar an navdemê digel nav bî, weke: *Peymak, dûvbav, serdev, berpal.*..

Yan navê bi dûvik ê pêhildanê bî, weke: *Çilmoyî, hilmoyî, gerpikî*...

Yan heger **ba** û **bê** berî navê vînê û bêjemakê hindemî û herdemî bî, weke:

**a)** *Bê êrîş, bê xwarin, bêxwedî, bêşengî*...

**b)** *Ba êrîş, ba xwarin, baxwedî, başengî*...

Yan **ne** di serê pesin û haweyê peymak û nîşandar û nav de bî, weke: *Ne baş, ne serdar, ne mirî, ne bav*...

Yan bêjemak û hawegîrê peymak bî, weke: *Tenhagir, xwarinxwer*.

Naxwe mirov çilo bêjeyan bigihênî hev çi duker, an sêker, an bi pergar û bê pergar, ew dibin pesinbêj. Belê divê **ê**-yek berî wan her bê.

Weha reng e fêrpeyvê demhawe çi bihurî û çi derkêlî û çi nehatî bî, divê ku pergara **ku**-yê jî piştî (tîpa) **ê**-yê, bê. Ew (pergar) fêrpeyvê dixî şûna bêjemakê û dikî pesinbêj. Weke:

- Zilamê ku xwariye, baş e.
- Zilamê ku dixwî, baş e.
- Zilamê ku bixwî, baş e.

**Zilam**: Serpeyv e û pesingîr e.

**Ê**: Pergara pesin e.

**Ku**: Pergara pêşvegerê ye.

Hersê fêrpeyv di cihê bêjemakê de dibin pesinbêj, yanî xwedîxwarin.

**Baş**: Berpeyv e.

**E**: Dûvikê berpeyvê tenha ye.

Yan pesnê raserê (**tir**)ê, yan pesnê raser ê *bijarî*, yan pesnê raser ê du pesnê ne ji hev, weke:

- Restemê baş ê baş hat.
- Restemê baş ê başan hat.
- Restemê zor-baş hat.

Yan pergarê dêhindariyê bikevin ser navê kes, weke:

- Kurê min ê mîna/wekî temet rengê Restem (ku) baş e, hat.

Çaxê ku ev bikevin ser navê nifş, ew hingî ne rastî ye. Navê wê **dêhindarê genda** ye, weke:

- *Kurê min ê mîna*/ wekî *temet rengê şêr hat*. Yanî di çelengiyê de *weke şêr* e.

- *Kurê min ê nan xwariye, xurt e*.

Ev li cem hinan çêdibî û li cem hinan çênabî. Ku neyê, pergara **ê**-yê çênabî, heger çêbî, vêca çaxê ku mirov pesin anî, yê pêşî çewa ku me gotiye, wê (**ê**) berî wê bê û çêdibî ku (**î**) jî bê. Weke:

- Kurê min **î** baş hat.

Pesnê didiwan û paştir jî wilo ye, weke:

- Kurê min ê başê xwende **ê** nazik hat.
- Kurê min î başî xwende **î** nazik hat.

Vêca pesinbêj çêdibî ku piştî serpeyvê bi xwe bê, weke:

- Kurê baş hat.

Va ye *baş*, piştî *kur* e. Û çêdibî ku piştî **balxwegir**ê bê, weke:

- Kurê min ê baş hat.

Va ye *min* ji bo *kur*-ê balxwegir e, *baş* pesnê *kur*-ê ye û piştî *balxwegir*ê ye.

Çaxê ku **ê** di pey *pesinbêj*ê de neyê, ew dibî pesinbêjê nifir û zariyê. Weke:

- *Restem*(ê) *serserî nehat*/ *wey bibî serserî*- ev nifir e.
- *Restem*(ê) *ciwamêr nehat*/ *wey bibî ciwamêr*- ev zarî ye.

## DÊS 2

### Pêrohnî:

*Pêrohnî* û *bêrohnî* divê yek kes/tişt bin. Ev piştî *serpeyv*ê tê û navê serpeyvê dibî *bêrohnî*. Yanî qenc nayê naskirin, ne ku mirov pêrohniyekê di pey wê de bêjî.

Divê ku *serpeyvê bêrohnî* yek ji *şûnbêjê berfireh* bî û ew jî berî *berpeyv*ê tê, lê **ê** berî wê û piştî wê nayê. Weke:

- Ez, kurê te kêm im.
- Tu, keçik sipehî yî.
- Ev, xanî fireh e.
- Ew, gul geş e.
- Hûn, zilam mêr in.
- Em, jin tirsonek in.
- Ev, zilamane merd in.
- Ew, jinanane şeng in.

Werbêja: *Ez, kurê te kêm im*:

**Ez**: Serpeyv e û bêrohnî ye.

**Kur**: Pêrohnî ye.

**Ê**: Pergara balxwegirtinê ye.

**Te**: Balxwegir e.

**Kêm**: Berpeyv e.

**Im**: Dûvikê yekxwebêjê ye.

Wa me naskir ku ew kurê wî ye.

Hem çêdibî ku *serpeyv* nav bî jî, lê divê piştî *pêrohniyê balxwegir* bê. Weke:

- Restem, kurê te mêr e.

Di vir de divê *kur* û *Restem* yek kes bin. Yanî *ew Restemê ku kurê te ye*. Heger ne ji hev bin, ew dibî *bang*. Weke:

- Restem! Kurê te mêr e.

Yanî: *Wa Restem! Kurê te mêr e*. Va ye *Restem* û *kur* ne yek in û fêrpeyvê *kurê te mêr e* dibî bersiva bangê.

**DÊS 3**

**Xuyabeng:**

Ev piştî *serpeyvê xwedîbeng* tê û wiha jî berî *berpeyv*ê tê.
Çi tiştê ku pesin bî, çaxê dûvikên bêjemakê pê ve bên, dibî *xuyabeng*.

Çi hawegîrê bi nîşan bî, çi bêjemakê bi nîşan çêdibî, çaxê ku pergareke **bi**-yê di serê wan de hebî, dibî xuyabeng.

Pesnê sernav bi dûvik û nîşan û bê herdukan çêdibî, hawegîrê peymak bi **ê**-ya bê nîşan çêdibî û nav piştî pergara **bê**-ya bi dûvik û bê dûvik tê. Navê duker jî bi pergar û bê pergar çêlbêje. Weke:

- Restem **bi** şengî hat- pesnê bi dûvik e.
- Restem **bi** serdarî hat- hawegîrê bi dûvik.
- Restem **bi** zanetî/ zanîn hat.
- Restem **bi** rûşeng/ rûşengî hat.
- Restem **bê** serî hat.
- Restem **bi** serserî hat/ serserîtî hat.
- Restem **bi** lez hat.

Werbêja: *Restem dev ji hev hat:*

**Restem**: Serpeyv e.
**Dev**: Perçê pêşî yê xuyabeng e.
**Ji**: Pergara dûrîhevê ye.
**Hev**: Pêgirta **ji**-yê ye. Ev hersê li ser hev (*dev+ji +hev*) ji bo Restem dibin *xuyabeng*.
**Hat**: Demhawa bihurî tevî şûnbêjê veşarî, berpeyv e.

Çaxê *xuyabeng* ku *fêrpeyv* bî, divê ku:

a) Fêrpeyv demhawe bî.
b) Pergara **di**-ya derkêlî tê de bê.
c) Pergara **û**-yê berî wê bê.

Mirov dikar pergara **û**-yê berî wê neyîne, weke:

- *Restem hat û dixwar*- yanî Restem hat û nan dixwar.

Xuyabengê dî jî çêdibî ku piştî berpeyvê bê. Weke:

- Restem hat bi serbestî.
- Restem hat bi rûgeşî.

**DÊS 4**

**Xuyanifşê Peyhijmar**:

Ev navê nifş *Xuyanifşê Peyhijmar* e û berî berpeyvê tê, piştî hijmarekê tê, tîpa **ê** berî **û**-yê û piştî wê nayê. Weke:

- Yek zilam hat. Yanî zilamek hat.
- Du/ sê/ ça/ pênc/sed/ hezar... zilam hatin.

Werbêja: *Hezar zilam hatin.*

**Hezar**: Serpeyv e.

**Zilam**: Ji bo serpeyvê nifşxuya ye.

**Hat-in**: Fêrpeyva demhawe berpeyvê *zilam* e.

Heye ku nifşxuya (xuyanifş) piştî pêrohniyê jî bê. Weke:

- Min sed qutî rûn kirîn.
- Restem deh melû giya çinî.

Werbêja: *Min sed qutî rûn kirîn*.

**Min**: serpeyv e.

**Sed**: Karpêder û hijmar e.

**Qutî**: Pêrohnî ye.

**Rûn**: Nifşxuya ye.

**Kir**: Demhawa bihûrî ye.

**În**: Nîşana peyzoyê ye.

**Peygotinek:**

Ev her pênc **dês**ên ku me gotin, berî demhawa yekxwedî û demhawa dusêxwedî tên. Vêca em ê niha dabaşa hinek tiştan bikin ku tenê berî demhawa dusêxwedî tên û ji bo ya yekxwedî çênabin.

**DÊS 5**

**Karpêder:**

Çaxê demhawe duxwedî bî, ev karpêder piştî serpeyvê tê. Em karin navê vê serpeyvê bikin **karjêder** jî. Kar, bi hatina vîna karpêderê çêdibî. Yanî baş xuya dibî ku çi navê hebî, bê ku mirov pergara **ê**-yê bênî, çêdibî. Lê çaxê pesin bî, divê ku **ê**-yek pê re bê. Ev jî du nifş in: a) **Xweser**, b) **Pergarî.**

**a)** Heye *xweser*, bê pergarên **ji, bi, di** û **li**-yê.

**b)** Heye *pergarî*. Yanî ev her çar (ji, bi, di, li) dikevin serê. Ew jî li gor demhawaya pêşî çêdibî. Weke:

- Min nan xwar.
- Restem pelokê xwend.
- Min **li** Restem xist.

Werbêja: *Min nan xwar*.

**Min**: Serpeyv e.

**Nan**: Karpêder e.

**Xwar**: Demhawa duxwedî ye. Ev yê xweser e.

**Ê**-ya pergarî berî demhaweya ku bê pergar e tê û karpêder jê re nayê.

Werbêj:

**Min**: Serpeyv e.

**Li**: Pergara balveçûnê ye.

**Restem**: Karpêderê pergarî ye.

**Xist**: Demhawa bihurî ye.

Çaxê mirov pergarê neyênî, divê karpêderê xweser jê re bê, lê wê vîna demhawê bibî bi hawekî dî. Weke:

- *Min Restem xist*. Yanî, min ew li qadê dirêj kir.

Çaxê ku karpêderê pergarî tenê jî tê, dîsa karpêderekî xweser ê negotî heye. Weke çaxê tu bêjî: *Min lê xist*. Yanî, *min şeqam li wî xist*. Ji ber wilo mirov karî tim karpêderê xweser û

pergarî herdukan bêjî. Belê divê ku her karpêderê xweser berî karpêderê pergarî bî. Weke:

- Çûkan li garis danîn. Yanî çûkan xwe li garis danîn.

- Min di malê de xwend. Yanî min pelok di malê de xwendin.

- Min bi Restem ki*r*. Yanî min xap bi Restem kir.

Ev karpêderên pergarî, berî demhawên yekxwedî jî tên. Weke:

- Ez **di** vir de hatim.
- Te **bi** vir de bazda.
- Tu **ji** vir ve hatî.
- Hûn **li** wir razan.

**Peygotinek:**

Ev karpêder li gor hatina pergaran tê navdan. Naxwe her pergarek, navek lê heye. Çaxê **bi** pê re bê, dibî **ê** û hevalê pêderê. Çaxê **ji** pê re bê, dibî **ê** û destpêka jêderê. Çaxê **di** pê re bê, dibî **ê** û derwarê têderê. Çaxê **li** pê re bê, dibî **ê** û serwarê lêderê. Çaxê **bo** pê re bê, dibî **ê** û ciwêtê boderê.

**DÊS 6**

**Derdemî:**

Heçîka *derdemî* ne, ev in:

- Çaxek jê tê zanîn.
- Berî berpeyvê tê.
- Bê pergar tê.
- Bi pergarê re tê.
- şûnbêja bertilî û berteng berî wê tên.
- Berî demhawa yekxwedî û dusêxwedî tê.

Weke:

- Ez rojekê hatim/ rojekê min danî/ rojekê min avêt.
- Ez bi roj hatim/ min bi roj danî/ min bi roj avêt.
- Ez wê rojê hatim/ min wê rojê danî/ min wê rojê avêt.

Mirov dikarî vê derdemiyê berî serpeyvê jî bênî. Weke:

- Rojekê bi roj, wê rojê ez hatim/ rojekê bi roj, wê rojê min danî/ rojekê bi roj, wê rojê min xwar.

Ev **berî** û **piştî** herdu jî derdemiyê xweser in.

**Peygotinek:**

Me berê gotiye ku çi tiştên di navbera serpeyv û berpeyvê de tên, ji wan re **dês** tê gotin û va me şeş nifşên *dês*ê gotin. Tiştên ku piştî berpeyvê jî bên, ji wan re **per** tê gotin.

*

## 08-PER

### PER 1

**Karlêder:**

Çi tiştê ku dibî serpeyv, dibî karlêder jî. Çaxê ew tişt pesin bî, divê ku **ê** berî wî bê. şûnbêjê berteng dibî karlêder û piştî demhawa yê sêxwedî tê, weke bêjemakê: *Daxin, xistin, avêtin, kutan, gihandin*. Keywasa wan ev e ku merov karibî demhawa şûbêjeke berteng piştî wê bênî. Ewya sêxwedî ye. Weke:

- Min gihande wan. Yanî *min hewar gihande wan*.
- Min avête wan. Yanî *min kevir avête wan.*
- Min xiste sitiwê wî. Yanî *min sûc xist sitiwê wî*.
- Restem avête Xusro. Yanî *Restem kevir avête Xusro.*

Ev hawe *yekkarî* jî çêdibî.

Werbêja: *Restem kevir avête Xusro*.

**Restem**: Serpeyv e.

**Kevir**: Karpêder e (dêse).

**Avête**: Demhawa sêxwedî ye, tevî karpêderê veşarî berpeyv e.

**Xusro**: Karlêder e (per).

Naxwe çaxê ku ji peyvê bê fêrkirin, mirov karî karpêderê nebêjî.

**Awirek:**

Hinek car **palek** tê gotin ku karpêderê wê derhiş an winda bî. Hingê *palek*a yekê gende ye, bi rastî ye lê ji wilo pê ve çênabî ku tiştekî dî bêjin. Weke: *Min hewar gihande te*. Va ye hewar nakevî nav destên mirov ku tu bigehênî hinekan, lewra deng e. Naxwe dibê: *Min hewar gihande guhên te*.

Carna **palek** ne di cihê xwe de tê gotin. Weke: *Min hewar kire te/ min hewar xiste te*, ev çênabin. Yan: *Min hewar kire guhên te*, ev jî çênabî. Lewra ne li cem bû, deng nekiriye.

Evê han jî ne li cih in, weke tu dibêjî: *Min hewar got* û *min bakir te/ min alîkarî li windayê te û ji te xwest*, ev ne li cih in.

**PER 2**

**Derwar:**

*Derwar* ev e ku cihik ji cihan jê tê zanîn. Ev, bê pergar e û piştî demhawa berpeyvê tê. Herweha piştî demhawa yekxwedî, duxwedî û sêxwedî jî tê.

Ya yekxwedî, weke: *Ez hatim vir*.

Ya duxwedî, weke: *Min kevir danî vir*.

Ya sêxwedî, weke: *Min kevir avête vir*.

**Awirek:**

Ev *demhawa sêxwedî* ku karlêder pê re bê û ku tu bixwazî derwarî bênî, hingê ew d*erwar* xweser çênabî, divê bi pergaran bî. Yanî du karlêderên xweser, bi hev re nayên. Weke: *Restem kevir avête Xosro vir*, ev çênabî. Lewra *Xusro* û *vir*, herdu karlêder in. Lê çaxê ku tu bêjî: *Min kevir avête Xusro li vir,* çêdibî. Lewra *li vir*, bi pergar e û divê her jî derdemî piştî karlêderê bê.

**PER 3**

**Karlêderê Hevrengî:**

*Hevrengî* yanî ji rengê demhawê ye û bêjemak e. Ev jî du nifş in: a) **Sosretî**, b) **Hijmarî**/ *pesnî*.

**a)** *Sosretî:*

Ev ew e ku dema di serê wê de tê, dibe bêjemakê demhawa berî xwe. Weke:

- Min pelok xwend, çi xwendin!

*Çi xwendin*: Karlêderê sosretî ye.

**b)** *Hijmarî*/ pesnî:

Ev ew e ku dûvikê **ek** pê ve tê û piştî wê pesnekî qenc an neqenc tê û dibe bêjemakê demhawa berî xwe. Weke:

- Min xwend, xwendinek baş.
- Min lê xist, lêxistinek dijwar.

*Xwendinek baş û lêxistinek dijwar*: Karpêderên hijmarî û pesnî ne.

**PER 4**

**Xuyabengê Fêrpeyv:**

Xuyabengê Fêrpeyv, du nifş in: a) **Demhawê Derkêlî**, b) **Dunavîyê Bêpergar**.

**a)** *Demhawa Derkêlî:*

Mirov dikarî pergara **û**-ya civîndar di serê wan de bênî û dikarî neyênî jî. Lê gava ku **û** di vir de bê, ji bo civîn û xuyabengê herdukan e. Weke:

- Restem hat/ Restem xwend/ Restem ditirsiya.

Ev, xuyabengê demhawa derkêlî ye. Vêca fêrpeyvê pêşî bihurî çêdibî, weke viyê ku me got, derkêlî û nehatî jî çêdibî. Lê kotekê pêşdar û kotekê winda herdu derkêlî çêdibin. Weke:

- Restenm dihat, ditirsiya.

Derkêliyê nehatiyê ku di vir de xuyabengê ji vî nifşê derkêlî bî, divê pergara **ku**-yê jî di serê wê de bê. Weke:

- Wê Restem bê **ku** dixwênî.

Mirov dikarî pergara **wê**-ya nehatî jî, piştî **ku**-yê bênî. Weke:

- Wê Restem bê, *ku* **wê** dixwênî.

Werbêj: *Wê Restem bê, ku wê dixwênî.*

**Wê**: Pergara nehatî ye.

**Restem**: Serpeyv e.

**Bê**: Bi + hê.

**Bi**: Pergara nehatî ya babûnî ye.

**Hê**: Demhawa nehatî ye.

**Ku**: Pergara xuyabengî ye.

**Wê dixwênî:** Fêrpeyv in. Ev herdu li ser hev, ji bo Restem dibine xuyabeng.

Vêca mirov dikarî di serê hemî vanên me gotin de pergara **û**-yê jî bênî. Weke:

- Restem hat/ Restem xwend **û** dibêjî...
- Restem wê bê/ Restem wê bixwênî **û** ku dihejî.

Lê çaxê ku berpeyvê herdu fêrpeyvan demhawa derkêlî bin, hingî yê paşî nabî xuyabend, lê wê bibî civandî. Weke:

- Restem dixwênî û dikenî.

Çaxê ku mirov **û**-yê nebêjî, dîsa civandiyê pergara negotî ye. Weke:

- Restem dixwend, dikenî.
- Restem dihat, dikenî.

Di van herdu cihan de, dirist e ku mirov fêrpeyvê bikî xuyabeng jî. Heger derdemiyê fêrpeyvê paşî yê derkêlî ku berî demhawa berpeyvê bê, hingî divê ew fêrpeyv bibî xuyabeng. Weke:

- Restem çaxê hat, dikeniya. Yan: Çaxê Restem hat, dikeniya.

Va ye *çax* di herdukan de derdemî ye û berî berpeyvê ***hat***eyê hatiye. Fêrpeyva *dikenî*ya jî xuyabeng e.

**b)** *Dunavîyê Bêpergar:*

Xuyabengê fêrpeyv ê dunavî, bê pergar e. Ev digel **û**-yê û bê **û**-yê jî tê. Weke:

- Restem hat û serbilindn.
- Restem xwend, serbilind.

Heger mirov nîşana berpeyvê pê ve (bi)kî, divê pergara **ku**-yê berî wê bê. Weke:

- Restem hat **ku** serbilind e.
- Restem xwend **ku** serbilind e.

Va ye di vir de **e**-yek piştî fêrpeyvê **ku**yê di paşiya berpeyvê de hatiye.

Her fêrpeyvê ku dibî xuyabeng, çêdibî ku jê re şûnbêjek ji yên cihnîşanên bertilî jî werî. Weke:

- Restem hat ku wa dixwênî.
- Zilam hatin ku wane dipeyivin.

**Paşgotek:**

şûnbêjê Cihnîşan, du bêje ne: **Va** û **wa**.

Ev bi du haweyan in: **Fêrpeyvî** û heye **Cihpîvî**. Yên fêrpeyvî: **Ê** û **ha** ne. Ev ew in ku ji bo nav û şûnbêja berfireh dibin berpeyv, ji bo şûnbêja berfireh dibin pêrohnî û dûvikê şûnbêjê jî pê ve tê. Weke:

- Ez va me/ ez wa me.
- Tu va yî/ tu wa yî.
- Ev-ew va ye/ ev-ew wa ye.
- Em-hûn-evana-ewana va ne/ ...wa ne/ ...va nin/ ...wa nin.

Ev ji bo nêzîk û ne dûr, berpeyv in:

- Ez, va ha me.
- Tu, wê/wa/wî ha yî.
- Ev-ew wê/wa/wî ha ye.
- Em-hûn-evana-ewana wê/wa/wî ha ne/ ha nin.

Werbêja: *Ez, va ha me.*

**Ez**: Serpeyv e.

**Va**: Pêrohnî ye.

**Ha**: Berpeyv e.

**Me**: Dûvikê tenha ye.

**Restem wa ha ye/ zilam wa ha ne/ ev wa ha ye/ evana wa ha ne**: Serpeyva li pêş in.

**Wa ha ye Restem/ wa ha ne zilam/ wa ha ye ev/ wa ha ne evana**: Serpeyv li paş in.

Heger **ê** di pey şûnbêja berfireh de bê, hingî nema **va** û **wa** tên. Lê tenê wê **ha** di pey **ê** de bê. Weke:

- Ev**ê ha** ye/ Restem ev**ê ha** ye.
- Ev**a ha** ye/ Zîn ev**a ha** ye.
- Ev**ên ha** ne/ zilam-pîrek ev**ên ha** ne.

Werbêj: *Restem evê ha ye*.

**Restem**: Serpeyv e.

**Ev**: Pêrohnî ye.

**Ê**: Pergara pesnî ye.

**Ha**: Berpeyv e.

**Ye**: Dûvikê tenha ye.

Navê vî nifşî, *piştî pêrohnî* ye.

**PER 5**

**Karpêderê Dûker:**

Çaxê ku karpêderê dûkerê pesnî yê sernav li pêş neyê, (mîna vanên li jêrê çêdibin) weke:

- Restem hat bi serbestî.
- Restem hat bi dilxweşî.
- Restem çû ji çavsorî.
- Restem lê xist ji çavsorî.
- Restem raza li hêwanê.
- Restem berda li hêwanê.
- Restem bangda di lûlê de.
- Restem avakir di bajêr de.

**PER 6**

**Fêrpeyvê Berpeyv:**

Fêrpeyvê Berpeyvê ne derkêlî ku pergara **û** yê berî wê neyê weha ye. Weke:

- Restem hat.
- Restem rûnişt.
- Restem raza.
- Restem rabû.

Va ye fêrpeyvên *hat, rûnişt, raza* û *rabû*-yê berpeyv in û bê pergara **û**-yê çêbûne.

**PER 7**

**Berpeyvê Nav:**

Nav piştî fêrpeyvê nav, bê pergara **û**-yê tê. Weke:

- Restem baş e.
- Restem paqij e.
- Restem hêja ye.
- Restem xweşik e.

Va ye *baş, paqij, hêja* û *xweşik* berpeyvê bê pergar in.

**PER 8**

**Xuyabengê Valatî:**

*Xuyabengê Valatî* ew e ku piştî berpeyvê demhawe ku pergara **bê** bikevî ser navekî, tê. Weke:

- Restem hat **bê** serî.
- Restem xwend **bê** çav.

Hem çaxê **bê** bikevî ser fêrpeyvê û **ku**-yek di pey de bê. Weke:

- Restem hat **bê ku** binerî.
- Restem lê xist **bê ku** bipirsî.

## 09-FÊRPEYVÊN PEYREW

*Fêrpeyvên Peyrew* ew in ku piştî pergarê di navbera du fêrpeyvan de tên.

**Fêrpeyv 1:**

Fêrpeyvê ku piştî **bo**-yê, yan piştî **ji bo**-yê tê, piştî **bo**-yê navê kit jî tê. Weke:

- Restem hat **bo** bipirsî/ Restem hat **ji bo** bipirsî.
- Restem hat **bo** te/ Restem hat **ji bo** te.

Fêrpeyvê piştî **bo**-yê dikevî cihê bêjemakê û dibî balxwegirê **bo**-yê û wê (bo) girêdayê bi demhawa berî xwe ve dike. Çaxê piştî **bo**-yê kit jî bê, dîsa bi demhawa berî xwe ve girêdayê bi **bo**-yê ve ye.

**Fêrpeyv 2:**

Fêrpeyvê ku piştî **ku** û **da**-yê tê, timî fêrpeyvek berî wê û yek piştî wê tê, lê *kit* di pey wan de nayê. Weke:

- Restem hat **da** li te xî/ Restem hat **ku** tu lê xî.
- Restem xwend **da** bibî mamoste/ Restem xwend **ku** bibî mamoste.

**Awirek:**

Mirov karî *fêrpeyvê paşî* bêjî bê ku mirov van hersê pergaran (*bo-ji bo, ku, da*) bidevênê û dîsa bi wê vînê bî. Hingî mirov bêjî *fêrpeyvê peyrewê hodeyî/ boderî*yê *pergarnegotî*. Weke:

- Ez hatim bixwînim.

Yanî *ez hatim* **da ku bo**/ **ji bo** *bixwînim*. Ev, *hodeyê negotî* ye.

Vêca herdu fêrpeyv çêdibin **babûnî**, weke *ez hatime ku bixwînim*.

Yek çêdibî *bêbûnî*, yek *babûnî* û çêdibî *vayî*.

Weke:

- Ez hatime **ku** nexwînim/ ez nehatime **ku** bixwînim.

Çaxê herdu bêbûnî bin, herdu dibin babûnî. Weke:

- Ez nehatime **ku** nexwînim.

Yanî *ez hatime ku bixwînim*. Lê nexwendin tenê nabe xwendin û tiştên dî jî. Yanî ev tenê bê masûr e.

**Fêrpeyv 3:**

Fêrpeyvê piştî **yan**-ê û navê piştî **yan**-ê. **Yan** du caran tê berî *fêrpeyvê pêşî* û berî *fêrpeyvê paşî* û dibêjî ku yekî ji herdukan ji xwe re bibijêre. Ji ber wilo navê wê bûye *pergara bijarî*. Weke:

- **Yan** tê ji dibistanê derkevî, **yan** tê bixwênî.
- **Yan** tê rûnî, **yan** tê herî.

Mirov karî ji bo bersiva bijartinê fêrpeyveke siyem jî bênî. Weke:

- **Yan** tê rûnî **yan** tê herî, wisa li ser piyan nabe.

Hem **yan** digel du fêrpeyvên dunav tê, weke:

- **Yan** tu baş î, **yan** ew baş e.
- **Yan** tu baş î, **yan** tu ne baş î.
- **Yan** tu ne baş î, **yan** tu baş î.

Hem **yan** çêdibî ku yek ji herdu berpeyvan dunavî û yê dî demhawe bî. Weke:

- **Yan** tu kor î, **yan** tu nehatiye.
- **Yan** tu nehatiye, **yan** tu kor î.

Çêdibî ku mirov pergara **û**-ya civîndar jî bi **yan**-a paşî re bênî. Weke:

- **Yan** tu kor î **û yan** tu nehatiye.

Hem tê digel du navên kit û fêrpeyvek berî **yan**-ê û piştî wê tê. Weke:

- Yek ji me divê ku herî, **yan** tu **yan** Restem.
- **Yan** tu **yan** Restem, divê yek herî.

**Fêrpeyv 4:**

Fêrpeyvê piştî **çi**yê û navê piştî **çi**yê *yeksan*.

Ev jî weke **yan**-ê dikevî ser du fêrpeyvan û dikevî ser *dunavî*yê. Vêca çaxê ku herdu serpeyv ne yek bin, divê demhawe bi hebûn û nebûnê ji hev bin.

Çênabî ku yek hebûn bî û yek nebûn bî, weke:

- **Çi** Restem bê, **çi** Xusro bê.
- **Çi** Restem neyê, **çi** Xusro neyê.

Lê ev çêdibî, weke:

- **Çi** Restem bê, **çi** Xusro neyê.
- **Çi** Restem neyê, **çi** Xusro bê.

Çaxê **çi** bikevî ser du navan jî, divê herdu nav ne ji hev bin. Weke:

- **Çi** Restem **çi** Xusro, herdu jî baş in.
- Herdu jî başin **çi** Restem, **çi** Xusro.

Çaxê du nav ji hev bin, **çi** çênabî. Weke:

- **Çi** Restem, **çi** Restem.
- **Çi** Restem bê, **çi** Restem bê.

Çaxê serpeyv yek bî û demhawe ne yek bî, di hebûn û nebûnê de çêdibî. Weke:

- **Çi** Restem bê, **çi** nê.

Heger **û** bê, **çi** bi tevan re çêdibî, lê hingî bê kar e. Weke:

- **Çi** Restem bê **û** **çi** Xusro bê.
- **Çi** Restem bê **û** **çi** Xusro nê.

Naxwe ev pergara **çi**-yê, dibêjî weke hev e û herdu fêrpeyv yek in. Ji ber wilo navê wê **yeksan** e, yanî yekhawe ye.

**Sergotek:**

Ez vîna wê dibêjim. Ya vînî, yanî tiştê di vîna dilê min de ev e: Yan ya *hunî*, yanî ya hindirwê dilê min. Yan ya *winî*, yanî ya winda di dilê min de, yan ya *nû.* Yanî ya *vînî* ya *hunî* ya *winî* û ya *nû*.

**Fêrpeyv 5:**

Fêrpeyvê piştî **yanî** û kitê piştî wê.

Ev carekê di navbera du fêrpeyvan de, yan du navan de, yan du pesnan de tê, ji bo ku vîna wê nas bikî. Ji ber wilo navê wê *vîndîyar* e. Yanî vîna wê, tiştê berê didî xuyakirin bi yê piştî xwe. Weke:

- Te ew kuşt, **yanî** te gelkî lê xist.
- Te ew daxist, **yanî** te ew nizim kir.
- Te qad kola, **yanî** te cot kir.

Hem **yanî** di navbera du kitan de tê. Weke:

- Ev gewr e, **yanî** sipî ye.
- Ev hilû ye, **yanî** şahîk e.
- Agir biv e, **yanî** şewat e.

Va ye di van herdu cihan de, çîna yê pêşiya xwe diyar dikî bi yê piştî xwe. Yanî berê xuya ye, dûvre bi tengî xuya dibî.

**Fêrpeyv 6:**

Fêrpeyvê piştî **lew-lewma-lewra**. Ev hersê bi yek vînê ne û tim di navbera du fêrpeyvan de tên. Lê di navbera du kitan de nayên. Ew jî bi vîna **bo**-yê tên. Yanî beriya wan dibî **hode** ji bo paşiya wan. Weke:

- Bavê te hatiye **lew** (ji lew) **lewma/ lewra** madê te xweş e.

- Te tiştekî xweş bihîstiye **lew** (ji lew)**/ lewma/ lewra** tu dikenî.

- Perê te hene **lew** (ji lew)**/ lewma/ lewra** şîva te xweş e.

Naxwe vîna van dibî têderxistin. Yanî her wekî dibêjî, *ez dizanim*. Ev tişt bûye **hode**ya vîyê dî.

Vêca çi fêrpeyvê ku piştî yek ji van pergaran bê, her yek di werbêjê de li gor yê berî xwe ye. Yanî heçî yê berê berpeyv bî, ew jî berpeyv e.

**Fêrpeyv 7:**

Fêrpeyvê nav ê piştî rengnavê **weke-mîna-temet**. Ev hersê ji bo dêhindariyê ne. Yanî dibêjin ku ev tiştên beriya me, dihêna yê piştî me ye. Weke:

- Restem **weke** Xusro ye.
- Restem **mîna** Xusro ye.
- Restem **temet** Xusro ye.

Weha reng e navên dêhindarî weke rengdêhinhawe ye. Ev rengê dêhnê, hawê wî ye û ev hemû di navbera du navên kit de tên.

**Fêrpeyv 8:**

Fêrpeyvê piştî **hem**-ê. Ev fêrpeyv du caran tê; geh bi du fêrpeyvan, yan digel fêrpeyvek û navekî kit tê. Weke:

- **Hem** Restem hatiye, **hem** Xusro hatiye.

Ev weha jî çêdibî:

- **Hem** *Restem hatiye,* **hem** *Xusro.*

Heger fêrpeyv li pêşî bê û dûvre **hem** bikevî ser du navên kit jî. Weke:

- Herdu hevalên min hatin, **hem** Restem **hem** Xusro.

Naxwe divê berê di fêrpeyvê de şopa wan bihurtî bî. Çêdibî ku du navên kit pêşî bên û dûvre fêrpeyv bê. Weke:

- **Hem** Restem **hem** Xusro hatin.

Weha reng e **him** û **hin** jî tên. Ji vê re *civîndarê ducarî* tê gotin. Weke:

- **Him hin** Restem hat, **him hin** Xusro hat.

**Fêrpeyv 9:**

Fêrpeyvê piştî **û**-yê û kitê piştî wê. Ev ji bo balcivînê geh di nîvê du fêrpeyvan de û geh di nîvê du navan de tê. Çaxê herdu kit bin, divê fêrpeyv yan berî wan yan piştî wan hebî. Weke:

- Restem hat **û** Xusro hat.

Ev, navbera du fêrpeyvan e. Weke:

- Herdu hatin; Restem **û** Xusro.
- Restem **û** Xusro herdu hatin.

Çaxê weke niha gehe **jî** piştî kitê paşî neyê, ew dibî **masûr**. Naxwe ku mirov bêjî: *Restem û Xusro hatin*. Yanî herdu tenê hatin.

Çaxê mirov bêjî: *Restem hat û Xusro jî hat*. Yan mirov bêjî: *Restem û Xusro jî hatin*. Yanî hinekên din berî wan hatine, dûvre Restem û Xusro jî hatin. Naxwe ev ne *masûr* e.

**Fêrpeyv 10:**

Fêrpeyvê piştî **da**-ya *kitpeyva vêdeniyê*. Ev, di navbera du fêrpeyvan de bi vîna **bo**-yê tê. Yanî fêrpeyvê pêşî dibî **hode**ya fêrpeyvê paşî. Weke:

- Ez hatim, **da** bixwînim.
- Restem dixwînî, **da** bibî mamoste.
- Restem hat, **da** li te xî.

## 10-FÊRPEYVÊN DUHEVAL

*Fêrpeyvê Nîvduheval* ew e ku mirov karî wê nebêjî. Heke mirov bêjî, cihê wê li paşiya fêrpeyvê ye. Belê tê gotin di nîvê du tiştên hevalên hev de, weke di nîvserpeyv û berpeyvê de:

- Restem, qey hûn zanin miriye? (Restem miriye).

Navbera gotin û bergota wê de, weke:

- Dibêjî, xwedêgiravî, *ez çûme jor* (çûye jorê).

Navbera sûnd (sond) û peysûndê de, weke:

- Ev kur, bi Xwedê gelkî hêja ye.
(Ev kur gelkî hêja ye).

Navbera bang û bersiva bangê de, weke:

- Wa Restem. Malavao, vir de were.
(Wa Restem! Bi vir de were).

Navbera pirs û bersiva wê de, weke:

- Ma hû zanin, gelî camêran, ez kî me!
(Ma hûn zanin ku ez kî me?).

Navbera pesingîr û pesinbêjê de, weke:

- Ev kurê, weke hûn dibêjin, baş. (Ev kurê baş).

**Parpênas:**

Ev *parpênas* ji bo bidî zanîn berî berpeyvê tê ku serpeyv tev an hinek an çendek ku di berpeyvê de bûne hevyek. Lê divê ku serpeyv navê nifş bî. Ev jî du nifş in.

a) **Hijmarî**.
b) **Nehijmarî.**

**a)** *Hijmarî*:

Ev hijmarek e ku du caran tê gotin. Weke:

- Zilam *çare çar* hatin.
- Zarok *do do* hatin.

Heta hezarî jî wilo çêdibî.

**b)** *Nehijmarî*:

Eva nehijmarî du nifş in:

1- **Bêpergar**.

2- **Pergarî**.

**1)** Navên Bêpergar, ev in:

- *Hemî, hin, hinek, hindik* û *gelek.*

**Navên zaf:**

- *Giş, giştik, pir* û *zor.*

**Navên yeker û duker:**

- *Seraser, derander, her du, her sê, her kes, her nifş* û *yekcar.*

**Navên xwepêgir:**

**-** *Pareke wan, sê parên wan, sêyeka wan, dehyeka wan, gelekê wan* û *hindikê wan.*

**Navên balcivîn:**

- *Ket û ber, ser û bin, rast û çep, kiş û mat û hin* û *hin.*

**Navên ducarî** yên dukerîyên yekrengî yên pergarî:

- *Mal bi mal, roj bi roj, sal bi sal, deq bi deq, hin bi hin* û *gav bi gav.*

**2)** Navên Pergarî yên yekker:

**-** *Ji berê ve, ji binî ve, ji serî ve* û *ji hawîr ve***.**

**Navên hevalî** digel **bi**-yê:

- *Ew bi xwe, ew bi gind ve, ew bi pez ve, ew bi mal ve* û *ew bi tenha.*

**Navên hevalî** yên xwepêgir:

- *Bi malê xwe ve, bi tenha xwe, bi tenha kiras* û *bi tenha derpê.*

**Navên xwepêgir** ên negotî:

- *Hêzmenda kurdî hat*. Yanî, qasidê hêzmenda kurdî hat.

**Navê gende:**

- *Mala Restem hatin***.** Yanî hinek ji mala Restem hatin.

Navên kêmî hev:

Ev nav ew e ku tîpa **m**-yê di cara diwa (diduyan) de dikevî serê nav:

**-** *Hasin masin, hasin û masin.* Yanî hasin, tiştên nêzîkê hasin û yên kêmê hasin.

Weha reng e pesin, hawegîr û her tişt, ji bilî tiştên berî **m**-yê ku di serî de bî, hingî mirov tiştê wilo dibêjî, weke:

- Mast çênabî.

Lê ku tu bêjî:

- *Mast û mast!*

Belê tê bêjî:

- *Mast û tiştê wilo*.

Hem demhawe jî çênabî, weke:

- *Bixwêne mixwêne*.

**Bûn û Kirin**

Karê **bûn** û **kirin**ê bi du hawan çêdibî:

***Bûn:***

**a)** *Hawê Yekê*: Ev ew e ku serpeyv û berpeyv berî wê bên. Dîsa navên wan **serhawe** û **berhawe** ne, ne *karjêder* û *karpêder* in.

Divê ku berpeyvê wê pesnek ji her şeş nifşên pesnan bî û navê demhawa **bûn**-ê jî dibî *xwedîhawe*. Weke:

- Restem baş bû.

Werbêj: *Restem baş bû.*

**Restem**: Serhawe ye.

**Baş**: Berhawe ye.

**Bû**: Xwedîhawa bihurî ye.

Vîna vê fêrpeyvê, ev e: *Restem berê ne baş bû, lê niha baş e*. Naxwe navê vê **hemberî** ye. Yanî *başî bûye* hemberê *nebaşi*yê.

**b)** *Hawê Diduyan:*

Divê berhawe piştî **bûn**-ê bê. Heger berhawê piştî wê *pesin* bî, navê wî (pesin) *pesnê gende* ye. Yanî ne weke weqûfê ye, yan bi zorê çêbûye, yan bi rûmetê ye, yan ji neguhdanê ye. Yanî ne li gorî wî pesnî ye. Weke:

- Restem bû baş.

Werbêj: *Restem bû baş.*

**Restem:** Serhawe ye.

**Bû:** Xwedîhawe ye.

**Baş:** Berhaweyê li paş e.

Vîna wê ev e: *Restem ne ku rastî baş e, lê hinekan bi dilxwazî ew baş kirine.*

Heger piştî **bûn**-ê nav hat û serhawe **navê kes** bî, yan ê **nifş** an **hawegîr** bî, ew nav dibî bi vîna **dêhngirî**. Yanî ne rastî ye, lê dêhna wî lê dikevî. Weke:

- Restem **bû** dar. Yanî *Restem weke dar hişk bû*.
- Restem **bû** ker. Yanî *Restem weke kerê bi ya min dikî.*
- Zilam **bû** dar.
- Serdar **bû** dar.

Heger *berhawê paş* nav bî û li *serhawe*yê bê siwarkirin, dîsa hemberî ye. Weke:

- Restem **bû** zilam. Yanî *Restem berê ne zilam bû, lê niha bûye zilam*.
- Restem **bû** serdar. Yanî *Restem berê ne serdar bû, lê niha bûye serdar.*

Weha reng e demhawa **gerî** û **zîvirî** jî bi her tiştên xwe ve weke *bûn*-ê ne. Weke:

**Gerrî:**

- Restem baş **gerri**ya.
- Restem **gerri**ya baş.
- Restem **gerri**ya dar.
- Restem **gerri**ya zilam.
- Restem **gerri**ya serdar.

**Zîvirî:**

- Restem baş **zîvirî**.
- Restem **zîvirî** baş.
- Restem **zîvirî** dar.
- Restem **zîvirî** zilam.
- Restem **zîvirî** serdar.

Weha reng e demhawa **ma**-yê ji *man*ê, lê bi vîna xwe ya *herheyîn* e. Weke:

- Restem baş **ma**ye.
- Restem **ma**ye baş.
- Restem **ma**ye dar.
- Restem **ma**ye zilam.
- Restem **ma**ye serdar.

Weha reng e *bihurî, derkêlî, nehatî* û kotekê wan jî wilo ne. Weke:

- Bû/ bûye/ dibî/ wê bibî **baş**.
- **Baş** bibe/ bibe **baş**.

Weha reng e *bêbûn*ê wan. Weke:

- Restem ne baş **bû**ye.
- Restem **bû**ye ne baş.
- Restem ***bibe*** ne baş.
- Restem ne baş *bibe.*

Vêca ev her sê-çar demhawê ku me gotin, yekxwedî bûn. Yanî xwediyê **bûn**-ê û pesin herdu yek in.

***Kirin:***

Ev duxwedî ye. Yanî yê ku dikî û yê ku pesin digirî başqe ne. Yê pêşî, *serhawe* ye, yê dî *berhawe* ye. Pesnê di pey wan de, *pesnê berhawe* ye. **Kir**, *demhawe* ye. Weke:

- Min ew baş **kir**.

Pesin li pêş e, yanî pêşî ne baş bû.

Weha reng e çaxê ku ev tê *gerîn, zîvirîn* û *hiştin* tên, van digerênin duxwedî. Weke:

- Min ew **gerrand** baş.
- Min ew **zîvirand** baş.
- Min ew **hişt** baş.

- Min ew baş **gerrand**.
- Min ew baş **zîvirand**.
- Min ew baş **hişt**.

- Min ew da **gerrandin.**
- Min ew da **zîvirandin.**
- Min ew da **hiştin.**

Hemû tiştên ku **bûn, kirin, gerîn, hiştin** û **zîvirîn** dikevine ser wan, tiştên ku berî wan tên û tiştên ku piştî wan tên wilo ne.

**Kerbestin**:

Yanî bestina keran bi heve/ girêdana keran bi heve. Bi çi hawî çêdibî û bi çi bi heve têne girêdan?

Vêca çi tiştê bi heve bêne girêdan, çi bi navan, çi bi pesnan, çi bi pergaran ew ê hemî berî yan piştî van demhawan bên. Çi yên dusêxwedî bin û çi yên yekxwedî bin:

**Dunavê bêpergar:**

Dunavên bêpergar ew in ku **ker**ê pêşî hijmar bî û **ker**ê dî nav bî. Weke:

- Duserî, dutilî, şeşkezî...

Yan navê diwan (didu) ji her şeş aliyan bî. Weke:

- Sersor, serjêr, berjor, vajî, bingeh, serban, berder, bermal...

Navên ducar ên pêhildayî. Weke:

- Gulgulî, çikçikî...

Hawegîrê ducar, weke:

- Pikpikî, pixpixî, piçpiçî...

Nav û hawegîrên ku **e** di paşî de bî. Weke:

- Birbir**e**, virvir**e**, kurkur**e**, çirçir**e**, hibhib**e**, xîpxîp**e**, segseg**e**...

Navên ducar ku **î** di paşî de bî. Weke:

- Serser**î**, berber**î**, vinvin**î**...

Hijmara ducar, weke:

- Çare çar, kit kit, yek yek, hezar hezar...

Navên ducar ku **okî** di paşî de bî. Weke:

- Vinvin**okî**, çirçir**okî**, hirhir**okî**...

Pesnê ducar ku **e** di paşî de bî. Weke:

- Sorsor**e**, korkor**e**, harhar**e**...

Navên ducar ku **îk** di paşî de bî. Weke:

- Sorsor**îk**, kerker**îk**, pirpir**îk**...

**Balxwegira Paşketî**

Ji *balxwegira paşketî* re, *balxwegira pergaravêtî* jî tê gotin. Du navên balxwegira pergaravêtî hene ku **ok** û **ik** di paşiya wan de tê. Weke:

- Gahingil**ok**, qûngul**ok**, şambûr**ok**.
- Qalûngur**ik**, berdûv**ik**, berdil**ik**.

Pesingîr û pesinbêjên bêpergar, weke:

- Rûsor, gulîzer, gulgeş, şênîzêr.

Yanî *rûyê sor, gulîya zer, gula geş û şênîya zêr*. Vajîyê wê, weke:

- Sordîm (sordêm), zergulî, geşgulî, zêrşênî.

Bêjemakên ji hev digel hawegîrê peymak, weke:

- Xwarinxwer.

Bêjemak û hawegîrê peymak ên ne ji hev, weke:

- Xwarinda, avêtinker, gotinbir...

Nav digel hawegîrê peymak, weke:

- Nanda, tîravêj, kêrşikên...

Pergara digel navê ku **ê** di serî de bî, weke:
- **Ê** li vir, **ê** li jor, **ê** ji der...

**Ê**-ya dunav ku pergar di nêvî de bî, weke:
- **Ê** dev **ji** hev, **ê** xanî **li** wir.

Ev hawe ku bê **ê** bî, dîsa pergar di nêvî de tê, weke:
- Dev **ji** hev, xanî **li** wir...

Ev hawe ku digel hawegîrê yekxwedî û yê dusêxwedî bî, weke:
- Dev ji hev çivî, xanî li wir ketî, pez li wir kirrî, nan li wir xwarî...

Ev hawe ku digel **bûn**-ê û **kirin**-ê bî, weke:
- Li vir **biwî**, ji jor **biwî**, dev ji hev **biwî**, kur li wir **biwî** (Biwî: Bûye).
- Li wir **kirî,** li jor **kirî**, dev ji hev **kirî**, dest ji laş **kirî**.

Heger pergar digel derwar û hawegîrê peymakê bî, weke:
- Li wir ketî, li wir biwî, li wir kirî, ji wir çiwî (çûyî)...

Ev hawe ku digel hawegîrê dusêxwedî bî, weke:
- Li wir kirrî, ji wir firotî...

Pergara digel *derwar, nav* û *kir* û *bûn*-ê, yan *hawegîrê yekxwedî* û *dusêxwedî* bî. Weke:
- Li wir bar kirî, li wir bar biwî, ji wir pez firotî, ji wir çek firotî...

Heger hawe nav, pergar, derwar û hawegîrê yek-dusêxwedî bî, weke:

- Bar li wir ketî, pez li wir kirrî.

Nav, pergar, derwar, pesin û hawegîrê yek-dusêxwedî, weke:

- Gul li wir zer çilmisî (5 perçe*)
- Çek li wir xweş firotî.

Nav, pergar, derwar û nav, hawegîr, hersê hawe, weke:

- Gul li wir ji dar ketî (6 perçe).
- Pez li wir ji gund kirrî.
- Nan li gund bi dest ketî.
- Nan li bajêr bi pere kirrî.

Heger *bûn* û *kirin* digel pergarê bin, weke:

- Pê **kirî**, pê **biwî** (bûye), jê **kirî**, jê **biwî.**

Pergara digel hawegîrê yek-dusêxwedî, weke:

- Jê ketî, lê firotî, lê dayî, pê kolayî, jê avêtî, tê re çiwî (çûyî).

Heger *bûn* û *kirin* piştî herdu çar perçan bin, weke:

- Ji wir bar kirî, ji wir mal çiwî, dest ji wir kirî, dest ji wir biwî...

Heger *bûn* û *kirin* digel pênc perçan bin, weke:

- Gul li mal zer kirî.
- Gul li mal zer biwî.

* Tiştek ji "5 perçe" nehat zanîn, lê dibe ku ev bin: *Nav, pergar, derwar, pesin û hawegîrê yek-dusêxwedî* (Gul+li+wir+zer+çilmisî).

Heger *bûn* û *kirin* digel şeş perçan bin, weke:

- Gul li hewşê ji dar kirî.
- Gul li baxçe ji katê biwî.

Weha reng e çaxê ku mirov tenê pesinbêjê yan digel balxwegîrê, yan balxwegîr tenê, yan digel pesinbêjê bi van hawan re bêjî, yê şeş digel sê pesin û sê balxwegiran tê, weke:

- Ê gula min a geş, li hewşa min a fireh, *ji dara min a bilind kirî.*

Vêca mirov çiqasî pesin û balxwegiran dirêj jî bikî, çêdibin. Weke:

- Ê gula kurê kurê min a fireh î geş, li hewşa kurê axê ya fireh î mezin, ji bexçê kurê kurê min ê himbiz û tarî kirî.

Mirov karî derwar û derdemî jî bixe nava wan, weke:

- Ê ku wê roja înê ya heyva Sibatê li bajarê Qamîşlokê yê xweş î hêja, gula kurê kurê min a fireh î geş, li hewşa kurê axê ya fireh î mezin, ji bexçê kurê kurê min ê himbiz î tarî kirî.

Fêrpeyvên ku hemî dês di wan de hebin, ev in:

- Ê ku.
- Roja.
- Înê.
- Li bajarê Qamîlokê.
- Gula min.
- Ya geş.
- Bi destan.
- Ji darê.
- Bi xurtî.
- Rûgeş.
- Xist.
- Daxist.

- Weşand.
- Xeritand.
- Avêt.

**Kerhingavtin:**
- Ev ew e ku du nav, nav û pesin û vajiyê wan.
- Nav û hawegîrê yekxwedî.
- Nav û hawegîrê dusêxwedî.
- Bêjemak û hawegîrê wê bi xwe.
- Bêjemak û hawegîrê ne ji wê.
- Pergar û hawegîrê yekxwedî
- Pergar û hawegîrê dusêxwedî
- Alî û nav.
- Nav û makê sitewr.
- Navê stewr û pesin.
- Vajiyê wan (stewr û pesin).
- Pergar û derwar.
- Pergar û derdemî.
- Du hijmar.
- Hijmar û nav.
- Bêrohnî û pêrohnî.
- Ser serî kir - bûn.
- Rû geş kir - bûn.
- Xwarinxwer.
- Xwarinkir.
- Pêçiwî (pêçûyî)/ lê mirî/ jê ketî.
- Pêgirtî/ jêkirî/ lêbirî.
- Serban
- Serpars.
- Êrîş xurt kir - bûn.
- Xurt êrîş kir - bûn.
- Li mal kir - bûn.
- Ê hingî.

- Yek yek/ çar çar kir - bûn.
- Sê serî kir - bûn.
- Ev xanî.
- Nav û kir/ ax kirin.
- Nav û bû/ ker bûn.
- Pesn û kir/ sor kirin.
- Pesn û bû/ ser bûn.
- Maka sitewr û kir/ lez kirin.

**Kerguvaş:**

*Kerguvaş* ew e ku du bêje bi heve bêne gotin û tiştek nakevî navbera wan û nabin perçek ji yê werbêjê. Weke:

- Çi pergar û nav 1.
- Çi pergar û pesin 1.
- Çi pergar û bêjemak 1.
- Çi pergar û şûnbêj 1.
- Çi nav û her sê pergar 3.
- Çi bêjemak û hersê 3.
- Çi pesin û hersê 3.
- Çi şûnbêj û hersê 3.
- Çi nav û hawegîrê peymak 1.
- Çi pergar û bêjemakê sitewr 1.
- Xwe û pergar.
- Xwe û nav.
- Xwe û pesin.
- Xwe û bêjemakê sitewr.
- Xwe û hawegîrê peymak ê duxwedî.
- Yên neçêbûnê.

Tiştên ku guvaşe jê çêdibin, ev in û hemî berî **kirin**-ê tên:

- Pergar.
- Nav.
- Pesin.

- Bêjemak.
- Hawegîrê peymak.
- Bêjemakê sitewr ê yekxwedî, dusêxwedî.
- şûnbêja berteng.
- şûnbêja xwe.
- Bê.
- Ba.
- Ducarkirin.
- Hijmar.

Tiştên ku *kirin* û *bûn* dikevine ser wan.

**Kirin,** dikeve ser van:

- Pesin.
- Nav.
- Pergar.
- Nav û pesin û vajiyê wan.
- Makê sitewr.
- Hawegîrê peymak ê duxwedî.
- şûnbêja **xwe** digel pergarê.
- **Xwe** digel pergar û pesin.
- **Xwe** digel pergar û nav.
- **Xwe** digel pergar û maka sitewr.
- **Xwe** digel **bê**, digel nav.
- **Xwe** digel **bê**, digel makê sitewr.
- Nav û pergar.
- Pergar û bêjemakê dusêxwedî.
- Sor kirin.
- Bar kirin.
- Lê kirin.
- Rû geş kirin.
- Geş rû kirin.
- Êrîş kirin.
- Zane kirin.
- Xwe pê kirin.

- Xwe pê dûrkirin.
- Xwe pê nav kirin.
- Xwe pê şeh kirin.
- Xwe pê êrîş kirin.
- Xwe bê zer kirin.
- Xwe bê zor kirin.
- Çav lê kirin.
- Bi xwarin kirin.

**Bûn,** dikevî ser van:
- Sor (sorbûn).
- Ban (banbûn- lê dibane).
- Lê (lêbûn).
- Rûgeş (rûgeşbûn).
- Zane (zanebûn).
- Bi xwarin (bixwarinbûn).

**Kirin**, di pey van de nayê:
- Bêjemakê zayinî yê yekxwedî.
- Bêjemakê zayinî yê dusêxwedî.
- Hawegîrê peymak ê yekxwedî.
- Hawegîrê bi nîşan.

**Bûn**, di pey van de nayê:
- Bêjemakê dusêxwedî.
- Bêjemakê yekxwedî.
- Hawegîrê sitewr.
- Hawegîrê peymak.
- şûnbêja *xwe* û *hev*-ê.

**Bûn**, di pey van de tê:
- Pesin (sorbûn).
- Pergar (pêbûn).
- *Bê* û nav (bêdevbûn).

- *Ne* û pesin (nesorbûn).
- Bêjemakê sitewr û **ne** (nekarbûn).

**Ne**, ji bo nebûna demhawe, pesn û bêjemakan tev e. Weke:
- **Ne**hat (nehat).
- **Ne**xwar (nexwar).
- **Ne**baş (nebaş).

**Na**, ji bo nebûna demhawa nehatî ye, weke:
- **Na**çî (naçî).
- **Na**xwî (naxwî).

**Ve**, ji bo birina bi alîkî de dikevî ser bêjemak û demhawa dusêxwedî. Yanî belakirina ji hev. Weke:
- *Çirandin*. Yanî (bi) dirêjkî kire du qet.
- *Veçirandin*. Yanî gelkî çirandin.

Pergava **VE**yê ji bo anîna bi paş de dikevî ser demhawa yekxwedî. Weke:
- Geriya. Yanî zîvirî.
- **Ve**geriya. Yanî bi paş de hat.

Pergara **VE**yê, ji bo dûrkirina ji xwe, dikevî ser demhawa duxwedî. Weke:
- Kişand. Yanî di destên wî de bû û kişand.
- **Ve**kişand. Yanî ji tiştekî dûr kir.

**Ve**, ji bo valabûnê, dikevî ser **kirin** û **bûn**-ê. Weke:
- **Kir**. Yanî tiştek kir.
- **Vekir**. Yanî hişte vala (vala hişt).

**Ve**, ji bo kolanê, digel **dan**-ê. Weke:
- *Vedan*. Yanî kur (kûr) kirin, vala kirin.

- *Kiras vede*. Yanî hiland.

**Karguher:**

Eger ev pergarên **bi, di, li** û **ji**-yê digel çi demhaweyê bên, vîna wê jî diguherin. Weke:

- *Lêhatin*. Keysa li wî anî.
- *Jêhatin*. Karî tiştan bikî.
- *Pêhatin*. Çêbû: şîr pê hat.

**Çûn:**

- *Lê çû*. Rengê wî ye li wî çûye.
- *Jê çû*. Ji wî/wê qeherî.
- *Pê çûn*. Bi wê êşê mir.
- *Tê çû*. Hat kuştin.
- *Tê çû*. şaş bû.

**Xwarin:**

- *Lêxwarin*. Li gor wî ye- lê dixwe.
- *Pê xwarin*. Heval xwarin.
- *Jê xwarin*. Hêmanî.

**Kirin:**

- *Li te kir*. Wergirt.
- *Ji te kir*. Qut kir.
- *Bi te kir*. Sitem kir.
- *Di te kir*. Xiste hidirû.

**Bûn:**

- *Bi te bû*. Ziyan bû.
- *Ji te bû*. Qut bû.
- *Bi te bû*. Bo te ye.
- *Ji te bû*. Qut bû.
- *Li te bû*. Rijiya ser te.
- *Di te de bû*. Ketiye hindirû.

**Bê** û **ba** dikevine ser bêjemakê yek-dusêxwedî, bêjemakê sitewr û bêjemakê pesinîyê bi dûvik. Weke:

- Nav.
- Bûn û kirin.

**Ketin:**

- *Lê ket*. Kutayê.
- *Lê ket*. Kevir gihayê.
- *Jê ket*. Piçik ji jora tevî ket.
- *Jê ket*. Ji êşa wî/wê ket êşê.
- *Pê ket*. Lê xist/ bi êşê ket.
- *Pê ket*. Dest pê kir.

**Giha:**

- *Pê giha*. Ziyan ji ser bir.
- *Lê giha*. Mezin bû.
- *Tê giha*. Pê zanî.

**Kolan:**

- *Lê kola*. Xebat kir.

**Gerîn:**

- *Lê* ..... Pir di ....*

**Girtin:**

- *Lê girt*. Gazin jê kir.
- *Jê girt*. Bijart.
- *Pê girt*. Bawerî pê kir.

**Birrîn:**

- *Lê birrî*. Weke wî kin kir.
- *Jê birrî*. Dêhna wî lê heye.

**Kuştin:**
- *Jê kuşt*. Jê kêm kir.
- *Lê kuşt*. Jê kêm kir.

**Hildan:**
- *Tê hilda*. Gilih lê kir.
- *Lê hilda*. Qîr dayê.

**Xistin:**
- *Lê xistin*. Êşandin.
- *Jê xistin*. Daxistin.
- *Pê xistin*. Agir kirin.

* Destnivîsa vê mînakê nehate xwendin. Lê dibe ku weha be: *Lê + gerîn*, pir digerre.

**Da, ra** û **hil** dikevine ser demhaweyan, weke:

**Da** (ji bo birina bi jêrê ve)
- *Daxist*. Ji jor bire jêr.
- *Daket*. Ji jor çû jêr.
- *Dahişt*. Ji piyan çû qadê.
- *Dahişt*. Ji jor berda jêrê.
- *Dahêla*. Ji jor berda jêrê.
- *Danî - daanî*. Bi jêr de anî.

**Ra** ji bo pehnkirinê ye.
- *Raxist*. Li qadê behn dikî.
- *Raket*. Li qadê dirêj bû.

**Ra** ji bo bilindkirinê ye.
- *Rahişt*. Ji qadê bilind kir.
- *Rabû*. Bilind bû.
- *Rahêla*. Hilanî, bilind kir.

- *Raweşand*. Hilda û weşand.

**Hil** ji bo bilindî ye. Weke:
- *Hildan.*
- *Hilweşand.*
- *Hilkişand.*

**Rû** dikevî ser demhawan, ji bo gihandina qadê. Weke:
- *Rûnişt*. Nişte ser qadê.

**Kirin** û **bûn.**
- *Rû kirin/ rû bûn.*

## 11- ŞÛNBÊJA *HEV* A HERALÎ

Ev her çar pergara (bi, di, ji, li) û **bê, bo, gel** û **ji nû, kirin** û **bûn** dikevine ser *bêjemakê yek û dusêxwedî*. Weke:

- **Bi** hev girtin.
- **Bi** hev re avêtin.
- **Bi** hev re kirin.
- **Bi** hev re xwarin.
- **Bi** hev xistin.
- **Di** hev de çûn.
- **Di** hev re avêtin.
- **Di** hev re derbas bûn.
- **Ji** hev girtin.
- **Ji** hev re avêtin.
- **Ji** hev re kirin.
- **Ji** hev xistin.
- **Li** hev barandin.
- **Li** hev girtin.
- **Li** hev xistin (tişt).
- **Li** hev xistin (hev êşandin).

Weha reng e pergara **têkil, tevlî** û **digel** bi tenê û digel hev jî tên.

Werbêj: *Têkilî hev bûn.*

**Têkêl**: Derwara gende (ne rast).

**Î**: Pergara balxwegir.

**Hev**: Balxwegir.

**Bû**: Demhawa zîvrane.

*Derwara gende ya nerast* ew e ku xwepêgir pergarî bî û çengelê wê **î** ye, ne **ê**, **yo** û **ên** in. Piştî pergara **hev**-ê şûnbêjeke cihnîşan tê, weke:

- Digel hev çûn.
- Digel hev bûn.

- Digel van bûn.
- Digel wan hatin.
- Têkilî hev bûn.
- Tevlî hev kirin.
- Tevlî wan bûn.

Di vir de ew dûkerê pergarî dibî karpêderê pesingîr ê avêtî û şûnbêj dibî balxwegir. Weke:

- *Digel wan hatin*. Yanî **hatin,** hatineke digel wan e.

**Peygotek:**

*Pergara* **bi, di, li, ji, bo û bê** çaxê ne li paşiya fêrpeyvê bin, bi demhaweyê ve têne bestin. Weke:

- Ev **ji** vir hat.

Yan (bi, ji, li, di, bo, bê) bi pesnê bêmak ve têne bestin. Weke:

- Ew **li** vir baş e.

Çaxê (bi, di, li, ji, bo û bê) li paş bin, hingî digel demhaweke negotî dibin bestî û westina li pişt wan jî, heyîn e. Weke:

- Ez **li** vir im (Ez li vir westime). Yanî ez li vir heme.

## 12-PERGARÊ JÊREVANÎ

Ev pergarên nevanî ku **lo, no, ne** û **na** ne, bi vîna ku dûrî hiş in piştî pirsa nebûn û hebûnî tên. Weke yek bêjî:

- Tê herî seyranê?

Tê bêjî:

- **Lo** herê/ **no** herê/ **ne** herê/ **na** herê!

Yanî tu dibêjî: *Ev tişt ne herê ye û ez herê pê nakim*. Naxwe tu karî bêjî:

- **Lo** baş e/ **no** baş e/ **ne** baş e/ **na** baş e/ **ne** î baş e/ **ney** baş e/ **hew** baş e/ **bes** baş e.

Têgihana **bilî:**

Ev di serê fêrpeyvê û di paşiya wê de ji bo veqetîna hindikî ji gelekî digel **ji**-yê tê û bêyî wê jî tê. Weke:

- *Ji* **bilî** Restem, suxte hemî hatin.

Yan: - Suxte hemî hatin, *ji* **bilî** Restem.

**Vîna wê:** B*i hêl Restem* e, yanî Restem bi hêl e.

Yan: *Bi hil Restem*, yanî Restem hilde.

Yan jî: *Bê alî Restem*, yanî *ew ne li wî alî bibên e*.

Yan: *Bi* ***lo*** *Restem*, yanî *Restem bi lo ye*; bi na ye.

Têgihana **xeynî:**

- Suxte hemî hatin, **xeynî** Restem.
- **Xeynî** Restem, suxte hemî hatin.

Vîna wê:

- Xwe ne î. Yanî ne xwe yî. Goman e, an teqez e.
- Xwe ne yî, goman neyî; ne goman an xwe ne lê, ne xwe, ne Restem. Zilam hatin, xwe ne yî Restem.

Yanî, lê ne Restem; Restem nehat.

Xeyrî, xwe êrî, lê başqeyî Restem.

**Lê**, di navbera du fêrpeyvan û nebûnên dî de tê û yek dijê ya dî ye. Weke:

- Zilam hatin, **lê** Restem nehat.
- Zilam nehatin, **lê** Restem hat.
- Restem hat, **lê** Xusro nehat.
- Restem nehat, **lê** Xusro hat.

**Belê-welê**, weke **lê** ne û di her tiştî de vîna **belê** (bi lê) ne. Weke:

- **Lê** Restem nehat.

Yan ba **lê**, yanî tevlî **lê**.

Vîna **welê**, *lê* ye û *şiyarî* ya **belê**ya dijê berî xwe ye, weke:

- Restem nehatiye?
- **Belê,** hatiye.

Vîna wê: *Bê erê*, *bê elê* ye. Yanî gotin ne erê ye, **na** ye. Vêca bersiva nebûne, hebûne, ne erê, ne elê, yanî Restem hatiye.

**Hê-hêjî** di navbera du fêrpeyvan de tên, herdu dijê hev in û bi vîna *em li hêviyê ne* tên. Weke:

- Restem hat, **hê** Xusro nehatiye.

**Hêjî**, di pirsa diduyan de tê gotin. Weke:

- Restem hat, **hêjî** Xusro nehatiye.

Yanî ev du caran tu têyî û Xusro nehatiye.

**Dîsa**, di navbera du fêrpeyvên dijê hev de tê. Ev jî cara diduwan e, weke:

- Restem hat, **dîsa** Xusro nehatiye.

**Jî**, ji bo balcivînê û herdu fêrpeyvên ji hev tê, weke:

- Restem hat, Xusro **jî** hat.

Yanî di pey wî de bi hindikî hat.

**Hinek hevbabet û hevsan**

Varêke: Jihevbaşqeker.
Hinguvtin: Gihane hev.
Hevsanî: Hemî weke hev.
Hevbabetî: Tişta dibênî babetê hev.
Guvaştin: Du tişt bi heve dapiçandin.
Kerbestin: Girêdana bi heve ya li pey.
Paşpelandin: Hinik ji paş kêm e.
Nîvavêtî: (mînaka vê tune-nm)
Nîvçivandî-demhawe: Ku tîpek an du yan bêhtir, çi paşê paşî, serê yê pêşî û çi ji paşê serî tenê, çi serê yê paş tenê bî.

**Tîpguhertî:**

Ji bo sivikî tîpeke nerm bi yeke dî tê guhartin.
Weke **nav** ku bi çi ji *bêjemakê* başqe ye.
Weke bêjî: *Ser sera.*
Weke bêjî *çi nehatî ku* **bi** di pêşiya wan de tê.
Weke *demhawa* navê karekî ku hîn bê kirin.
Weke: *Ser* û *rê*. Tê bêjî: *Serrê,* bêwestîn.

Bêjeya ku pergar di nîvê wan de bî, weke: *Wa welo*, yanî welat. Û *Wa Sînê*, yanî Sînem.

Weke: *şûştin*. Yanî *şû hiştin*. Va ye **hi** ji serê ya pêşî çûye.
Weke *guvaştin*: Guve weş tin. Va ye **e** ji yê pêşî û **we** ji yê paşî çûye. Yanî guve şûtin. Va ye **e** ji yê pêşî û **şû** ji yê paşî çûye.
Yan *go fiştin*: Gok piç kir/ go viçtin. Va ye tişt neçûye.
Weke: *Wê hilênî*. Yanî wê hilanî, ji *hilanîn*ê.
Weke: *Wê bênî,* yanî biênî: Bianî, ji anînê.

**Wendakirin:**

*Windakirin* ew e ku tîpeke nerm di yeke nerme dî de winda bibî, yan dodo dibin yek. Yanî **i** di **ê** de winda dibî. Weke: *Wê bê*, yan *wê biê*, yan *wê bihê*, ji hatinê ye.

Heger **i** berî **h** û **w**-yê bê, **h** û **w** tevî **i**-yê dibin **ê**.

Heger **b** berî **i**-yê bê, ew **b** dibî **p**. Heger piştî **i**-yê **w** bî, weke: *Pê çû*, yanî *bi wî çû/ bi wê çû*.

Heger şûnbêj bî, wilo dibî. Heger piştî **b**-ê **i** û **a**, yan **h** bî, **b** weke xwe dimênî, yanî nabî **p**, lê **i, a** û **h** dibin **ê**. Weke: *Wê bênî*. Yanî wê *biênî-anî* ku ji anînê ye. Weke: *Wê bê*, yanî *wê bihê, biha* ku ji hatinê ye.

Çêdibî ku **i** ji **b**-ê here û **b** weke xwe bimênî û **a**-ya ku di serî de bî, weke xwe bimênî. Weke: *Wê bajiwê*. Yanî wê biajiwê.

Ev tiştên me gotin û her çar pergar (bi, di, ji, li) jî hemî tê de, weke hev in. Lê **ji, li** û **di** ji xwe nabin **p**. Lewra jêderê wan dûrî jêderê **p**-ê ne. Weke:

- **Jê** çû, yanî ji wî/wê çû.
- **Lê** çû, yanî li wî/wê çû.

**Di**, di van hawan de dibî **t**. Ji ber ku jêderê hedukan (**d** û **t**) nêzî hev e. Weke: *Tê çû*, yanî di wê/wî çû.

**Rextkirin:**

*Rextkirin* ew e ku her tiştek di cihê xwe de li gor xwe bi rêz û ayîn bê gotin.

**şûnbêja Berfireh:**

Em karin *nêr* û *mê, kit* û *zo* û *peyzoy*ê ji her varê (cuda) bikin. Yanî her yekê şûnbêja wan nîşaneke varê, bikin dûvik ji wan re.

Vêca hinek ji van hevsanan di kurdiya *sorî, mukrî* û dinê wan de hene, hinek jî nînin. Lê ez ji ber xwe dibêjim ku durist e û heye ku ji bo zûgotinê berê hebû, lê dev ji wan hatiye berdan. Lewra va ye **mê** di *kurmancî* de heye û di *sorî* de nîne.

*Peyzowa şûnbêja pêşdarî tenha*, weke *farisî* di *sorî* de heye, ew jî **tan** e, peyzoya **te** ye û di *kurmancî* de nîne. Heye ku berê hebû, dev jê hatiye berdan.

**şûnbêja Berfireh:**
**Nêr:**
- Ez eza ezan.
**Mê:**
- Ezê ezêya ezêyan.

**Digel axêvê pêdar**
**Nêr:**
- Ti tiya tiyan.
**Digel axêvê pêdar**
**Mê:**
- Tê têya têyan.

**Bertilî**
**Nêr:**
- Ev eva evan.
**Bertilî**
**Mê:**
- Evê evêya evêyan.

**Bertilî winda**
**Nêr:**
- Ewewa ewana.
**Berilî winda**
**Mê:**
- Ewê ewêya ewêyan.
- Em emê.
- Hûn hûnê.

*

- Ez baş im
- Eza baş ma.

- Ezan baş man.
- Ezê baş êm.
- Ezêya baş êma.
- Ezêyan baş êman.

- Ti baş î.
- Tiya baş a.
- Tiyan baş an.
- Tê baş ê.
- Têya baş êya.
- Têyan baş êyan.
- Ev/ ew baş e.
- Eva/ewa baş a.
- Evana/ewana baş an.
- Evê/ewê baş ê.
- Ewêya/ewêya baş êya.
- Evêyan/ewêyan baş êyan.

- Emen baş en.
- Emên baş ên.

- Hûn baş in.
- Hûnê baş inê.

*

- Ha im.
- Hat ma.
- Hat man.
- Hat êm.
- Hat êma.
- Hat êman.

- Ha î.
- Hat a îya.
- Hat an.
- Hat ê.
- Hat êya.
- Hat êyan.

- Ha e.
- Hat a eya.
- Hat an.
- Hat ê.
- Hat êya.
- Hat êyan.

- Hat en.
- Hat ên.

- Hat in.
- Hat inê.

- Min.
- Mina.
- Minan.
- Minê.
- Minêya.
- Minêyan.
- Te.
- Teya.
- Teyan.
- Tê.
- Têya.
- Têyan.

- Vî wî.
- Vîya wîya.
- Vîyan wîyan.
- Vê wê.
- Vêya wêya.
- Vêyan wêyan.

- Me men.
- Mê mên.

- We wen.
- Wê wên.

*

- West im.
- West ma.
- West man.
- West êm.
- West êma.
- West êman.

- West î.
- West îya.
- West an.
- West ê.
- West êya.
- West êyan.

- West e.
- West eya.
- West an.

- West ê.
- West êya.
- West êyan.

- West me men.
- West mê mên.

- West en in.
- West ên inê.

*

**Vîn ev e:**

Berê çar şûnbêjên dûvik hene.

**- im,** ji bo diwa (diduyan) ye.

**- î,** ji bo diwa ye.

**- e,** ji bo diwa ye.

**- in,** ji bo çaran e û bi nêr û mê, ji bo heştan e. Heşt û şeş, dibin çardeh.

Lê di vir de tenê çar hawe têne naskirin:

**- im:** Gelxwepeyvê û tenhatî.

**- î:** Pêşdarê tenha.

**- e:** Bertilîyê tenha.

**- in:** Netenhatî.

**Çi ji her yekê wan kêm e?**

- im mê.
- î mê.
- e mê.
- in mê - zo.

**Her yek dibî çend?**

- im: Dido.

- î: Dido.
- e: Dido.
- in: Heşt.

Em karin nîşana **mê**bûnê bi **im**, **î** û **e**-yê vekin, ev dibin şeş. Em karin nîşana **mê**bûnê bi **in**-ê re bênin, ev dibî çar. Hemî bûn deh. Li wir **zo** dimênî. Heger em nîşana wê bi **in**-ê ve bênin, barê wê giran dibî. Lewra çar in heke em bikin **mê**, dibin heşt. Ku em bikin **zo** jî, dibin diwazdeh. Naxwe em ê **zo**-yê bavêjin ser tenhayan ku **im**, **î** û **e** ye. Vêca em dest nadin şûnbêjê, **ê** beste dimênî.

Xweser heger paşiya wan tîpa ziwa bî weke **ez, em, hûn**, vêca em ê ji bo **mê** jî tîpa **ê** deynin. Weke:

- Ez hat im - nêr.
- Ezê hat im - mê.

- Em hat in - nêr.
- Emê hat in - mê.

- Hûn hat in - nêr.
- Hûnê hat in - mê.

- Ev hat e - nêr.
- Ew hat e - nêr.
- Evê hat e - nêr.
- Ewê hat e - nêr.

Heger paşiya wan tîpa nerm bî û ku berê **mê**-ya wan nebî, emê ji bo **mê** jî, **yê** bênin. Weke: *Ti - te* û *evana - ewana*. Em ê bêjin:

- Ti **yê**.
- Te **yê.**
- Evana **yê.**

- Ewana **yê.**

- We **yê.**
- Me **yê.**

Em werin ser **zo**yê:

Heger tîpa ziwa li paş bî û ku nêr bî, wê **an** bê. Weke:

- Ez**an** hatin.
- Ev**an** hatin.
- Ew**an** hatin.

Heger **mê** bî û tîpa ziwa bî, wê **ên** bê. Weke:

- Ez **ên** hatin.
- Ev **ên** hatin.
- Ew **ên** hatin.

Heger tîpa paşî nerm bî û **mê** bî, **yên** tê. Weke:

- Ti **yên.**
- Te **yên.**

Heger **nêr** bî, wê **yan** bê. Weke:

- Ti **yan.**
- Te **yan.**

**Gotina tevan a berfirehê tîpa ziwa:**

| | | |
|---|---|---|
| - Ez | ezan | em. |
| - Ezê | ezên | emê |
| - Ev | evan / evana | evan. |
| - Ew | ewan /ewana | ewanan. |
| - Evê | evên / evêna. | |
| - Ewê | ewên / ewêna. | |

**Yê paşî ku nerm bî:**

- Ti tiyan hûn.
- Tiyê tiyên hûnê.

Divê ti **peyzo**yê bizanî, weke: *Min, hûn, evana, ewana* ku dibin **mê**, lê nabin **zo** û **peyzo**.

**Gotina tevan a berteng, weke:**

- Min mina me.
- Minê minên meyê.

- Te teyan we.
- Teyê teyên meyê.

- Vî vîyan van.
- Vê vêyan vanê.

- Wî wîyan wan.
- Wîyê wîyên wanê.

Em karin **zo**-ya piştî ziwa bikin **a** û **nêr,** piştî **nerm**ê jî bikin **ya**. Heger piştî **mê** ziwa bî yan *nerm* bî, **ya** tê. Di pişt de ku **ê** bê, weke:

- Ezê.
- Ezêya.
- Evê.
- Evêya.
- Ewê.
- Ewêya.

**Mêbûna Peyzoyê:**

Ku ziwa li paş bî, **ê** tê. Weke:

- Em - nêr.
- Emê - mê.
- Hûn - nêr.

- Hênê - mê.

Ku paşî nerm bî, **yê** tê. Weke:
- We - nêr.
- Weyê - mê.

**Rewadînek:**

- Ez eza em eman man
- Ezê ezêya emê emêyan meyên mên.

- Ti tiya hûn.
- Tiyê têya hûnê.

- Ev eva evan.
- Evê evêya evanê.

- Ewewa ewan.
- Ewê ewêya ewanê nên.

- Min mina man meyan.
- Minê minêya manê meyanê.

- Te teyê tan teyan.
- Teyê têya tên têyan.
- Wî wîya wan wîyan.
- Wiyê wêya wên wêyan.

- Vî vîya van vîyan.
- Vê vêya vên vêyan.

Çaxê di **zo**-yê de paşî tîpa nerm bî, ew tîpa nerm ku ne **ê** bî û ku **mê** bî, dibî **ê** û **ya** di pey de tê. Weke:
- Te/ wî -tenha û nêr.

- Teyê/ wiyê -tenha û mê.
- Teya -zo û nêr.
- Wiya -zo û nêr.
- Têya -zo û mê.
- Wêya -zo û mê.

Çaxê di **peyzo**yê de paşî tîpa nerm bî, ew tîpa nerm ku ne **ê** bî û ku **mê** bî, dîsa dibî **ê** û **yan** di pey de tê. Weke:

- Vîyan/ wîyan -peyzo û nêr.
- Vêyan/ wêyan -peyzo û mê.

Mirov karî tîpa nerm digel **y**-ê di **nêr**an de bênî û dikare wê bikî **a**. Weke:

- Wîyan/ (tu bikî) wan.

Mirov karî di **mê**yan de tîpa nerm û **y**-ê bikî **ê**. Weke:

- Vêyan/ (tu bikî) vên.

Di paşiya **peyzo**yê de ku tîpa nerm bî û **mê** bî, çêdibî ku mirov **yê** bênî, weke: **Me** nêr e û **meyê** jî mê ye.

Çêdibî ku mirov **yên** bênî, weke: **Me** nêr e û **meyên** mê ye.

Çêdibî ku mirov **e** û **y** bavêjî û ku tenê **ê** bimînî. Weke: **Me** nêr e û **mên** mê ye.

Weha reng e çêdibî ku mirov **ê**-ya nêr bi **yan**-ê ve bikî. Weke: **Me/ meyan** herdu nêr in.

Dîsa çêdibî ku mirov **e** û **y** bavêjî û tenê **a**-yê bihêlî. Weke: **Me/ man** herdu nêr in. Weke:

- Ez/ eza/ ezê/ ezêyan baş im.
- Tu/ tuya/ tê/ tiya/ têya baş î.
- Ev/ eva/ evê/ evêya baş e.
- Ew/ ewa/ ewê/ ewêya baş e.

- Em/ eman/ emê/ emêyan baş in.
- Hûn/ hûnê baş in.

- Ê min, ê mina, ê minan.
- Ê minê, ê minêya, ê minêyan.

- Ê te, ê te ya, ê te yan, ê tan.
- Ê te yê, ê tê, ê têya, ê têyan, ê tên.
- Ê vî, ê vîyê, ê vîyan, ê van.
- Ê vê, ê vêya, ê vêyan, ê vên.

- Ê wî, ê wîya, ê wîyan, ê wan.
- Ê wê, ê wêya, ê wêyan, ê wan.

**Dûvikê Berfireh:**
- Im, ima, imê, imêya.
- Î, îya, iya, êya.
- E, eya, eyê, yêya.
- In, ina, inan.
- Inê, inêya, inêyan.
- Îya, a, an.
- Ê, êya, êyan.
- Ya, yan.
- Yê, êya, êyan.
- Î, îya, îyan.
- Ê, êya, êyan.

- Min xwar im.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| - Min | a | xwar | a | ima. |
| - Min | an | xwar | an | ima. |
| - Min | ê | xwar | ê | imê. |
| - Min | êya | xwar | êya | imêya. |
| - Min | êyan | xwar | êyan | imêyan. |

- Te xwar îye e.
- Te ya xwar îya a.
- Te yan xwar îyan an.
- Te yê xwar îye ê.
- Tê ya xwar êya ya.
- Tê yan xwar êyan yan.

- Vî xwar î.
- Vîya xwar iya.
- Vîyan xwar iyan.
- Vê xwar ê.
- Vêya xwar êya.
- Vêyan xwar êyan.

- Iya/a/ in: Nêr.
- Ê/ êya/ êyan: Mê.
- Î / îya/ îyan: Mê.
- Î yê/êya/ êyan: Nêr.

Dûvikê piştî berteng ê ziwa, piştî min-ê û piştî bêjeya paş ziwa. Weke: **Im, ima, iman/ êm, êma, êman**. (Dûvik) piştî tê, weke:

- Vî, wî, me, we/ e, a, an/ ê, êya, êyan.

(Dûvikê) piştî ê nerm tê, weke:

- Ye, ya, yan/ wê, wêya, wêyan.
- Yim, yima, yiman/ yêm, yêma, yêman.

Ku **ê** li paş bî, di pey de **y**-ê tê. Ku **êy** li paş bî, di pey de **w** tê. Em karin piştî **min**-ê jî weke vayên dî çêbikin.

Dûvikê piştî berfireh ku ziwa bin, piştî ez-ê. Weke: Im, ima, iman/ ê, êma, êman.

Piştî **ti**-yê (tu), weke: **Î, îya, îyan/ ê, êya, êyan**.

Piştî **ev** û **ew**-ê, weke: **E, eya, eyan/ ê, êya, êyan**.

Piştî **em** û **hûn**-ê, weke: **In, ina, inan/ ên, êna, ênan**.

Dûvikê berfireh piştî tîpên nerm, piştî **ez**-ê, weke: **Yim, yima, yiman/ yêm, yêma, yêman.**

Piştî **ti**-yê (tu), weke: **Wî, wîya, wîyan/ wê, wêya, wêyan.**

Piştî **ev** û **ew**-ê, weke: **We, weya, weyan/ wê, wêya, wêyan.**

Piştî **em** û **hûn**-ê, weke: **Win, wina, winan/ wên, wêna, wênan.**

Lê **w** piştî **y**-ê tê û **y** piştî **w**-eyê tê.

Di navbera du tîpên nerm de **y** û **w** tên, lê du **w** û du **y** li pey hev nayên. Weke:

- **Im, î, e** û **in** nêr in, piştî tîpa ziwa tên.
- **Yim, yî, ye** û **yin** nêr in, piştî tîpa nerm tên.
- **Êm, îyê, eyê** û **inê** mê ne, piştî tîpa ziwa tên.

Du tîpên nerm nakevin ber hev, ji ber wilo nîşana mê ku **ê** ye, yan **yê** ye, piştî **î** û **e**-yê tên. Weke:

- *Wêm/ yêm, wîyê, weyê, yinê, winê.*

*Mê* piştî tîpa nerm **w** tê. Ji bo ku du **y**-ê di yek bêjeyê de nacivin, yê ku du **y**-ê tê de necivin, **y** û **w** herdu çêdibin.

Ev dûvik piştî berpeyvê berfireh û yê berteng tên. Di yê berfireh de ku bibin berpeyv, mirov karî van dûvikan di wan de neyênî, lê divê ku di berpeyvê de bên. Weke:

- Ez baş im/êm.
- Ti (tu) baş î/yî.
- Ev-ew baş e/ê.
- Em baş in/ên.
- Ez kulî yim/yêm.

Mirov karî di yê berfireh de van dûvikan di şûnbêjê de bênî û di berpeyvê de neyênî. Weke:

- (Mînaka vê di destnivîsê de nebû-nm).

Dûvre heke herdu tenê bêne gotin, yanî ku ne serpeyv bin, divê dûvik bi wan ve bên. Weke:

- (Mînaka vê di destnivîsê de nebû-nm).

**Hindavên Pêjndar**

Hindavên pêjndar ên mirovan, heft in:

- Çav: Ji bo dîtinê ye.
- Poz: Ji bo bêhnkirinê ye.
- Ziman: Ji bo meynasîyê ye.
- Guh: Ji bo bihîztina deng e.
- Laş: Ji bo hingavtinê (pêhisandin) ye.
- Bêawir: Ji bo canxweşiyê ye.
- Mejî: Ji bo zanînê ye.

## 13-HAWEYÊN FÊRPEYVÊ

Yazdeh haweyên fêrpeyvê hene:

**Hawê 1:**
**Mînabûnê rast:**
Ev *mînabûnê rast* çar nifş in:
a) Berpeyvê bihurî, weke: *Ez çûme, min xwariye.*
b) Berpeyvê derkêlî, weke: *Diçû/ diçî, dixwend/ dixwênî.*
- Berpeyvê nehatî, weke: *Wê herî, wê bixwênî.*
- Berpeyvê nedemhawe, weke: *Ez baş im, ew li wir e, ew serdar e.*

**Hawê 2:**
Nûpeyde. Ev hawe, heft in:
**a)** Pirs, weke:
- Ma tê herî?
- Qey tê herî?
- Gelo tê herî?

**b)** Kotekê paşdar, weke:
- Here/ hilêne/ bihêle/ bixwêne.

**c)** Sûnd (sond), weke:
- Bi serê te ez nayêm/ bi Xwedê ez ê bêm.

**d)** Destûr, weke:
- Bere (bila) herî/ bere bixwênî.

**e)** Goman (guman), weke:
- Heye ti (tu) herî/ heye ti bixwênî.

**f)** Xwazmendî, weke:

- Xwezî herî/ xwezî bixwênî.

**g)** Nîvduheval, weke:

- Evê ha, xwedêgiravî baş e.

**Hawê 3:**

Mînabûnê derew.

Ev ew e ku berpeyv û serpeyv hevûdu hilnagirin, lê bi derewan dibin hevalên hev. Weke:

- Ev zilam hewr e* (lê va ye ne hewr e).

Ev, çaxê ti dêhindarî di nav wan de nebî. Lê va ye ti (çu) dêhindarî di nav wan de nîne.

**Hawê 4:**

Mînabûnê qerf:

Ev ew e ku berpeyv nayê hilgirtin, tiştekî kêm e û dêhindarî di nav wan de nîne. Weke:

- Ev zilam çîçik e.

Çaxê ku zilam baş bî, ev gotina *çîçik*ê qerf e.

**Hawê 5:**

Dêhindarî:

Ev ew e ku li ser hev nayêne hilgirtin, lê dêhindarî di nav wan de, çi kêmanî û çi qencî heye. Ev, du nifş in: **Bêpergar** û **Gelpergar**.

* Hewr: Çavên şaş/çavên ttel.

**a)** Bêpergar, weke:

- Ev zilam, şêr e (ev qencî ye).
- Ev zilam rovî ye (ev kêmî ye).

**b)** Gelpergar, weke:

- Ev zilam weke şêr e (ev qencî ye).
- Ev zilam weke rovî ye (ev kêmî ye).

**Hawê 6:**

Pesinguhêz:

Ev ew e ku weke dêhindariyê di pesin de ye, lê *pesinda* û *pesingîr* herdu bi hev re nayêne gotin û tê de pergar jî nayê. Vêca ev jî du nifş in:

a) **Pesinguhêzê Paşkêm**.

b) **Pesinguhêzê Pêşkêm**.

**a)** *Pesinguhêzê Paşkêm*, ew e ku pesinda nayê gotin, pesinva tê gotin û nîşanek ji yê pesinda tê gotin. Weke:

- Neynûkên mirinê tê de çikiyan.

Va ye *mirin* dêhinkirina bi şêr e û mirin *pesinva* ye, şêr jî *pesinda* ye. Lê pesinda ku şêr e nehatiye gotin û pesinva ku mirin e hatiye gotin. Nîşaneke ji yên şêr pesinda hatiye gotin ku neynûk e.

**b)** *Pesinguhêzê Pêşkêm* ew e ku *pesinva* neyê gotin ku yê pêş e û nîşanek ji yê *pesinva* tê gotin. Weke:

- Birûskê bazda.

Yanî zilamê weke birûskê bazda.

Va ye *zilam* pesinva ye û nehatiye gotin, *birûsk* pesinda ye û hatiye gotin, *bazda* ku nîşana pesinvayê ye negotiye ku zilam e. Naxwe pêşî ev bû: *Zilamê weke birûskê bazda*.

**Hawê 7:**

Du nîvgotin:

- Ev, fêrpeyvekî weke rastî ye.
- Dêhindarî tê de nîne.
- Du nîv jê re hene:

a) **Nêzî hiş.**

b) **Dûrî hiş.** Ev jî du nifş in:

**a)** *Pesinvayî*, weke: *Firaxê vê malê sipî ne*. Va sipîbûn pesnê firaxan e. Du vîn jê re hene; ya nêzî hiş ku firaxên malê bi rastî sipî ne.

Vîna dî ew e ku ne bi rastî ye. Yanî (mal) çirûk e, xwarinê çênake ku firaxên wê bilewitin.

Kargiranî, cihê pesin.

Ev cihê pesin dibêjin, weke: *Min tîr li cihê kêfê xist*. Yanî min tîr li **dil** xist. Ev, navnegotî ye û behsa dil nekiriye.

**b)** *Pesingiranî*:

Ev ew e ku xwedî nabêjin, lê hinekî ji xwedî dibêjin, weke: *Çekê vî zilamî paqij in*, yanî ew (zilam) paqij e. Va ye cil gotine, bi vîna wî bi xwe ye. Naxwe ew û cilên wî tev paqij in.

**Hawê 8:**

Hayjîrî: Ev, du nifş in.

**a)** *Zûnebîra rast.*

Ev ew e ku du pesnên dijî hev têne gotin, lê navê wan nayê gotin, vîna wan bi rastî ye, zû nayên bîra mirov, *pesinva* û *pesinda* nayên gotin, tê de dêhindarî nîne û pesnekî wî derew e.

Weke:

- Tiştek heye: *Kevir dixwê natirsî, hevrîşim dighiyê ditirsî.*

Ew tişt **çav** e, yanî **kil** ku ji kevir e dikevî çav, çav lê napirsî û hevrîşim bighiyê (çav) ditirsî û xwe digênî hev.

**b)** *Zûnebîra derew.*

Ev ew e ku dêhindarîke bi derew di nava du tiştan de heye û navê wê nayê gotin.

Weke:

- Tiştek heye: *şîr vedixwê û dev nîne*.

Ev **qelem** e û navê qelemê nayê gotin. *Çivît* weke *şîr* e, şîr bi qelemê tê vexwarin û devê wê weke yê zarokan nîne.

Naxwe *pesinva* û *pesinda* herdu nayêne gotin û pesnek ji yê pesinva yê paşî tê gotin. Yanî dibêjî: *Qelem weke zarokê ye û şîr vedixwî, lê devê wê nîne*.

Divê vîna **lê**-yê, tê de hebî. Divê perçê paşî, ji dêhindariyê derew bî. Lewra vexwarin bê dev çênabî.

**Hawê 9:**

Kinçîrok:

Ev *kinçîrok* heft nifş in

**a)** Paşîçûn.

Hinek tişt bi derew têne zanîn û şaşiyê hiltênî, weke:

- *şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e!*

**b)** Gorçêbûn.

Tiştin hene mirov wilo dîtine, dîsa têne bîra wan, weke:

- *Mala mêr tê de, kaniya zêr tê de.*

**c)** Çiftî.

Weke:

- *Bextê dê û dotê yek e.*
- *Ku siha danê sibehê nedî ser mirov, ya danê êvarê qenc e ku bidî ser mirov.*

**ç)** Biserhatin.

Weke:

- *Ji tirsa şîr, pif dikî dew.*

**d)** şîret.

Weke:

- *Nanê mêvan li mêvan bi deyn e.*

**e)** Hilet.
Weke:
*- Kurê navî gula avî, kurê pêşî zikêşî, kurê paşî tirra dahşî.*
**f)** Pîrozî.
Weke:
*- Jinê werîn ji mala mezin, tê bide sed û hin.*

**Hawê 10:**
Navguhertin:
Ev navguhertin ji bo tirsê yan şermê ye. Tê de dêhin heye û *pesinva* nayê gotin. *Pesinva* û *pesinda* herdu wî karî dikin. Weke:
*- Gulçiv kete palûçik. Ev, şerm e.*
*- Min tembûrekê kirrî/ te tivingekê kirrî. Ev, tirs e.*

**Hawê 11:**
Bo negotî:
Gotinekê dibêjin û hodeya wê nabêjin ku ji bo çi ye. Lê divê nêzîkî hev bin. Weke:
- Çû ser cihê xwe.
Yanî ji bo çûna cem jina xwe, çû ser cihê xwe. Ev *torre* ye.
Di besteka pesnê dêhindar û pesnê guhêz de şerm heye, weke:
*- Gulçiv kete palûçik.*
Yanî bêawirê zilam, kete bêawirê jinê. Ev du *pesinguhêz* in û *pesinva* nehatiye gotin ku herdu bê awir in. Lewra gotina navê wan, şerm e.
Heye ziyanbirr, weke:
*- Gur kete nav kerî.*
Yanî rijîvan hate nav zilaman. Va ye navê *rijîvan* nabêjin, da ew ji wan fêr nebin û rijîya wan negirin.
Naxwe divê di *pesinguhêz*ê de pesnê ku tê gotin ji yekî re ye, ji yê dî re çênabî. Weke:

*- Pencên mirinê.*

Naxwe divê *xwepêgir* navekî xuya bî û *balxwegir* navekî vînî bî. Ev derhiş e:

- Divê yek ji *pesinda* û *pesinva*, bê gotin.
- Divê herdu ji hev re nebin *serpeyv* û *berpeyv*.
- Divê tiştekî *pesinda* bidine *pesinva*.
- Divê ew tişt di *pesinva* de tune bî.
- Divê tiştekî hempar di navbera *pesinda* û *pesinva* de hebî.
- Divê herdu neyêne gotin.
- Divê pergar neyê gotin.

Weke: *Ez bi birûskê re çûm.*

Beriya wê: *Ez bi zilamekî weke birûskê sivik re çûm* bûye.

Binêre:

**Zilam,** *pesinva* ye.

**Birûsk**, *pesinda* ye.

**Sivikî,** tiştê hevpar ê herduyan e.

*Zilam* û *birûsk* nabin hevhilgir.

Sivikiya birûskê, di zilam de nîne.

Sivikiya birûskê, dane zilam.

Birûsk, *pesinda* ye ku hatiye gotin.

Zilam, *pesinva* ye ku nehatiye gotin.

**Varêka Navbera Nifşên Bêjeyan:**

*Varêka navbera nifşê bêjeyan* bi van çêdibî:

- Hatina *şûnbêjê bestî* di paşiya wan de.
- Hatin/ kirin an *bûn*/ di pey wan de.
- Dibin *serpeyv, berpeyv* û *pesin* bê hatina **ê** di paşiya wan de.
- Dibin *serpeyv, berpeyv* û *pesin* bi hatina **ê**-yê.
- Çax tê de tê.
- Çax tê de nîne.

- Tiştek ji van tê de nîne.
- Dibin *serpeyv, berpeyv* û *pesin* bi hatina **ê**, **û** û **ku**yê.
- Dibî *serpeyv, berpeyv* û *pesin* bi vîna *çivaze*yê.

**Pergarên bênavgîr:**

Pergarên bênavgîr duwazdeh (12) in:

**1-** Pergarê bênavgîr:
- Nabî *serpeyv, berpeyv* û *pesin*.
- *şûnbêjên bestî* pê ve nayên.
- *Bûn* û *kirin* di pey de nayên.
- *Çax* tê de nîne.
- Dibî *serpeyv* û *berpeyv* bi *vîna çivaze*. Weke: **Bi, ji, li, di** û **de**-yê.

**2-** Navê bênavgîr:
- Dibî *serpeyv*, û *berpeyv* bi xwe tê digel *nav*, *pesin* û *bêjemak* e.
- Dibî *pesin* digel *nav* û *pesin* ku **ê** berî wê bê.
- Bi tenê nabî *pesin*.
- *Bûn* û *kirin* piştî wan tê.
- *Çax* tê de nîne û *şûnbêjê bestî* di pey de tê. Weke: **Ne** û **çi**-yê.

**3-** Navê bênavgîrê bêpesin:
- *Bûn* û *kirin* di pey wan de tê.
- Dibî *serpeyv* û *berpeyv* bi hatina *nav* û *bêjemak*ê.
- Bi *pesn*an re nayê.
- *şûnbêjê bestî* pê ve nayê.
- Dibî *pesin* bi hatina **ê** berî wan.
- Çax tê de nîne. Weke: **Bo**, **bê** û **ba**-yê.

**4-** Cihê nîşanê bênavgîr:

- *Bûn* û *kirin* di pey wan de nayên.
- Dikevin ser *nav* û *bêjemak*an.
- Nakevin ser *pesin*.
- Dikevin ser *pesin* bi hatina **ê**-yê.
- *şûnbêjên bestî* bi wan ve tên.
- *Çax* di wan de nîne.
- Dibî *serpeyv* û *berpeyv.*
- Nabin *pesin*. Weke: **Va ye, wa ye, va ne û wa ne.**

**5-** Rengpergarê bênavgîrê bivînê:
- *Bûn* û *kirin* di pey de nayên gotin.
- Nabin *pesin*.
- Dibî *serpeyv* û *berpeyv.*
- *Çax* tê de nîne.
- *şûnbêjên bestî* pê ve tên.
- Nabî *karjêder* û *karpêder*, ku ne bi *vîna çivaze* bî, weke: **Kanî**.
- Dikevî ser *nav* û *bêjemak*ê.
- Nakevî ser *pesin* ku ne bi hatina **ê**-yê bî.

**6-** Nîvdemhaweyê bênavgîr:
- *Bûn* û *kirin* di pey de tên.
- Nakevin ser *pesn* û *bêjemak*ê.
- Nabin *serpeyv, berpeyv* û *pesin*.
- Dikevin ser *nav*.
- *Çax* tê de heye.
- *şûnbêjê bestî* pê ve nayên. Yên kesaxêv weke: ***Çû/ çê/ lorî/ ala***...
- Yên jîndaraxêv weke: ***Kişe/ didî/ şoş...***

**7-** Sancûnê (şûnbêj) yekxwedî:
- *Bûn* û *kirin* di pey de nayên.
- *şûnbêjê bestî* piştî wan tên.

- *Çax* tê de nîne.
- Nabî *pesin*.
- Dibin *serpeyv* û *berpeyv.*
- Dikevin ser *nav*, *pesin* û *bêjemak*ê.
- *Bervîn*ê wî nas e.
- *Pesin* jê re tê. Weke: **Ez, tu, ew , em, hûn**.

**8-** Sancûnê duxwedî:
- *Bûn* û *kirin* di pey de nayên.
- *Sancûnê bestî* piştî wan nayên.
- *Çax* tê de nîne.
- Dibî *karjêderê duxwedî*.
- Nabin *serpeyv* û *berpeyv.*
- *Pesin* jê re nayên.
- Nabin *pesin*. Weke: **Min, te, vî, wî, me, we/ vê, wê, van** û **wan.**

**9-** Dezgehê Bêkarê bênavgîr:
Ev xal du nifş in:
a) **Bersivî**.
b) **Gelxwebêjî**.
**a)** *Bersivî,* weke: **Bere** (bila)**, erê, na, a, çi ye, çire, çima, hema, hê, hêhê, belê, loherê**.
**b)** *Gelxwebêj,* weke: **Weh, yaq, haylo, wey, wax**.
- Tu karî nakin.
- Nabin tu tişt.
- Nabin *zo* û *peyzo*.
- *Sancûnê bestî* di pey de nayên.
- Nakevin ser tu tiştî.
- Piştî *berpeyvê* tên.

**10-** Navê binavgîr:
- *Bûn* û *kirin* di pey de nayên.

- *Bûn* û *kirin* berî wî tên.
- Dibî *serpeyv* û *berpeyv.*
- Dibî *karjêderê yek-duxwedî*.
- Nabî *pesin*.
- *Pesin* jê re tê.
- *Çax* tê de nîne.
- Dikevî ser *demhawê*.
- Dikevî ser *pesin*.
- Nakevî ser *nav* û *bêjemak*ê.
- *Sancûnê bestî* piştî warê tê.
- Dibî *serpeyv* û *berpeyv* ji bo *sancûnê xweser ê yekxwedî*.

**11-** Demhaweyê bênavgîr:
- Dibî *serpeyv* bi hatina **ê** û **ku**-yê.
- Dibî *berpeyv* ji bo *nav* û *sancûn*ê.
- *Bûn* û *kirin* di pêşî û paşî de nayên.
- *Çax* tê de heye.
- *Sancûnê bestî* di pey de tê.
- Dibî *pesin* bi hatina **ê** yan **ê-ku**-yê.
- Dibî *berpeyv* ji bo *sancûnê xweser*.
- Piştî *nav, sancûn* û *bêjemak*ê tên.

**12-** Navê pesinê bênavgîr:
- *Bûn* û *kirin* di pey de tên.
- Dibî *serpeyv* bi hatina **ê**.
- Dibî *pesinbêj* bi hatina **ê**.
- Nabî *serpeyv* bê hatina **ê**.
- *Sancûnê bestî* di pey de tê.
- *Çax* tê de nîne.
- Nîşanên *bêjemakê jindemî* tê de tên.
- Dibî *berpeyv*.

*

# 14-NIFŞÊN BÊJEYAN

Nifşên Bêjeyan heştê (80) heb in:

- Bêjemakê ji wan ên *bûn û kirin*ê.
- Bêjemakê ji wan.
- Bêrohnî û pêrohnî.
- Berpeyv û nîşana wê.
- Bestina nav û pesin.
- Biranavê berfireh û xweser.
- Biranavê berteng û xweser.
- Biranavê nîvco yê pirs û bersivên derwar û demwarî.
- Bûn, kirin û pesin.
- Çengelê dezgeh.
- Çengelê nav.
- Demhaweya du-sêxwedî.
- Demhaweya gende ya jîndaraxêv.
- Demhaweya gende ya kesaxêv.
- Demhaweya yekxwedî.
- Derdemî û pesinbêj.
- Derdemiyê bersivê.
- Derdemiyê pirsê.
- Derwar û pesingîr.
- Derwarê bersivî.
- Derwarê derdemî.
- Derwarê pirsê.
- Destikê dezgeh.
- Destikê nav.
- Dunavên bûn û kirinê.
- Dunavên nîşanên bestî.
- Dûvikê bêjemakê nav.
- Dûvikê biçûkî.
- Dûvikê biranavê bestî.

- Dûvikê nêr û mê.
- Dûvikê nîşanê bêjemakê hindemî.
- Dûvikê nîşanên hawegîr.
- Dûvikê nîşanên kit, zo û peyzoyê.
- Fêrpeyvê weke: Ji, bi, li, di, bo, bê, ba.
- Hijmar û çûnxuya.
- Karjêder.
- Karjêder û karpêder.
- Karlêderê dezgehê nav.
- Li paş.
- Nav digel bûn û kirinê.
- Nav û nîşanên makê.
- Navê bêjemakê bênîşan.
- Navê bêjemakê binîşan.
- Navê bêjemakê duker ê bi nîşan.
- Navê bêjemakê duker ê bûn û kirinê.
- Navê bêjemakê hawegîr ê bi nîşan.
- Navê bêjemakê hawegîr ê bûn û kirinê.
- Navê bêjemakê nav ê bûn û kirinê.
- Navê bêjemakê navnîşanhin.
- Navê bêjemakê nîşana herdemî.
- Navê bêjemakê pesnî yê bûn û kirinê.
- Navê bêjemakê pesnî yê nîşanhin.
- Navê biçûk.
- Navê biranavê bestî.
- Navê biranavê fireh.
- Navê cûnbirrê tenha yê zo û peyzo.
- Navê derhiş.
- Navê gende.
- Navê hawedarê binîşan.
- Navê hawedarê bênîşan.
- Navê kesê nas.
- Navê kesê nîvnasê tenha yê zo û peyzo.

- Navê mê.
- Navê nêr.
- Nav û pesin.
- Navê pesin.
- Navê pesnê raser.
- Navê sitewr ê nêr, mê, zo û peyzo.
- Navê winda.
- Navê xuya.
- Navê nenas.
- Navê nîvnas.
- Pêş û paş.
- Pesn û nîşanên makê.
- Pirs û bersiv.
- Sanpeyvê kesaxêvê li pêş û paş.
- Sanpeyvê kesaxêvê li pêşiya dezgeh.
- Sanpeyvê xweaxêvê li pêşiya nav.
- Xwedîbeng û bergxuya.
- Xwepêgir û balxwegir.

**Çi piştî** *bûn* **û** *kirin***ê tên?**

- Bêjemakên nîşanên herdemî.
- Bêjemakên bênîşan.
- Bêjemakên navnîşanên dûvik.
- Bêjemakên navê **dan, da, ra, hil, rû** û **ve**-yê.
- Hawegîrê peymak.
- Bêjemaka **wî** û **ew**, bêjemak û **ew** ne jê, pesin digel **wî**, nav digel **wî**.

**Bêjemak dibin çi?**

**Hawegîrê peymak dibin çi?**

Demhawe:

- Eva bihurî û her şeş nifşên wê.
- Eva derkêlî.
- Eva nehatî.
- Eva kotek a pêşdar.

- Eva kotek a winda.

**Demhawe dibî çi?**

**Çi berî wê û piştî wê tê?**

- Fêrpeyvê demhawa yekxwedî -1.
- Fêrpeyvê demhawa du-sêxwedî -2.
- Demhawa gendeyê kesaxêv li pêş û paş.
- Demhawa gendeyê jîndaraxêv.
- Sanpeyvê piştî fêrpeyvê.

**Çi per piştî fêrpeyvê tên?**

- Fêrpeyvê berê.
- Fêrpeyvê nûpeyda.
- Tiştê nîvduheval.

**Nifşên Fêrpeyvê:**

Du nifşên fêrpeyvê hene:

a) **Xwe**.

b) **hev**.

**a)** *Xwe*, biranavek e ku piştî biranavê berfireh nayê, lewra ew jî ji yê berfireh e û piştî yê berteng tê, lewra ne ji wan e, ji ber ku du biranavên ji yekcûnî (cins) bi hev re nayên. Weke:

- Ez xwe xwarim - çênabî.
- Min xwe xwar - çêdibî.

**b)** *Hev,* weke **xwe** ye, lê ji bo peyzoyê ye. Weke:

- Em hev xwar - çênabî.
- Me hev xwar - çêdibî.

**Nifşên Bêjeyê:**

Nifşên bêjeyê, çar in:

- Nav-demhawe.
- Dezgeh-dezgehê xweser.
- Nav-biranav.
- Bêjemak-hawegîr.

## 15-Pesnê Navê Gende

Pesnê navê gende, bîst in:
- Bêjemak û hawegîrên ne jê.
- Bêjemakê bênîşan.
- Bêjemakê danê.
- Bêjemakê digel hawegîrê hevreng.
- Bêjemakê gendenîşan.
- Bêjemakê nîşana herdemî.
- Biranavê berfireh, pirs û bersin.
- Biranavê berteng, pirs û bersiv.
- Biranavê gende, pirs û bersiv.
- Biranavê piştî ya berfireha bestî.
- Dezgeh, biranav û bêjemak.
- Du nav digel nîşana gende.
- Hawegîrê bi nîşan ê bêmak.
- Hawegîrê peymak ê weke *xwere*.
- Nav digel nîşana gende.
- Nav û hawegîr û gendeyê destfirehî.
- Nav û pesin digel nîşana gende.
- Pesin digel bûn û kirinê. Ev hawe digel dezgeh û biranavan, weke: **Pê sor kirin** û **pê sor bûn.**
- Pesin digel nîşana gende.
- Pesnê her şeş nîşanan.

Nîşana gende tê piştî çiqas nav, pesin û hawegîrê peymak û yê ne peymak û hemî bêjeyên duker. Weke:
- Çi biranav û nav - hevrengî.
- Çi biranav û pesin - hevbaşî.
- Çi du nav - berberî/ serserîtî.
- Çi pesn û nav - geşrûtî.
- Çi nav û derwar - kurmal.

Çaxê du nav bi heve bên û ku paşiya wan ziwa bî, “î“ pê re tê û dibî xwenavdayî. Weke: *Serserî, kerkerî*...

Çaxê ku paşiya navan nerm bî, tiştek nayê. Weke: *şalî-şalî, melû-melû*.

Çaxê yek (nav) tenê bî çi pesin, çi nav û çi biranav bî, dîsa “î“ pê ve tê û dibî xwenavdayî. Weke: *Malî, nêvî, paşî, pêşî, serî, berî*... Weha reng e “în“jî tê, weke: *Rengîn, başîn*...

Çaxê (nav) pêşbestê *bûn* û *kirin*, *pesn* û *dezgeh* û *biranav* bî, weke: *Pê sor bûn, jê sor kirin*, ew (nav) bêjemak e, weke: *Kirin, sorkirin, lê sor kirn, kar kirin, kar pê kirin, dev ji hev kirin, berdan, jê berdan, dev jê berdan, dev ji hev berdan*...

Çaxê pesnek an navek tenê berî *kirin* û *bûn*ê bê, çi bi dezgeh û çi bê dezgeh bêjemak e, weke: *Sorkirin, navkirin* - bêdezgeh. Weke: *Pê sor kirin, kar pê kirin* - bidezgeh.

Çaxê ku pesin û navek an du nav berî wan bên çi bi dezgeh û çi bê dezgeh fêrpeyvê bêjemakê ye, weke: *Gulsorkirin* (gul jê sor kirin) û *serderkirin* (ser pê der kirin) - xwedînegotî.

Nîşanên bêjemaka gende piştî ziwa ev in: **Îtî, înî, anî, atî** û **î**. Weke: Sor**îtî**, sor**înî**, sor**anî**, sor**atî,** sor**î**.

Nîşanên bêjemaka gende piştî nerm, ev in: **Tî, nî, î**. Weke: Ziwa**tî**, ziwa**nî**, ziwa(y)**î.**

Nîşanên gende ku piştî pesin bên, wê dikin bêjemak. Weke: Baş**î**, sor**î**.

Herçî bêjemakên bê nîşan ên weke *zor, êrîş, hêrz* ku nîşan tê de nayên, weke: Zorî, êrîşî, hêrzî çênabin.

Weha reng e bêjemakên bi nîşan weke: *Xwarinî, mirinî, çûnî* çênabin. Çaxê bi hawegîr ve bên, dibine bêjemak, weke: *Serdar, sîwan*. Lê *serdarî, sîwanî* çênabin. Ew digel hawegîrê bêmak jî nayên, weke: *Xwere, bire*. Lê *xwereyî, bireyî* çênabin.

Çaxê bikevî ser nav, ew dibî *bêsûde* û çêdibî, weke: *Nav, gav*. Lê *navî, gavî* çênabin.

Çaxê bikevî ser şeş aliyan dîsa çênabî, weke: *Ber, ser, jor/ berî, serî, jorî.*

Çaxê nav bikevî ser şeş aliyan dîsa çêdibî, weke: *Serjor, berjêr/ serjorî, berjêrî.*

Nav piştî van tê:
- Pesin = başî.
- Hawegîrê bêmak = serdarî.
- Nav digel aliyan = serjorî.

Nav, piştî van nayê:
1- Bêjemakê binîşan.
2- Bêjemakê bênîşan.
3- Hawegîrê peymak.
Weke:
- Bi pîrozî, weke: Bi navê Xudan.
- Bi sûnd, weke: Bi Xwedê min filan tiştî nekiriye.
- Bi hevalî digel "re"yê, weke: Bi wî re hat.
- Bi hevgelî, weke: Nan bi hinguv xwar.
- Bi botî, weke: Bi te hat/ ji bo te hat.
- Bi heyfhilandin, weke: Bi te kir, ziyan li te kir.
- Bi berdestî, weke: Kar li te kir; tu kirî palê xwe.
- Bi hundirî, weke: Bi lezokê hat, di hindirwê wê de.
- Bi destpêk, weke: Min xwe pê kir; dest pê kir.
- Bi zeliqîn, weke: Xine -hine- pê ve ye.
*
- Ji destpêkirin, weke: Ji wir hat.
- Ji destpêk û kutabûnê, weke: Ji vir ta wir.
- Ji kêmkirinê, weke: Jê xwar.
- Ji xurtî, weke: Jê hat (karî bike).
- Ji qutbûnê, weke: jê kir.
- Ji civandinê/ bixwegirtinê, weke: Jê re ket/ bû para wî.
*

- Li derwarî, weke: Li wir e/ di wir de ye.
- Li serwarî, weke: Li ser wir e/ li jor e.
- Li gorhevî, weke: Lê tê/ li gor wî ye.
- Li peydeçûnê, weke: Lê digerrî.
- Li matbûnê, weke: Serî lê gerriya.
- Li hawîrçûnê/ zivirînê, weke: Lê zivirî.
- Li hinguvandinê, weke: Lê ket.
- Li xistina hundirû, weke: Lê (da)ket.
- Li pêvebûnê, weke: Lê xuya kir.
- Li botî, weke: Lewra/ li ew ra.

*

- Di hundirî, weke: Di xanî de.
- Di derbasî, weke: Di wir re çû.
- Di pêxwerîn, weke: Di wî da.
- Di gilih, weke: Tê hilda (gilih lê kir).
- Di şaşbûn, weke: Di wê pekiya.
- Di ezakirin, weke: Di wî bihurî.
- Di qulkirin, weke: Di wê re nerî.

*

## 16-Nûpeyde, Nehatî û Bihurî

Dezgehê hevxwazî yê pirsê, çaxê ku du fêrpeyvên demhawe bên. Weke:

- Kê bê vir, ez ê bêm-bo kes.
- Çi bê vir, ez nahêlim-bo cûn (cins).
- Kîjan bê, ez ê lê xim-bo yek ji civatê.

Daxwazî berê bû, (lê niha) pirsî:

- Kî mêr bî, ew ê bê.
- Çi baş bî, peyde nabî.
- Kîjan qelew bî, serjêke.

Çaxê *nav* û *pesin* berî *bûn* û *kirin*ê bin û ku fêrpeyvek di pey de bê, weke:

- Kî wê bê/ kî baş e, ew dê bê.
- Kî miriye?
- Kîjan dizîne?

Çi çaxê du fêrpeyv di pey de bên, hingî yek ji **kî, çi** û **kîjan** berî wan ku negotî ye heye. Ew çax, dibî daxwazî. Weha reng e derwar û nav jî wisan in. Weke:

- Çaxê tu bê, ez ê bêm.
- Mala tu heriyê, ez naçimê.
- Restem bê, wê Xusro jî bê.

Berêbûna fêrpeyvê rastî, weke: *Restem hate malê*.

Fêrpeyvê nûpeyde, weke: Bixwe, bere bi wî.

Fêrpeyvê bêserî, weke: Va ye hat/ va ye Xusro hat.

Fêrpeyvê bêdem, weke: Xusro baş e.

Fêrpeyvê bêdawî, weke: Xusro ye/ karê Xusro ye.

Fêrpeyvê hevgirtî, hawegîrî, weke: Kiras jê zer biwî/ yê bikêrhatî.

Fêrpeyvê *bûn* û *kirin*ê, weke: Sor bûn, kirin/ kar bûn, kirin.

Fêrpeyvê şûngirê bêjemakê, weke: Tev lî ku dixwî/ tevlî xwarina wî.

Fêrpeyvê berê:

- Fêrpeyvê bêdem, weke: *Xusro baş e*.
- Fêrpeyvê berpeyv, weke: *Restem kurekî baş e*.
- Fêrpeyvê serpeyv nîşangir, weke: *Restem e yê ku dixwênî*.
- Fêrpeyvê pesinbêjî, weke: *Restemê xwende hat*.
- Fêrpeyvê pêrohnî, weke: *Ev kurê min hat*.
- Fêrpeyvê nûvegotî, weke: *Em çûn, me xwar. Vêca êdî nûka em ê li benga xwe binerin*.
- Fêrpeyvê xuyabengî, weke: *Restem hat û dikeniya*.
- Fêrpeyvê dacivîn, weke: *Restem hat û Xusro hat.*
- Fêrpeyvê mînatî, weke: *Restem hat, yanî kurê min hat*.
- Fêrpeyvê gerewî (şertî), weke: *Kengî Restem bê, wê Xusro jî bê*.
- Fêrpeyvê botî, weke: *Restem hatiye da bixwênî*.
- Fêrpeyvê destpêkî, weke: *Ez ê rabim herim limêj bikim û bêm.*
- Fêrpeyvê nîvduheval, weke: *Restem, Xwedê wî bihêlî baş e*.

Fêrpeyvê ku **ê** dikevî serê:

- Ê - pesin.
- Ê - balxwegir.
- Ê - cûnxuya, weke: *Çarên ku mêr bûn, girtin*.
- Ê - karjêder, weke: *Ê ku dixwî, hat.*
- Ê - karpêder.
- Ê - karlêder.
- Ê - piştî dezgeh, weke: *Restemê ji wî ketî, çûye.*

Bêjemakê karlêder ê xwedînegotî, weke:

- ...hatiye girtin/ *hinekan ew girtiye.*
- ...hatiye xwarin/ *hinekan ew xwariye.*

- ...hatiye birrîn/ *hinekan ew birriye.*

Hawegîrê karlêder, weke:
- Restem bûye serdar.
- Restem kirine serdar.
- Restem geriya kuştî.

Werbêja: *Restem geriya kuştî.*

**Restem**, serpeyv e.

**Geriya**, demhawa bihurî ye.

**Kuştî,** karjêder e.

Fêrpeyvê *geriya kuştî* li ser hev, ji bo Restem berpeyv e.

Werbêj: *Restem hatiye girtin.*

**Restem**, serpeyv e.

**Hatiye**, demhawa bihurî ye.

**Girtin,** karlêderê balxwegir e. Balveger hatiye nîvgirêdan.

**şûnbêja çengelê nêr û mê**

Gava pesnek di pey de bê, **ê** dibî serpeyv. Weke:

- **Ê** baş, zû dihê (tê).

**Ê** digel pesin ji bo serpeyvê dibî pesin, weke:

- Kur**ê** baş dixwênî.

Çaxê ku nav di pey **ê** de bê, **ê** dibî serpeyv û nav dibî balxwegir, weke:

- **Ê** min baş e.

Gava serpeyv berî **ê** bê û navek di pey de bê, **ê** digel wî navî dibin balxwegir. Weke:

- Kur**ê** min baş e. (*ê min,* balxwegir e).

**Ê** dikevî ser pesin, weke: *Ê baş.*

**Ê** dikevî ser hawegîrê, weke: *Ê serdar.*

**Ê** dikevî ser demhawê. Lê divê ku “ku“yek di pey de bê, weke: *Ê ku hatiye.*

**Ê** dikevî ser sernav. Lê divê ku dezgehê dêhindariyê di pey de bê, weke: *Kurê min, ê weke şêr.*

**Ê** dikevî ser dezgehê karker û çêdibî ku “ku“ bê û çêdibî ku "ku" neyê, weke: ***Ê** ku ji wir hat*/ **ê** ji wir hat.

Weke:

| | | | |
|---|---|---|---|
| Ez | - | min/ | vir. |
| Em | - | me/ | wir. |
| Ti (tu) | - | te. | |
| Hûn | - | we. | |
| Ev | - | vî. | |
| Evana | - | vê. | |
| Ew | - | wî. | |
| Ewana | - | wê. | |
| Xwe | - | van. | |
| Hev | - | wan. | |

Çaxê du şûnbêj bikevin ber hev, weke:

*Kurê ya te baş e* (yanî, kurê jina te baş e), werbêj weha ye:

**Kur**, serpeyv e.

**Ê**, pesin e.

**Ya**, xwepêgir e.

**Te**, balxwegir e.

**Baş**, berpeyv e.

**E**, nîşana berpeyvê kit e.

Weke: *Kurê te baş e*.

**Kur**, serpeyv e.

**Ê**, pesn e û xwepêgir e.

**Te**, balxwegir e.

**Baş**, berpeyv e.

**E**, nîşana berpeyvê ye.

Naxwe, “**ê**“ timî pesn e.

## 17-Bihuriyê Piştî Berfireh

Bihuriyê piştî berfireh **iye** û **ine** ne. Weke;
- Min/ te/ vî/ wî/ vê/ wê xwar**iye**.
- Me/ we/ van/ wan xwar**ine**.

**Zûdebihurî:**
- Min/ te/ vî/ wî/ vê/ wê xwar.
- Me/ we/ van/ wan xwar**in**.

**Nêzbihurî:**
- Min/ te/ vî/ wî/ vê/ wê xwar**ibû**.
- Me/ we/ van/ wan xwar**ibûn**.

**Zûbihuriyê ducar:**
- Min/ te/ vî/ wî/ vê/ wê ê xwar**ibûna**/ xwar**ibana**.
- Me/ we/ van/ wan yê xwar**ibûna**.

**Bihurî û nehatiyê gerewî:**
(Zûbihuriyê gerewî yê dudemî)
Bêjeyên weke *bere* (bila), *heye, xwezî* dikevin serê û dibî yekfêrpeyv, dibî daxwaz û gomana nebiwî (nebûyî). Weke:
- Min/ te/ vî/ wî/ vê/ wê xwar**ibî**.
- Me/ we/ van/ wan xwar**ibin**.

**Bihuriyê Gumanî:**
Bêjeyên weke *bere* (bila), *heye, xwezî* tên. Weke:
- **Bere** çêbiwiye/ **heye** çêbiwiye/ **xwezî** çêbiwiye.

**Nîşana Nêr û Mê**
Nîşana *nêr* û *mê* ku **î** û **ê** ne, çaxê ku bibin balxwegir bi nav ve tên. Weke:
- Ez çûme nik Restem**î**.
- Ez çûme mala Seyran**ê**.

Nîşana nêr û mê durist e ku li ser demhawa yekxwedî bê û neyê. Weke:

- Restem/ Restemê hat...
- Seyran/ Seyranê hat...

Çaxê (**î** û **ê**) bikevin ser demhawa duxwedî û kes bin, nîşana nêr û mê tê. Weke:

- Restem**î** nan xwar.
- Seyran**ê** nan xwar.

Lê çaxê ku dikevin ser demhawa yekxwedî, yan bikevin ser nav, hingî nîşan tê de nayên. Weke:

- Restem hat/ Restem baş e.
- Seyran hat/ Seyran baş e.

Çaxê ku bibin karpêder jî wilo ye, xasma çaxê ku kes bî. Weke:

- Min li Restem**î** xist.
- Min li Seyran**ê** xist.

Li vir di yên nêr de li şûna “î“yê, çêdibî ku “o“ bê. Weke:

- Restem**o** hat/ Restem**o** baş e.

Çaxê ku nêr û mê navên cûnsa bin, dîsa “î“ û “ê“ tên, lê “o“ nayê. Weke:

- Min li zilam**î** xist.
- Min li jinik**ê** xist.

Lê çênabî ku bêjî: Min li zilamo xist.

Çaxê ku serê navekî tîpa “a“ bî û ku bibî karlêder, hingî “a“ digerî “ê“, weke: Aş xurt e. Lê tu yê bêjî: *Ez çûme êş*.

*

## 18-Cihê Gotekê

Di kurdî de hinek bêje hene ku ji wan re **vînbestî** tê gotin. Yanî vîna wan di wan de xuya nabî. Ji bil wî, çaxê ku bêjemakik pê ve bê, hingî vîna wan xuya dibî. Lê her bêjemakik ji wan, li gorî xwe vîna wê diguherî.

Weke: **Wer.**

Vîn, ji **wer**ê re nîne. Lê ku te got: **Werhatin**, yanî hawîr tiştekî kire xelek, jê re vîn çêdibî.

Weke: **Wer.**

Vîn ji **wer**ê re nîne. Lê ku te got: **Wergirtin**, yanî cil li xwe kirin, jê re vîn çêdibî.

Weke: **Wer.**

Vîn ji **wer**ê re nîne. Lê ku te got: **Werkirin**, yanî ji cihekî bilind bê hevmadî xwe ket, jê re vîn çêdibî.

Weke: **Wer.**

Vîn ji **wer**ê re nîne. Lê ku te got: **Werdan**, yanî tiştekî rohn di hindirwê firaxekê de bi çelqandinê zivirand, jê re vîn çêdibî.

Weke: **Wer.**

Vîn ji **wer**ê re nîne. Lê ku te got: **Werbadan**, yanî bi destên xwe zîvirand û bada, jê re vîn çêdibî.

Weke: **Wer.**

Vîn ji **wer**ê re nîne. Lê ku te got: **Werbêj**, yanî çelqandina tiştekî ziwa û zîzikandina wî di binê firaxekê de, jê re vîn çêdibe.

Weke: **Wer.**

Vîn ji **wer**ê re nîne. Lê ku te got: **Werivtin**, yanî tiştekî rohn ji nav tiştekî nerm ji jor de niqutî/ herikî, jê re vîn çêdibî.

Weke: **Wer.**

Vîn ji **wer**ê re nîne. Lê ku te got: **Weribî**, yanî di rê(ye)ke rast de çû, lê ser û binê rê ne li rasta hev in/ ji anîşkê çû, anîşka ne li dehma wê, weke vêxîzê. Jê re vîn çêdibî.

Weke: **Wer.**

Vîn ji **wer**ê re nîne. Lê ku te got: **Were**, yanî bighe vir, jê re vîn çêdibî.

Weke: **Wer.**

Vîn ji **wer**ê re nîne. Lê ku te got: **Werkand**, yanî li ser hev lê xist, jê re vîn çêdibî.

Weke: **Wer.**

Vîn ji **wer**ê re nîne. Lê ku te got: **Werbûn**, yanî devê xwe ji jor de berda ser avê û vexwar. *Werbû ser avê:* Orbû ser avê. Jê re vîn çêdibî.

Çaxê tu bivê ku navekî sêtîpî bikî demhawe, heger tîpa nêvî ya nerm "**o**" bî, ew "o" dibe "**wî**". Weke: **Qor**. Tu yê bêjî: *Qewirand*. Yanî bi qoran jê kir. Yan: Bi qoran lê kir.

Lê heger ew tîpa nêvî "**ê**" yan "î" bî, hingî herdu dibin "yi". Weke: **Kêr û xîz**. Tu yê bêjî: *Keyirand* (kêr lê xist) */ Xeyizand*.

Lê heger ew tîpa nêvî "**a, e, i, u, û**" bin, tê "k"eyekê bi bêjeyê ve bikî û bikî demhawe. Weke: **Kal, bel, şil, gul, kûr**. Tu yê bêjî: *Kalikand, belikand, şilikand, gulikand, kûrikand*.

Weha reng e ev hawe jî çêdibî: Çaxê ku "**o, ê, î**" jî bên, weke: **Sol, sêl, kîl**. Tu yê bêjî: *Solikand* (bi sol kirin)/ *sêlikand* (bi sêl kirin)/ *kîlikand* (bi kîl kirin).

Heger bêje bêhtirî sê tîpan bî, çi tîpa nerm ku yeke ziwa di pey de hebî, dibî "i". Weke: *Sûlav*. Ji ber ku "a" berê "v" hatiye, tê bêjî: *Sûlivandin*. Yanî sûlav ji wan re çêkirin.

Weke: **Mêzer** û **masûr**. Tê bêjî: *Mêzirandin*/ *masirandin.*

Çaxê ku di paşiya bêjeyê de tîpeke nerm bê, hingî nîşana bêjemakê çênabî, naxwe divê **kirin** û **bûn** pê ve bên. Weke: **Bela**. Tê bêjî: *Belakirin/ belabûn*.

Weha reng e çaxê ku di paşiya bêjeyê de tîpeke nerm bê û ku ne sêtîpî bî, weke: **Qelew/ bedew.** Tê bêjî: *Qelewkirn/ bedewkirin*.

Herçî **goşî** ku derhiş bî, nîşana bêjemakê pê ve tê. Weke: **Bizd** ku **bizdandin** çêdibî.

Çaxê pesin bî yan navê xuya bî, nîşan pê ve nayê. Di pesin de **kirin** û **bûn** tên. Weke: **Sirt** ku *sirtkirin* û **kurt** ku kurtkirin, **xurt** ku *xurtkirin*/ *sirtbûn, xurtbûn kurtbûn* çêdibî.

Navê xuya divê dezgehek ji yê karpêderê berî wî bê û dûv wan re **kirin** û **bûn** bên. Weke: **Goşt**/ bi *goştkirin,* **beşt**/ bi *beştkirin*.

Di cihna de çêdibî ku tu dezgehekî neyênî, weke: **Beşt**/ *beştkirin*/ xanî beşt kirin.

Weha reng e navê xuya çi hawe bî, ew jî weke **goşîne** weke **dar**/ *darandin*, çênabî. Lê *darkirin, bi darkirin* çêdibî.

Çi bêjeya ku du nav, an nav û dezgeh bî, çênabî ku bibî bêjemakê bi nîşan. Weke: **Bêkêr**/ *bêkêrandin* çênabî. Lê gava di pey de **kirin** an **bûn** werin, weke: *Bêkêrkirin, bêkêrbûn, serkurrkirin, serkurrbûn* çêdibî.

Pelixî= Pel û laxî: Pehn, nerm û laq.

Pelişî= Bela û weşî.

Pelandin= Hinguvtin.

Pelkirin= Qutkirina serî.

Pelûl= Pelhîl/ pelhilû.

Per ê çûk= Tenik.

Per çiqî= Pehn.

Per ikî= Firiya.

Per ixî= Nerm.

Per nisî= Nizim.

Pirnîk: Pirnî: Hûrik û sêfîl.

Virnîk:Virnî: Hûrik û sêfîl.

Pirnisî: Perin êsî/ perin, sîx.

## 19-WECHÛR

**Wechûrê bestî:**

Wechûrê bestp ew e ku çaxê bi tenê bî vîna wê nayê zanîn, hingî tê zanîn ku di navbera du navan de tê û çengela **ê** di pey de nayê. Weke: Ev **bo** te ye.

Va ye **bo** di nêv du navan de ye. Çênabî ku tu **ê** di pey de bênî ku ne balvegir bî weke tu bêjî: Ev **bo ê** te ye.

Meger ku **ê** balvegir bî, çêdibî weke: *Ev bo ê te ye*, yanî ev bo kurê te ye.

**Wechûrê nifşî yê giştî:**

- ê, a, yê, ya, ên, yên, pesnî.
- ê, a, yê, ya, ên, yên.

Çi *wecnav* li pêş bî, çi wecnav li paş bî, dibî berpeyv. Weke:

- Çi ye ev? Ev çi ye?
- Kî ye ev? Ev kî ye?.

**Çik,** wecnav e û dibî serpeyv, berpeyv, balxwegir û balveda. Weke:

- **Çik**ê me ye/ ev **çik**ê me ye.
- **Çik**ê me hat/ **çik**ê me baş e.

**Destik û çengel û dûvik:**

Destikê bestî **wê, bi** dibin hûrik.

Destikê nîvxweser/nîvnav **heger** dibî balxwegir, nabî serpeyv û karjêder.

Destikê xweser **kî, çi** dibin serpeyv û karjêder, nabin balxwegir.

## 20-NAVÊ DESTIK

Heçî tiştê ku **çax** bî û tiştên ku *çax* tê de hebî, dibin navên destik.

**Çengelê nîvxweser:**

Ev çengel dibî serpeyv û berpeyv, dibî balxwegîr û balveda. Lê bi tenê nayê gotin. Weke: **Ê**...

**Navê çengelê xwenavî:**

Dibî serber û balxwe û balve, tenê jî tê gotin. Weke: *Çi, ev çi baş e, ev çi yê me ye/ ev çikê me ye?*

**Dûvikê bestî:**

Dûvikê bestî **im** û **iye** ne. Ev nabin tiştek û tenê nayêne gotin, lê çaxê bi paş bêjeyê ve bên vînekê didî. Weke: Ez baş **im**, ev hat**iye**.

**Dûvikê nîvxweser:**

Dûvikê nîvxweser **dar, van** û **wan** in. Ev ew in ku ser û ber balve, balxwe û bi tiştekî ve vîna wan heye û yekvîn in. Çaxê ku bên, dibî du vîn. Weke: dikan**dar,** pez**van**, sî**wan**.

*

## 21-Rengbêjê Nûpeyde

### Rengbêjê Kesaxêv

### Rengbêjê Jîndaraxêv

Çaxê rengbêja **kengî** bikeve ser paleka derkêlî, ew palek dibî *nehatî*. Weke tu bêjî: *Kengî dixwî?* Yanî wê kengî bixwî.

Ev dibî bi vîna nebuwî (nebûyî), yanî tu carê naxwî.

**Awirek:**

Carna heye ku karlêderê pergarî neyê gotin, lê pergar û şûnbêja pirvîn ji bo sivikiyê yan ji bo veşartinê bêne gotin. Ev hawe piştî **bi, di, li** û **ji** çêdibî.

Weke: Ez ê ji te re patekê **lê** xim.

Va ye di *lê xim* de, **li** pergar e, **ê** şûnbêja pirvîn e.

Di pêşî de ev bû: *Ez ê ji te re patekê li qadê xim.*

Va ye **qad** karlêder e û nehatiye gotin, **ê** ku çengelê pirvîn e - nêr e, mê ye- navê kes e, (nav)ê nifş e, (nav)ê tişt e û hemî tê de çêdibin.

Weha reng e weke: Ez ê ji te re agir **pê** xim: Agir bi daran xim, bi ardû xim.

Weke: Ez ê destê te **jê** kim: Destê te ji laş kim.

**Awirek:**

Çaxê pergarên **bi, di, li, ji** di serê civînbêjê de bên û di pey de demgîra nehatî ji bêjemakê **hatin** bê, çi heyîndar û çi neyîndar bî, dûv re bêjemakik tê gotin. Weke:

- Pê re nayê qurpandin- ev *neyîndar* e.
- Pê re tê xwarin- ev *heyîndar* e.

Hingî karpêder avêtiye. Di pêşî de ev bû:

- Pê re **sitem** nayê qurpandin.
- Pê re **nan** tê xwarin.

Va ye *sitem* û *nan* **karpêder** in û hatine avêtin.

## 22-Werbêj:

**Pê**, pergara **bi** ye û şûnbêja pirvîn e.

**Re**, dûvikê pergarî ye li pêş demgîrê.

**Sitem**, karpêderê li pêş demgîrê ye.

**Na**, destikê pergarî ye ji bo nebûnê.

**Yê**, **hê/ye**, demgîra nehatî ye.

**Qurpandin**, berpeyvê gerînî ye ji bo **hê**yê.

Pergar û peyrewê xwe têne girêdan bi **qurpandin**ê ve, **hê** dibî bi vîna **geriya**. Yanî *sitem pê re nagerî qurpandin*. Qurpandin bi vîna *qurpandî* ye û hawegîrê peymak e.

**Awirek:**

Çi bêjeya ku tîpa **ek** di paşiya wê de bê, ew **ek** ne jê ye, lê ji bo yekîtiyê ye. Weke:

- Welat**ek**. Yanî yek welat- ev nav e.
- Avêtin**ek**. Yanî carek avêtin- ev bêjemak e.

Çi bêjeya ku tîpa **ik**ê di paşiya wê de bê û ku bêje pesin bî, ew ji bo biçûkbûnê ye. Weke:

- Kurt**ik**. Yanî kurt û biçûk e.
- Sor**ik**. Yanî sor e û biçûk e.

Weha reng e ku nav bî jî. Weke:

- Keç**ik**- Yanî keça biçûk.
- Kur**ik**. Yanî kurê biçûk.

Çi bêjeya ku *goşî* bî û **k** tenê di paşiya wê de bê, çi pesin û çi nav bî, ew ne ji bo yekbûn û biçûkbûnê ye. Lê heye *lê weste* û ne ji binyata bêjeyê bî û heye ji binyata wê bî. Weke:

- Mîş**k**, riş**k**, piş**k**, hiş**k**, bis**k**, ter**k**, meş**k**.

*    *    *

(Di 1995 09 17, saet 21.00 de kutabû.)

(Kontrola wê, di 1996 03 20 de kutabû)

(Kontrola herî dawîn, di 1996. 06. 22, saet: 20.30 de kuta bû)

# Kurtejiyana Mele Nûriyê Hesarî (1934 - 2011)

**Dilawerê Zengî**

Di sala 1934an de, li Hesar a gundê Kercewsê, jidayik bûye. Di nava Kurdan de, bi nasnavê Seydayê Pirêşan tê naskirin. Navê diya wî Xanim e, navê bavê wî Mele Yûsifê kurê Emer e. Emer ji gundê Hêştirekê, ji malbata Etmanka, ji şaxê Elikan, ji rema (eşîr) Hevêrkan bûye.

Mele Nûrî ji malbateke xwenda, zana û bîrewer hatiye. Bavê wî mele bûye, diya wî jî keça melan û jineke xwenda bûye.

Di sala 1939an de, pêşî li cem diya xwe dest bi xwendina Qur'anê kiriye, û li cem wê Mewlûd, Nehculenam, Nûbihar û Rewdne'îm xwendine.

Di sala 1940î de, çaxê ku diya wî li Hesarê giyanê xwe spartiye Xwedê, îcar wî li ba kekê xwe Mele Hisên xwendiye. Lê çaxê ku kekê wî çûye leşkeriyê, îcar bavê wî ew xistiye dibistana bi zimanê Tirkî de, ya ku li Hesarê bûye.

Di 1945an de, çaxê di nofa (sinif) çaran de, dibistana Tirkî dixwend, bavê wî jiyana xwe spartiye Xwedê. Îcar kekê wî Mele Hemîd ew ji dibistanê derxistiye û daniye ber xwendina medresê. Piştî demekê ew û kekê xwe Mele Nezîr çûne gundê Bilêderê, û li cem birayê xwe yê ji dê mane. Pişt re çûye mala xalê xwe Mele Mihemed, li gundê Êlihê (Niha bûye wîlayet û jê

re Batman dibêjin), maye. Ji wir jî çûye gundê Kurrika li Bişêriyê, li medreseya Mele Hesenê Tilmizî xwendiye û ders ji Mele Faîqê kurê Mele Hesen girtiye. Piştî demekê ji wir şûnde vegeriyaye û çûye Hesarê. Ew û kekê xwe Mele Hemîd, ji bo xwendinê daketin Binxetê û çûne cem mala Şêx Ehmedê Xiznayê. Li wirê dîsa li cem kekê xwe Mele Hemîd xwendiye heta ku “Sadulaha Gewra“ xilas kiriye.

Di sala 1949an de, birayê wî Mele Hemîd, çaxê xwendina xwe ya medresê kuta kiriye, di Kanûna Paşî de vegeriyaye Hesarê, lê Mele Nûrî li Xiznayê maye, û îcar li cem Mele Beşîrê Batêrgizî xwendiye. Lê di dehê meha Heyvdarê 1950î de, Şêx Ehmed çaxê giyanê xwe spartiye Xwedê, ji wir çûye Tilmarûfê û li ba şêx 'Eladînê kurê Şêx Ehmed xwendiye. Mele Nûrî li wirê bûye pêbawerê Şêx Masûmê kurê Şêx Ehmedê Xiznayî.

Mele Nûrî di 20-saliya xwe de (1954), dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kiriye, û berhemên xwe hemû bi alfabeya latînî nivîsandine. Camêr digel wê perîşanî, dilêşanî û xizantiya xwe, deh pirtûk kirine malê Pirtûkxaneya Kurdistanê.

Di roja 25. 01. 2011an de, Mele Nûriyê Hesarî (Pirêşan), ji nav me barkir. Xwedê wî bi dilovaniya xwe şad bike û cihê wî Buhişta rengîn be.

**Ji berhemên wî:**

- Şoreşa Barzanî: Helbest, 1995

-Hostanibêja Zarhaweyên Kurdî, Stockholm 1996

- Axlîma: Pêlên Helbesta Kurdî, 1996

- Rêziman: Destnivîs

- Ferhenga Kurdî – Kurdî, Destnivîs

- Ferhenga Kurdî – Tirkî, Destnivîs

- Ferhenga Kurmancî- Zazî, Destnivîs

- Mewlida Pêxember, Destnivîs

- Vegerandina Zimanê Erebî Şarvîn, Destnivîs

- Koledar: Çîrokek Helbestî ye, Destnivîs

- Dû Mar: Çîrokek Helbestî ye, Destnivîs, Bi zimanê Erebî ye.

- 11 Dîwanên Helbestan, Destnivîs

- Bîranîn, ji jiyana wî, Destnivîs.

-Du dîwanên mele Nûriyê Hesarî (Şoreşa Barzanî û Dîwana Helbestan), ji aliyê Tora Medyayî ya Rûdawê ve hatiye çapkirin. Sal: 2023, Hewlêr-Başûrê Kurdistanê.

**&&&**

## NAVEROK

01- Pêşgotin ..........................................................................5
02- SERNIVÎS ........................................................................11

03- **HOXAYEKÊ**
**Çend Lateke**...........................................................13
- Lata Yekê, DENG
- Lata Diduwan, KITWAZ
- Lata Sisiyan, ÇIVAZÊNVÎNDAR

04- **HOXADIDUWAN**.........................................................20
- BÊJE
- Navê Nifş
- şeş Pesin
- Navên Vînxweserên Bêjemak
- Nîşanên Bêjemakan

05- **PEYMAK**
**PEYMAKÊYEKÊ**.........................................................33
- Kardarên Bêdem
**PEYMAKÊDIDUYAN**
- Berekar
**PEYMAKÊSISYAN**
- Demgîrê Bihurtî
**PEYMAKÊÇARAN**
- Bihuriya Derkêlî
- şûnbêjên Dûvik
**PEMAKÊPÊNCAN**
- Derkêlî
**PEYMAKÊŞEŞAN**
- Peymakê Nehatî
**PEYMAKÊHEFTAN**

- Berexwazî
- şûnbêje
- Pêgirtek
- şûnbêjên Berteng ên Paşbestî
- Rengbêjên Xweaxêv
- Çengelê Pergarê Nîvbeste
- Dûvik

06- **PERGAR** ..........................................................................71
a) Serkombêj
b) Serdemgîr
c) Sernav
d) Dûvik
- KARÊPERGARAN
- Navwarê Nav
- Pêgirtek

07- **DÊS** ..........................................................................105
**DÊS 1**
1) Balxwegir û Xwepêgir
2) Pesingîr û Pesinbêj
**DÊS 2**
- Pêrohnî
**DÊS 3**
- Xuyabeng
**DÊS 4**
- Xuyanifşê Peyhijmar
**DÊS 5**
- Karpêder
**DÊS 6**
a) Derdemî
08- **PER** ..........................................................................117
**PER 1**

- Karlêder
**PER 2**
- Derwar
**PER 3**
- Karlêderê Hevrengî
**PER 4**
- Xuyabengê Fêrpeyv
**PER 5**
- Karpêderê Duker
**PER 6**
- Fêrpeyvê Berpeyv
**PER 7**
- Berpeyvê Nav
**PER 8**
- Xuyabengê Valatî

09- **FÊRPEYVÊNPEYREW**.....................................................124
- Fêrpeyv 1
- Fêrpeyv 10

10- **FÊRPEYVÊN NÎVDUHEVAL**...........................................130
- Parpênas
a) Hijmarî
b) Nehijmarî
- Bûn û Kirin
- Balxwegira Paşketî
- Kerhingavtî
- Kerguvaş
11- **ŞÛNBÊJA *HEV* A HERALÎ** .............................................150
12- **PERGARÊJÊREVANÎ** ......................................................152
- Hinek Hevbabet û Hevsan
- Rewadînek
- Dûvika Berfireh

13- **HAWEYÊN FÊRPEYVÊ** ..................................................170
- Hawê 1
- Hawê 10
- Varêka Navbera Nifşê Bêjeyan
- Pergarê Bênavgîr 1
- Pergarê Bênavgîr 12

14- **NIFŞÊNBÊJEYAN** ........................................................181
- Nifşên Bêjeyan 80 heb in

15- **Pesnê Navê Gende** ....................................................185
16- **Nûpeyde, Nehatî û Bihurî** .......................................188
- şûnbêja Çengelê Nêr û Mê

17- **Bihuriyê Piştî Berfireh** ................................................193
- Nîşana Nêr û Mê

18- **Cihê Gotekê** ..............................................................195
19- **Wechûr** .....................................................................198
20**- Navê Destik** ..............................................................199
21- **Rengbêjê Nûpeyda** ..................................................199
22- **Werbêj** ......................................................................200
-**Kurtejiyana Mele Nûriyê Hesarî** (1934 - 2011)................203

--------------

(Di 1995 09 17, saet 21.00 de kutabû.)
(Kontrola wê, di 1996 03 20 de kutabû)
(Kontrola herî dawîn, di 1996. 06. 22, saet: 20.30 de kuta bû)